



KT

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

SÎMBOLÎZMA RENGAN DI HELBESTÊN EMÎN BOTANÎ DA

BIRYAR KAMAL OMAR

16711036

Şêwirmend

Prof. Dr. ABDURRAHMAN ADAK

Mêrdîn 2020

KT

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

SÎMBOLÎZMA RENGAN DI HELBESTÊN EMÎN BOTANÎ DA

BIRYAR KAMAL OMAR

16711036

Şêwirmend

Prof. Dr. ABDURRAHMAN ADAK

Mêrdîn 2020

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Sîmbolîzma Rengan di Helbestên Emîn Botanî da**” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

....../...../.....

Biryar Kamal Omar

KABUL VE ONAY

Biryar Kamal Omar tarafından hazırlanan **Sîmbolîzma Rengan di Helbestên Emîn Botanî da** adındaki çalışma, ... tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

KURTEPEYV

amd. : Amadekar
bnr. : binêre
hb. : heman berhem
hjm. : hejmar
r. : rûpel
wer. : werger
vghz. : veguhêzer
hwd. : her wekî dî

PÊŞGOTIN

Reng ne bi tenê hindek pêl û lerezînên ronahiyê ne. Belkî ji ciwantirîn û balkêştirîn diyardeyên xwezayê ne. Nihêniyek e ji nihêniyên ciwaniya gerdûnî. Reng weku muzîkeka aram dibin egerê arambûna hestên dîtînê û arambûna derûnê mirovî. Reng tev li her tiştê dewrûber û jiyana me bûne. Ji demên berê da ta nûke reng xwedan giringiyeka mezin bûne. Bi dirêjahiya mêjûyê da mirovan giringî pê daye. Ji ber hindê jî raman û sîmbol ji layê kes, bawerî, ayîn û çandên gelan ve ji bo her renekî destnîşankirî ne; weku sîmbolên ji bo xweşî û nexweşiyên, jiyana û mirinê û gelek tiştên dî. Di serdemên nû û hevçerx da jî diyarkirî ye ku rengî bandoreka mezin heye li ser şaneyên hestiyariyên mirovan, ji ber ku her renek xwedan pêleka ronahiyê ya taybet e ji layê dirêjî û kurtiya pêlan ve. Lewra her pêlekê bandoreka cuda ji pêleka dî ya ronahiyê heye li ser amîrê hestiyar û barê derûnî ve. Ji ber hindê jî ev bandorên erênî û nerênî digehine kûrtirîn xalên derûnê mirovan.

Peywendiyeka bihêz di navbera rengî û helbestê da heye. Rengî bi şeweyekî diyar û aşkera di nava helbestên gelek helbestvanan da reng vedaye. Helbestvan ji bo afirandina wêneyekî edebî yê ciwan û bilind penayê dibin ber rengan û li dûv şewazê xwe serederiyê digel rengan dikin; wan di karên xwe yên edebî da bi kar tînin çî bi şeweyekî rasterast yan nerasterast. Herwesa reng zor têkelî cîhana wan ya taybet a xeyal û fantaziyan bûne. Ji ber hindê jî wan reng ji bo afirandina wêneyekî helbestê yê ciwan, ji bo derbirînên xwe bi kar înan. Dîsan wekî sîmbol bi kar înan ji bo gelek mijarên felsefî, ramyarî, rewşenbîrî, civakî, derûnî, evînî. Herwesa jîngeha helbestvan tê da dijîtin bandoreka bihêz lê diket berev cîhana rengan biçît. Çünke jiyana û jîngehên wan bi şeweyekî rasterast û nerasterast bandorê dikete li ser rêje û çawaniya bikarînan rengan di helbestên wan da. Bi taybetî helbestvanên kurd gelek caran pena birine ber keresteyên xwezayî. Çünke xwezaya Kurdistanê bi rengan tije ye.

Helbestvan Emîn Botanî yek ji wan helbestvanên kurd e ku di vehandina helbestê da hêza xwe ya erênî ji rengan wergirtiye. Botanî yek ji helbestvanên bi nav û deng ên

kurd e. Vê dawiyê dîwanek li jêr navê Emîn Botanî çap û belav kiriye. Naveroka evê dîwanê gelek babetên cur bi cur bi xwe ve digirîtin. Bi evî rengî Botanî şiyaye destê xwe danîte ser birînên milletê kurd û bi rêya helbestên xwe derbirîne ji êş, jan û azarên milletê xwe diketin.

Botanî di piraniya helbestên xwe da bas li rengan kiriye. Em dişêyin bibêjîn helbestên Botanî bi rengan hatîne tamdan. Wî reng kirîne havênê berhemînana wênên hemecur. Lewra jî li dema xwandina helbestên Botanî hest pê dikin ku em aşnayî nîgarkêşekî bilîmet dibîn.

Qebarê dîwana Botanî ji 515 rûpelan pêk dihîtin ku di piraniya wan helbestan da reng berceste bûne. Lewra jî me bi tenê hindek helbestên wî hîlbijartine ewên gelek kod û sîmbolên rengan di nava wan da hatîne bikarînan. Dîsan jî yek ji taybetmendiyên şewazê vehandina Botanî helbestên xwe bi zaravê soranî, badînî, hekarî vehandîne.

Ev çende jî bûye eger ku me xwastiye xebata xwe li ser evî helbestvanî binivîsîn. Dişêyin bibêjîn ku li gor pêzanînên me gelek bi kêmî xebat û vekolînên zanistî û ekadîmî li ser helbestên Botanî hatîne kirin. Lewra jî ev vekolîna me reng e bibîte dergehek ku ewan qolaçkên tarî yên di nava cîhana wî ya fantezî û xeyalî bo xwendevanan bideyine diyarkirin. Eve ji layekî ve, ji layekî dîtir ve ev xebate bibîte binwase ji bo encamdana gelek vekolîn û xebatên dîtir yên zanistî û ekadîmî li ser helbestên Botanî di paşerojê da.

Pêdivî ye ewê çendê ji bîr nekim û spasiya evan kesên navên wan li jêr bikim. Spasiyeke bêsînor ji bo mamosteyê min ê hêja Prof. Dr. Abdurrahman ADAK ku şewirmendiya evê vekolînê bi situyê xwe ve girtî. Spasiyeke bêsînor ji bo mamosteyê min ê hêja Doç. Dr. Rafik Sulaiman. Spasiyeke bêsînor ji bo endamên juriya parastina tezê Doç. Dr. Hayrullah Acar û Doç. Dr. Abdurrahîm Alkış. Spasiyeke bêsînor ji bo mamoste û helbestvan Emîn Botanî. Spasiyeke bêsînor ji bo mamoste û hevalê min ê hêja Umran Aran. Spasiyeke bêsînor ji bo mamoste Fehmî Balayî. Spasiyeke bêsînor ji hevalên min ên hêja Baravan Waheed, Harîwan Mohemmed, Dilêr Kamal, Neda Salih, ku her dem û bi hemî rengan û bê mandîbûn li gel min alîkar bûne. Spasiyeke bêsînor ji bo her

mamostayê ku ez bi peyvekê fêr kirîm. Spasiyeke bêsînor ji bo malbata min ku her dem
piştevanên min bûne.

Biryar Kamal Omar

Mêrdîn 2020



KURTE

Di vê vekolînê da me bas li diyardeyeka gerdûnê ya balkêş kiriye ku ji layê zana, edîb, feylesof û bîrmendan ve giringî pê hatiye dan ku ew jî reng e. Dema em peyva reng dibîhîzîn yekser di mejiyê me da peyva jiyan dirust dibîtin. Çünke reng tam û ruheka zêde didete jiyanê. Em naşên hizir di cîhaneka bêreng da biken. Çünke cîhana bêreng dê cîhaneka xav û bêtam bîtin. Sereray ku reng di her tiştekî derdora me da hebûna xwe heye, belê mirovan biha û ciwaniyeka zêdetir daye rengan bi rêya afirandin û dahênanên cuda.

Reng alavekî giring e di pêkhatina têkstên edebî de ku ev çende bihayekê êstetîkî û hunereke bilind didete têkstî. Ji ber vê yekê jî helbestvanan giringî bi vê diyardeyê daye. Çünke reng baştirîn alav e ku helbestvan bişêtin bi rêya wî derbirînê ji hestên xwe yên edebî biketin. Dîsan reng wêneyê edebî pêk dihînit, raman û sîmbolên wek derûnî, ramiyî, civakî, ayînî, xewn û xeyal û hunerî jê dirûst dibin.

Helbestvan Emîn Botanî mîna her helbestvanekî dî hêza rengî bi kar îname û reng kiriye alavek yan sîmbolek ji bo derbirînê ji hizir û bîrên xwe yên civakî, neteweyî, ayînî, derûnî, felsefî û hestên xwe yên takekesî biketin. Dîsan da bişêtin wêneyekî helbestê yê ciwan û bilind ji rengan dirust biketin û bi rêka vê diyardeyê nameya xwe ya felsefî û ruhî bigehînit.

Babetê rengan giringiya xwe heye, çünke rengan di hemî biwarên jiyanê da cihê xwe girtiye. Lewra me bi giringî zanî vê vekolînê encam bideyin. Ev vekolîna bi navê “Sîmbolîzma Rengan di Helbestên Emîn Botanî da” ji bilî destpêk û encamê, ji du pişkan pêk dihêt. Pişka yekê hatîye dabeşkirin li ser tewer, têgeh û pênaseya rengan; têgehê sîmbolîzmê, sîmbolîzm û wateya navên rengan, sîmbolîzma rengan di baweriya ayînan, di çanda gelan û di saykolojiya kesan da, reng û edeb (helbest), taybetmendiya rengan û pişkên rengan. Di pişka duyem da sîmbol di helbestên Emîn Botanî de li gor riwangeyên helbestan û mijaran hatîne şirove û praktîzekirin.

Peyvên Sereke: Reng, Sîmbol, Helbest, Helbestvan, Emîn Botanî, Civak, Ayin, Çand, Saykolojî.



ÖZET

Emîn Botanî'nin Şiirlerinde Renklerin Sembolizmi

Bu çalışma bilge, edip, filozof ve düşünürlerce önemsenen evrensel renk görüngüsünü konu edinmektedir. Renkler hayata bir tat ve ruh kattıklarından dolayı, renk sözcüğü doğrudan hayat sözcüğünü çağrıştırmaktadır. Renksiz bir hayat yavan ve sıkıcı olacağı için öyle bir hayat tahayyül edilememektedir. Renkler doğal olarak insanın çevresindeki her şeyde görülebilmelerinin yanısıra insanların yaratı ve eserlerinde onları işlemesiyle daha bir değer ve güzellik edinirler.

Özellikle şairler için vazgeçilmez unsurlardan olan renkler, edebi eserlere estetik değerler katmaktadırlar. Renkler şairlerin edebi duygularını ifade etmek için en çok başvurdukları unsurlardandır. Renkler, düşünsel, toplumsal, psikolojik, dinsel ve imgesel sembolleştirmeleriyle edebi esere anlam kazandırmaktadırlar.

Tüm diğer şairler gibi, şair Emîn Botanî de toplumsal, bireysel, ulusal, dinsel, psikolojik ve felsefi duygu ve tutumlarını ifade etmek, onları iletmek için şiirlerinde renklerin gücünden faydalanmıştır.

Hayatın her alanında bir önem ve anlam arz eden renkler, Emîn Botanî'nin şiirlerindeki yoğun kullanımlarıyla özel bir önem ve anlam kazanmaktadırlar. Bundan dolayı onun şiirlerindeki renklerin sembolizmini “Emîn Botanî'nin Şiirlerinde Renklerin Sembolizmi” başlıklı bu yüksek lisans tezi çalışmamızda incelemeyi önemli bulduk. Bu çalışma girin, sonuç ve iki ana bölümden oluşmaktadır. Teorik olan birinci bölümde renk kavram ve tanımını, renklerin bölümlerini ve özelliklerini, sembolizm kavramını, renklerin farklı dinlerde ve kültürlerdeki anlamlarını ve insan psikolojisine etkilerini ele aldık. İkinci bölümdeyse birinci bölümde çizdiğimiz teorik çerçevede Emîn Botanî'nin şiirlerindeki renkleri inceleyip anlamlarını analiz ettik.

Anahtar Kelimeler: Renk, Sembol, Şiir, Şair, Emîn Botanî, Toplum, Din, Kùltür, Psikoloji.



ABSTRACT

Symbolism of Colors in Emîn Botani's Poems

In this research we discussed about one of the natural attractive phenomena which has its own role by many scientists, writers, philosophers, and psychologists. Once the word "color" is mentioned directly we think about life, because it provide a sense of spirituality and certain taste to our life which we can not even think about our world with out colors. In terms of creativity we as a human being give a special value and beauty to color, despite its own effectiveness in this universe.

Due to the fact that it supply an authentic sense to literary content, it has been used frequently by many poets as a means by which they can express their own feelings, create literary images, and also by using color they can create some symbolic meaning in terms of psychology, sociology, religion, dreams, and fantasy.

Emîn Botani's poems rely heavily on using colors. He uses the theory of colors to symbolize his social, religious, philosophical, psychological sense towards life, in addition to convey his philosophical and spiritual message to readers.

Indeed, the theory of colors has a significant role in every aspect of our life, that's why I chose to present this research entitled "Symbolism of Colors in Emîn Botani's Poems" despite introduction and results it comprises of two sections. The first section contains of the meaning and definition of colors, the symbolic meaning of colors in terms of religion, society, psychology, characteristics of colors and parts of colors. Whereas the second section contains of the application of these symbols in Emîn Botani's poems and analyzing it.

Keywords: Colors, Symbols, Poems, Poets, Ameen Botani, Religion, Culture, Society, Psychology.

NAVEROK

KURTEPEYV	III
PÊŞGOTIN	IV
KURTE	VII
ÖZET	IX
ABSTRACT	XI
NAVEROK	XII

DESTPÊK

I. METODOLOJÎ.....	1
II. JIYANA EMÎN BOTANÎ Û BERHEMÊN WÎ.....	3

PIŞKA YEKEM

ÇARÇOVEYA TEORÎK

1.1 TÊGEH Û PÊNASEYA RENGAN	8
1.2 TÊGEHÊ SÎMBOLÎZMÊ.....	16
1.3 SÎMBOLÎZM Û WATEYA NAVÊN RENGAN	20
1.3.1 Rengê Sor	20
1.3.2 Rengê Zer	21
1.3.3 Rengê Şîn.....	22
1.3.4 Rengê Kesk.....	23

1.3.5	Rengê Spî.....	25
1.3.6	Rengê Reş	26
1.4	SÎMBOLÎZMA RENGAN DI BAWERIYA AYINAN DA.....	27
1.4.1	Reng di Ayinê Îslamê da	28
1.4.2	Reng di Ayinê Mesîhyetê da.....	29
1.4.3	Reng di Ayinê Êzidiyan da	30
1.4.4	Reng li ba Zerdeştîyan.....	32
1.4.5	Pîroziya Rengan bi Şêweyekî Giştî li ba Çendîn Bawerî û Ayinan ..	33
1.5	SÎMBOLÎZMA RENGAN DI ÇANDA GELAN DA	34
1.5.1	Reng li ba Kurdan	35
1.5.2	Pîroziya Rengê Şîn (Tirkwazî) li ba Tirkan.....	37
1.5.3	Reng li Ba Ereban	38
1.5.4	Reng di Çanda Farisan da	38
1.5.5	Reng di Çanda Fîrewniyan da.....	39
1.5.6	Reng bi Şêweyekî Giştî li ba Çendîn Gel û Netewe yan.....	40
1.6	SÎMBOLÎZMA RENGAN DI SAYKOLOJIYA KESAN DA	43
1.6.1	Bandora Rengan li ser Derunê Kesan	46
1.7	RENG Ê EDEB (HELBEST).....	50
1.8	TAYBETMENDIYÊN RENGAN	53
1.8.1	Nejadê Rengî (Hue).....	53
1.8.2	Bihayê Rengî (Value).....	54
1.8.3	Hêza Rengî (Saturation)	54
1.9	PIŞKÊN RENGAN	55
1.9.1	Rengên Serekî û Neserekî.....	55

1.9.2 Rengên Sar û Germ	55
1.9.3 Rengên Bêlayan	55

PIŞKA DUYEM

SÎMBOLÎZMA RENGAN DI HELBESTÊN EMÎN BOTANÎ DA

2.1. JI RIWANGEHA HELBESTAN VE.....	57
2.1.1. Helbesta "Xemsarî"	57
2.1.2. Helbesta "Kesk û Sor"	58
2.1.3. Helbesta "Dê Gehîn"	59
2.1.4. Helbesta "Roja Kurdan".....	62
2.1.5. Helbesta "Man"	63
2.1.6. Helbesta "Veresiyana Brahî ya".....	64
2.1.7. Helbesta "Rêkeftiname".....	65
2.1.8. Helbesta "Helebçe".....	66
2.1.9. Helbesta "Pirsiyar"	68
2.1.10. Helbesta "Merg le Tabloyêkî Awî da".....	69
2.2. JI RIWANGEHA MIJARAN VE.....	70
2.2.1 Bandora Rengan li ser Saykolojiya Mirovan	70
2.2.2 Sîmbolîzma Rengan di Çanda Gelan da	79
2.2.3 Sîmbolîzma Rengan di Baweriya Ayinan da	90
ENCAM	98
ÇAVKANÎ	102
PÊVEK.....	110

DESTPÊK

I. METODOLOJÎ

Navûnîşanê Vekolînê

Ev vekolîn bi navê “Sîmbolîzma Rengan di Helbestên Emîn Botanî da” ye. Di evê vekolînê da me behs li mijarên girêdayî reng û bandora rengan li ser biwarên cuda yên jiyanê kirîye. Me behs li rengan kirîye ka çawa wek sîmbol di helbestê da hatiye bikarînan ji layê helbestvan Emîn Botanî ve.

Giringiya Vekolînê

Giringiya evê vekolînê di ewê çendê da ye ku li gor pêzanînên me gelek bi kêmî vekolîn li ser mijara rengan di biwarê edebiyata kurdî da hatîne encamdan, bi taybetî li herêma Kurdistana Iraqê.

Babetê rengan pir giringiya xwe heye, çunke di hemî biwarên jiyanê da cihê xwe girtiye. Ji ber evê yekê jî divêtin her kesekî agehî li ser vê mijarê hebin. Çunke di jiyana rojane da her kes pêdivî bi pêzanîna li ser rengan heye. Lewra me ferz zanî vekolîna xwe li ser evê mijarê encam bideyin. Da ku ronahiyekê bêxîne ser qulaçkekê ji qulaçkên evê mijarê. Vekolîneka zanistî li ser mijara rengan di biwarê rexneya edebî da li pirtûkxaneyê edebiyata kurdî zêde bikeyin.

Rêbaza Vekolînê

Ev vekolîn bi rêbaza wesfî-şîkarî hatiye encamdan. Wate me di pişka yekê da bi renekî teorîk wesfa têgeh û pênaseya rengan, têgehê sîmbolîzmê, sîmbolîzm û wateya navên rengan, sîmbolîzma rengan di baweriya ayinan da, sîmbolîzma rengan di çanda gelan da, sîmbolîzman rengan di saykolojîya kesan da, reng û edeb (helbest),

taybetmendiya rengan, pişkên rengan kir. Dîsan jî di pişka duyê ya praktîkî da me nimûneyên pêdivî helsengandîne û şirove kirine.

Dîsan da bikarîn ewan helbestan destnîşan bikeyin ewên reng têda bi kar hatîn, me şêwazê amarê jî bi kar îname. Ji bo vê çendê me amarek bo hemû helbestên dîwana helbestvanî kiriye û di encama vê de rêja sedê ya bikarîna rengan jê derxistî ye.

Arîşeyên Vekolînê

Yek ji arîşe û zehimetiyan di vê vekolînê da ew e, ku çawaniya raman û sîmbolên rengan rêjeyî ne û cêgîrînin li gor kes, çand, ayîn û.. hwd ev sîmbole dêne guherandin. Lewra karekê asan nîne ku mirov bişêtin ji bo her renekî raman yan sîmboleka drust û taybet destnîşan biketin. Lê arîşeya serekî bo encamdana vê vekolînê kêmatiya çavkaniyan bû li ser vê mijarê. Bi taybetî bi zimanê kurdî ku ev yek bûye eger em penayê bibeyne ber çavkaniyên biyanî û bi taybetî yên bi zimanê erebî. Ji ber hindê me pêkolên mezin kirine ku ev vekolîne bibe serçaweyek bo vekolînên dahatî yên girêdayî bi rexna edebî ya kurdî ve.

Sînore Vekolînê

Bi sedemê ku danana sînorekî regezêkî jênegar a vekolînên akademîk e, ev vekolîne jî bi helbestên Emîn Botanî û mijarên girêdayî bi rengan ve hatiye sînorkirin.

Çavkanî

Ji bo encamdana evê vekolînê nêzîkî 70 çavkanî hatine bikarînan ku ev hemû di beşa çavkaniyên vê vekolînê de hatine destnîşankirin. Bêguman hin ji van çavkaniyan wek çavkaniyên eslî yên vekolînê ji yên dî zêdetir hatine bikaranîn. Di vê çarçoveyê de berhemên Fehmî Balayî (Cîhana rengan. 2008) û Emîn Botanî (Dîwana Emîn Botanî. 2017) wek çavkaniyên ku herî zor hatine bikaranîn derdikevin pêş.

Naveroka Vekolînê

Ev vekolîne ji bilî destpêk û encamê, ji du pişkan pêk dihêt. Pişka yekê çarçoveya teorîk e, ku atîye dabeşkirin li ser têgeh û pênasê rengan, têgehê sîmbolîzmê, sîmbolîzm û wateya navên rengan, sîmbolîzma rengan di bawerîya ayînan da, sîmbolîzma rengan di çanda gelan da, sîmbolîzma rengan di saykolojîya kesan da, reng û edeb (helbest), taybetmendiya rengan û pişkên rengan.

Pişka duyem jî pişka praktîzekirina vekolînê ye bi navê "Sîmbolîzma Rengan di Helbestên Emîn Botanî" da. Di vê pişkê da me helbestên Emîn Botanî li gor riwangeyê helbestan û mijaran praktîze kirine.

Di beşa encamê de encamên ku di vê vekolînê de hatine bidestxistin hatine destnîşankirin. Amara ku me ji bo rêja sedê ya bikarînan rengan di nava helbestên dîwana Emîn Botanî de kiriye me di nava encaman de bi cih kiriye.

II. JIYANA EMÎN BOTANÎ Û BERHEMÊN WÎ

Botanî di sala 1966an de li gundê Şîxalkê, li deşta Botanê ya ser bi bajarkê Berdereşê ve hatiye dinyayê. Di destpêkê da navê wî yê berahiyê Muhemed Emîn bû. Navê bavê wî Heyder Husên Ebdulla ye û navê dayka wî Asya Husên Sefer e. Botanî bi navê xalê dayka xwe hatiye binavkirin. Wan hemûyan wî demî nasname nebû, tenê bavê wî suretê qeyda 1957an hebû. Muhemed Emîn navê wî bi tenê bû. Piştra li Hewlêrê wana nasname çêkirin û wê demê Muhemed ji navê xwe havêt (Botanî, 2020).

Botanî xwendina xwe ya destpêkê di sala 1973an de li qutabxaneyê Girdepan li deşta Botanê li devera Berdereş/Akrêyê xwendiyê. Di sala 1974/1975an de li qutabxaneyê Ordîgeha Behramê li Îranê li devera Loristanê xwendiyê. Ji sala 1975an heta 1977an qutabxana Hemurabî li gundê Şe'lanê el-Hemmadî, nahiya Sedîr li qeza Hemze el-Şerqîye ser bi parêzgeha Dîwanyê li başûrê Îraqê xwendiyê. Ji sala 1977an heta 1987an li qutabxaneyên destpêkê û navincî û berhevî li komelgeha Kanî Qirjale li Hewlêrê xwendiyê. Ji sala 1987an heta 1989an li Zankoya Bexdayê kolêja Yasa û Ramyariyê, beşa

yasa xwendiyê. Piştra ji sala 1990î heta 1992yan hatiye veguhastin bo zankoya Selaheddîn li Hewlêrê û bekaloryosa yasayê wergirtiye. Botanî di sala 1974an de li gel malbatê tevî şoreşa Eylûlê bûyne û çûne welatê Îranê. Di sala 1975an de piştî dawîhatina şoreşa Eylûlê ew weke malbat berev başûrê welatê Îraqê hatine nefîkirin. Ji sala 1987an heta 1989an wek qutabiyê zankoyê li Bexdaya paytextê welatê Îraqê xwendiyê. (Botanî, 2020).

Botanî pênc bira û du xwişk hene, birayekê wî koça dawî kiriye. Di nav birayan de ew kurê navincî ye. Niha akinciyê herêma Kurdistana Îraqê ye li parêzgeha Hewlêrê, li qezaya Xebatê. Botanî bi awayekî fermî fermanber e li Serokatiya Herêma Kurdistanê. Zimanê erebî bi pileya baş dizanî lewra karê wergêranê jî pê diket. Bêtirî 30 salan e ew wergêrê navbera zimanê kurdî diyalektên kurmancî (behdînî) û soranî" û zimanê erebî ye. Botanî zewicî ye û du kurên wî hene (Botanî, 2020).

Rewşa siyasî û derdora civakî, bi taybetî jî sîtema civakî bandoreka mezin li ser Botanî kiriye. Evana bûne egerê wê yekê ku Botanî ber bi helbestê ve biçîtîn. Sîtem û zorî, jiyana rêncberî û cotkariya bavê wî; jiyana hejarî û nebînyê, neheqiyên nav jiyane, zehmetî û tirs û rev û xurbetîya salên şoreşê û awarebûn û nefîkrin û bêcîûwarbûn û bêkesiyê... Eve hemî û bandora naxê wî bi xwe ku zaroyekî nazik û xwedî xewn û xeyaleka gelek cuda bû ji realîta xwe ya civakî û eşîrtî bûne sedem li pey zimanekî nû, bo pênasakirineka nû, bo jiyaneke nû bigerîtin. Ji ber vê çendê ew jiyana wî didît layiqî wê yekê nebû ku ew xwe bo bikete qurban. Lê xewn dîtîn bi jiyaneke nû ve layqî qurbanîdanê ye. Lewra bandora xeyal û xewna wî bû sedem bixebtît û lîstek nû bo hemû navan bi afrînît. Tev tiştên kevin û nû navdar biket bi rêya vehandina helbestê. (Botanî, 2020).

Botanî beriya helbestê wek helbest bivehînît helbesta klasîk û hevdemên kurd bi hiş û têgehiştina xwe ya wî demî; destpêka salên heştêyan xwendibûn. Edebiyata kurdî û ya erebî heta radeyekî xwendibû. Li jiyê deh diwazde saliyê Botanî Qur'ana pîroz xitim kir û di mawê du sê salan de bêtirî bîst û pênc caran wî Qu'ran xitim kir. Gelek serhatî û pendên kurdî û dastan û çîrok û çîvanokên folklorê kurdî ji dayk û bav û kesên malbatê bi giştî guhdarî kirîne. Paşan Botanî helbestên Melayê Cizîrî (1570-1640), Ehmedê Xanî (1650-1707), Feqiyê Teyran (1590-1632), Ehmedê Nalbend (1891-1963), Pertew

Begê Hekarî (1777-1841), Mele Mensûrê Girgaşî (Sedsala 15an û 16an), Melayê Batê (1417-1491), Bekir Begê Erizî (B.1767), Şêx Memdûhê Birîfkî (1911-1976), Sadiq Behaedîn Amêdî (1918-1982), Bedirxan Sindî (1943- li jiyanê ye), Cegerxwîn (1903-1984), Sebrî Botanî (1925-1998) Ebdulrehmanê Mizûrî û Mueyed Teyîb (1957- li jiyanê ye) xwendîne. Dîsan haydarî helbestvan Baba Tahirê Hemedanî (935-1010), Nalî Şehrezûrî (1791-1855) û Salim (1800-1866), Mehwî (1813-1906), Faîq Bêkes (1948-1905), Pîremêrd (1867-1950), Goran (1904-1962), Qanî' (1898-1965), Kakey Felah (1928-1990), Şêrko Bêkes (1940-2013) û Letîf Helmet (1949- li jiyanê ye) bûye. Botanî kilasîk û nûjena edebiyata sosyalîzmê yê sovîyeta berê li serdemê Şoreşa Oktoberê ji Aleksandr Pûşkîn (1799-1837) û Maksîm Gorkî (1868- 1936) bigire heta Tolstoy (1828-1910), Anna Exmatova (1889-1966), Lîrmontov (1814-1841), Hemzato (1923-2003) xwendine. Heta digehîte afirandin û edebiyata dinyayê, ji helbest û edebiyata Ewropî û Espanî û Emrîka Latîn û Zinciye Afrîka û edebî berxwedana milletan. Hunerê berxwedana milletan, heta digehîte afirandin û edebiyata gelên derdora Kurdistanê ji ereb û tirk û farsan. Helbestvanên Îraqî Bedir Şakir El-Seyab (1926-1964), Nazik El-Melaike (1927-2003), Cemîl Sidqî El-Zehawî (1863-1936), Me'ruf El- Resafî (1875- 1945) û yê ereb ji kilasîkên kevin berî îslamê û piştî îslamê. Heta digehîte Nizar Qebanî (1923-1998) û Mehmed Derwêş (1941-2008), Edonîs (1930- li jiyanê ye). Ji farsan ji Mewlana Celaledînê Romî (1207-1273), Umer Xeyam (1048-1131), Sohrab Sepehrî (1928-1980), Ehmedê Şamlû (1925-2000) û Firûx (1934-1967). Ji Tirkan Nazim Hikmet (1902-1963) û Ehmed Arîf (1927-1991) xwendine (Botanî, 2020).

Di çarçoveya pisporî û zanyariyê wî de kesayetên dîrokî û hevçaxên ku Botanî ji wan hez diketin feylesof Sokrat (470 bz-399 bz), Xeyamê helbestvan, Feqiyê Teyran, Mensûrê Hellac (856-922), Mewlana Celaledînê Romî, Ehmedê Xanî, Şêx Ebdulselamê Barzanî (1887-1914), Mela Mistefa Barzanî (1903-1979), Cegerxwîn, Ehmedê Nalbend û Mesûd Barzanî (1946-Li jiyanê ye) ne. (Botanî, 2020).

Botanî diyar diket û dibêjît ku li destpêka salên heştêyî min rehmetî seyda Ebdulxenî Elî Yehya Botanî nas kir. Wî çaxî ew li beşa ragehandina rêveberiya perwerda Hewlêrê fermanber bû. Ew rojnamevan û nivîskar û kesekî welatparêz bû. Hevnasî û

nêzîkîya me hebû, em xelkê eynî gund û devera Girdepanê bûn. Wî gelek şîretên baş li min dikrin li warê nivîsîn û edebiyat û welatparêziyê, ew bi xwe jî wek kes û malbat hogiriya wan bi hizra çep û sosyalzimê hebû. Em gelek nêzîkî hev bûn, di mehê de heke derfet heba çend careka min serdana wî dikir. Li sala 1984ê yekemîn nivîsîna min li govara *Karwan* li Hewlêrê belav bû, babetekî folklorî bi navê “Baran Nehatin” bû. Wê salê kêmbaranî bû; dayka min du çîrok û serhatiyên kelepûrê kurdî bo min vegêran û min bi kurmancî nivîsî û bo govara *Karwan* şandin. Rojekê li Hewlêrê bûm min ew govar dît û vekir; min mijara xwe dît ku hatiye belavkirin û min xwe nedît!!! Ji xweşiya da ez firîm esmanan (Botanî, 2020).

Salên ku ew li Bexdayê jî bû, ku li zankoyê bû, ezmûnekî pirr zengîn û dewlemend bû bo wî li ser her astî. Ew bêtir nêzîkî dinyaya hizir, huner, edebiyat, çand û xwenasiyê bû. Wî hevalên nû û kurdên bajarên dî yên Kurdistanê dît. Wî dît, hizir û çanda ereban jî baştir fêhm kir û nasî, ezmûna wan jî baştir nas kir, şanoya wan, helbest û edebiyat û kesatîya wan. Çalakiyên kurdan jî li Bexdayê bêtir û firehtir bûn, ew bi temamî hate di nav ezmûneke cuda, weke hest û helwîst û hizir. Rêç û rêkxistinên kurdan yên çep û rast, helbestvan, edîb, nivîskar û rojnamevanên kurd ji hemî temen û aydiyan û bîr û bawer û qonaxan. Bexda navendeka mezin bû bo wî ku li hemû çalakiyên rewşenbîrî, çandî û hunerî kurdî û erebî berhev û hinek caran beşdar bibît. Beşdarî hin êvarên helbestê dibû li Komeleya Roşnibîrîya Kurdî ku heftiyê carekê wan çalakiyek hebû. Piranya berhevbûyên çalakiyê qutabiyên zankoyê bûn. Festîvalên edebî, şanoyî, şewekarî, sînemayî û çandî bi giştî dihatine lidarxistin, pêşangehên nêvdewletî yên pirtûkan hebûn. Derfet hebû helbestvan, edîb û kesatîyên mezin nas biket. Botanî li Bexdayê çend carekan helbestvan Sebrî Botanî, Bedirxan Sindî, Şîkur Mistefa dîtine. Wî li Bexdayê kesên mîna Bextiyar Elî, Merîwan Wirya, Qani' û Şêrzad Hesên dîtine ku piştî li derve û Silêmaniyê “Navenda Rehend” bo vekolînên kurdî ava kirine. Piraniya hevalên îro li bajarên Kurdistanê xizmeta çand û hunerê kurdî dikin wî demî li Bexdayê bûn. Mebesta pê bajarê Dihokê ye. Li qonaxên cuda cuda yên ezmûna wî ya helbestê bêtir hez ji helbestên "Cizîrî, Teyran, Xeyam, Suhrab, Qebanî, Cegerxûn, Sebrî Botanî, Bedirxan Sindî, Ebdulrehman Mizûrî, Mueyed Teyib, Hêmin Mukriyanî, Hejar Mukriyanî, Şêrko, Bêkes, Letîf Helmet,

Bextyar Elî û li vê dûmahiyê jî Edonîsê Ereb" kiriye. Ew niha weke vexwendin her tekstekî dixwînit bi taybetî helbestan. Ew bi xwe jî heta bi temamî nivîsîn guvaşê li wî neke; ew nanivîse. Gelek caran sal derbas dibe û ewî çî nenivîsiye (Botanî, 2020).

Botanî yek dîwana çapkirî heye bi navê *Emîn Botanî*. Botanî di bergê dîwanê xwe da yariyeka rengan bi kar îname. Xweya ye nav û nîşanê dîwanê Emîn Botanî ye ku ew pît bi rengên reş û sor nivîsîne ku pîtên M, N, B, T bi rengê sor nivîsî ne, ku wate "Min Bit" ku bi ramana ez "senem" im. Li dûmahîka dîwanê nivîsiye min bit hate şikandin. Eve ramana wê çendê ye ku wî geştek di gel xwendevanî kir. Bo wan berçav kiriye ku eve xeyal, xewn û çîroka wî ye. Ku li destpêkê ew nav û nîşan bîtin li dumahîkê ew malavahiyê ji xwendevanê xwe dixwazît û dibêjît peyama min gehşit û şula min xilas. Piştî dîwanê jî çar pênc helbestên dirêj hene û li malperan hatîne belavkirin di gel hindek tekstên sitrankî lîrîkî. Hunermendên mezin ên kurd weku Hesên Şerîf, Muhemed Teha Akreyî û gelekên dî helbestên wî kirîne sitran û bi dengê xwe gotine. Dîsan weke nivîsîn bi dehan berhem li govar û rojnameyan belav kirine. Wergêranên wî ji erebî bo zimanê kurdî belav bûne (Botanî, 2020).

1 PIŞKA YEKEM

ÇARÇOVEYA TEORÎK

1.1 TÊGEH Û PÊNASEYA RENGAN

Reng ji girintirîn diyardeyên xwezayî ne. Mirovan di serdemên kevin da reng bi kar îname, ji hindek giyayan û xwîna giyaneweran dirust kiriye. Di karên hunerî, pîşesazî û bînasazî bi kar îname. Bi giştî jî rengan di gel hemî biwarê jiyane tîkel bûye û cih girtiye. Wekî saykolojî, ayînî, civakî û gelek biwarên dîtir. Wate Pişkeka giring e ji jiyana mirovî û ji hebûna wî cuda nabîtin.

Diyardeya rengan li gor av û hewayî cihî û bizava pêlên ronahiyê diyar dibî. Di vî livînê da xwe digehînite çavî bi dirêjahiya pêlan rengê sor diyar dibî, bi kurtiya pêlan bi rengê binefşî bi dawî dihêtin ku kurttirîn reng e di dirêjahiya pêlan da. Ev rastî dabeşkirî ye li ser şaneyên kurt û dirêj ji bo diyardeya rengan. Ev diyarde jî li jêr ronahiyeka bihêz ya wekî ronahiya tavê derdikevî (Balayî, 2008: 11).

Derbarê pênasikirina rengan di şîyan da ye em pênasayên çendîn nivîskar û feylesofan ji çend layan ve diyar bikeyin:

Frederick Milner dibêjî reng peyvek e dihête bikarînan bo pesinkirina ew hestên ku mêşkê mirovî werdigirî, dema ku tora çavên mirovî dikevîte di bin çavpêkeftinê de bi kiryara dirêj ya pêlên destnîşanikirî ya ronahiya rojê. Anku ev zanaye bi şeweyekî zanistî kiryara rengan şîrove diket ku peywendî di navbera hest, mêşkê mirovî, tora çavî û ronahiya rojê da heye (Xanikî, 2011: 10-11).

Dîsan Arîstoteles di karên xwe yên felsefî da hizr û boçûnên xwe derbareyê rengan diyar kirine bê ka reng çi ye û çawa dirust bûye. Navên hindêk dar û ber û giyanewer û ew tiştên di hebûnê da, çawaniya dîtina wan tiştan diyar kiriye. Diyarkirina rolê wan rûdanên di atmosfîran da rû diden li ser erdê, amaje bi wê yekê didet ku reng ji wan diyardeyan dirust dibin (Narmîn, 2006:11). Wate Arîstoteles dirustbûna rengan girê didet bi wan diyardeyên li gerdûnê rû diden mîna rojhelîtbûn û rojavabûn, roj û şev, baran û befrbarîn, werzên salê û hwd. Pêçewanekirina evan rûdanan li ser erdê, dibine egerê wê çendê ku reng li ser erdê peyda bibin. Li gor boçûna wî ku hindêk reng hene xwe bi xwe dikevîne di xwezayê da bi rêya maytêkirina tîrêjên rojê ku alîkare rengê sor dirust dibîtin.

Ebû Yusif Yeqûb bin Eshaq el-Kindî dibêjît: Ronahiyê rolekê mezin heye di dîtina tiştan da ku di tariyê da her tiştek reş û diyar nîne. Ronahî alavekî serekî yê dîtînê ye, çünke reng di hundirê xwe da çawaniyekê hestî ye ji bo dîtînê (Ebdilxefûr, 2008: 4). Mebest pê reng çawanî ye û ev çawaniya taybet e bi hestê dîtînê ve. Peywendî bi hîç hestên dîtir ve nîne mîna hestên bihîstinê û tamkirinê. Çünke bi tenê bi alîkariya hestê dîtînê em rengan dibînin û jêk cuda dikeyin.

Ji layê fîzîkî ve Yehya Hamodî diyar diket û dibêjît ku reng bi tenê hestek e di endamê hestiyar da heye, derveyî vê çendê çi hebûn ji bo rengan nîne (Narmîn, 2006:14). Ku wate reng dihête hestkirin bi rêya endamê hestiyar dihête dîtîn ku endamê hestiyar kontrola xwe li ser kiryara dîtînê heye. Ew tîrojên rojê dikevîne ser tenê bi rêya tora çavî dihêne dîtîn.

Eger em ji riwangeyê estetîkî ve berê xwe bidine rengê û giringiya wî, dê bibînin ku reng şeweyek e ji şeweyên estetîkî yên jiyanê ku bandora xwe li ser hest û derûnê mirovî diket, bi rêya rengan em çêjê ji jiyanê werdigirin (Weyisî, 2002: 12). Bi rêya evê pênasayê bo me diyar dibît ku mirov di cîhaneka rengîn da dijîtin. Reng tevî her tiştê derdor û jiyanê me bûye. Reng alavekî giring e ku bandoreka bihêz heye li ser derûnê mirovan, çünke pitirîya caran dibîte rêkek ji bo derbirîna her tiştêkî veşartî di naxê mirovan da.

Dîsan her wek me gotî reng yek ji regezên estetîkî ye li ba her hunerekê. Ji ber hindê cihekî mezin û berfireh girtiye ku dişet şeweyê dahênanê di wê hunera diyarkirî da biguherît çî pozîtîf bît yan negatîf bît (El-Sameraî, 2008: 14). Ji ber ku ne bi tenê girêdayî rewş û zewqa mirovî ye, ciwanî û kirêtiya hunerê ye ku li ser çawaniya bikarînan wî di karên cuda da dirawestît. Çünke bo nimûne eger di tabloyeka hunerî da reng bi şeweyekî lihevhatî hatibin bikarînan, dê bandoreka baş li ser wî karî hebîtin û dê karekî serkeftî û ciwan bîtin.

Herwesa li ba hunermendên şewekar ew karlêkirin e di navbera şeweyekî ji şeweyan de û ew tîşka ronahiyê ye ewa ku dikevîte ser wî şeweyî yan wî tenê bi wê rêkê em wî şeweyî û rengî dibînin (Narmîn, 2006: 15).

Reng nûneratiya wêneyê derveyê şeweyî şiklî diketin. Ku cihekî taybet girtiye di hunerê da ku bandoreka mezin heye li ser hestan û derûnê mirovî ku hindê hestên nû peyda dibin wek xweşî, dîfirehî, dîtengî û nerehetî. Ji ber wan raman û sîmbolên rengên li ber çavên me dikevin bo nimûne rengê sor derbirîne ji dudiliyê diketin; yan şîn sîmbola dîlovaniyê û xerîbbûnê ye; zer jî digel karvedan û xweşiyê dihête behskirin; reş sîmbol e ji bo gelek tiştan mîna neman û nexweşî, bêbextiyê; rengê spî jî derbirîne ji hevî, mehebet û paqijiyê diketin hindê caran jî sîmbola bê îvlihiyê ye.

Gelek caran jî reng dibête nihêniyek ji nihêniyan, alavek ji bo derbirîn û têgihiştinê û nîşandanek ku di hundirê xwe da ew bi xwe pê ranabît. Helbet xwedî dem û cih û tiştek e. Çünke yek e ji nihêniyên hebûnê, ew hêza serincrakêş e ya bandora xwe dikete ser endamê hestiyar ku dibête eger ji bo peydakirina xweşiyê yan nexweşiyê li ba mirovî (El-Yaqût, 2016: 6). Bi rêya vê pênasîyê bo me diyar dibît ku reng derbirîne ji barûdox, rewş û zewqa cuda cuda ya derûnê mirovî diketin. Herwekî pêştir me diyar kirî ku alavekî ji bo derbirîna hestên xweş û nexweş û karvedanên li ser derûnê peyda dibin. Çünke reng dibête egerê peydabûna wêne û dîtinan, dirustbûna xweşî li ba derûnê û xemgîniyê û karvedanên cur bi cur. Herwesa peywendî bi dem û cihî ve heye; di şev û rojê da dema pilaya rengan dihête guhartin ji renekî bo renekî dîtir, bo nimûne dema li spêdehiyan wesa reng dihêne pêş çavên mirovî ku mirov hest pê diketin ku yên hatine şîştin ji tariyatiya şevê, wesa

ciwanî û paqijî û zelalî lê diyar e. Bandora wê li ser endamê hestiyar vedigerêt, ji bo wan raman û delalet û sîmbolên girêdayî bi derûnê mirovî ve. Dibît renek sîmbola tiştêkî xweş bin dê bandoreka baş û dilveker li ba mirovî peyda bît dema temaşekirina wî rengî xweş bo mirovî.

Ehmed Muxtar dibêjît; reng girêdayî ye bi hestan ve. Bi hindek mercên navxweyî yê laşê mirovî û hinek mercên derekî yê peywendîdar bi ronahiyê û palpiştî rêya û bi van mercan em bi rengan dizanîn (Narmîn, 2006: 15).

Mebest pê ew e ku hestkirin bi rengan mercek e divêt bihête bicihînan. Hindek ji alavên navxweyî û hindekên derekî di laşê mirovî û çawaniya endamê hestiyarê mirovî, hindek jî bo karvedanên derve wek çendatiya tîrojên ronahiyê û ew qebare digehête çavî, wek dirêjî kurtiya guş ya rengî (Narmîn, 2006: 15).

Dîsan em dişêyin bi hindek şeweyên dî rengî pênase bikeyin:

Reng yek ji hêmayên amaje yê bêdeng e. Di hundirê xwe da xwedî gelek raman û sîmbolan e. Çünke di rengan da tiştêkî giringtir diyar dibît, ew jî ramanên berze û ne-aşkera, ew ramanên berze yê rengî sîmbolan dibînin. Çünke reng di pêkhatiya xwe da du cihan bi xwe ve digirêt. Ew jî ku peywendiyeka amadebûnê dirust diket. Dîsan berzebûn û ne-amadebûnê diyar diketin (Nihêlî, 2005: 15).

Herwesa zana û pisporên xwezayî peyva reng, bi diyardeyeka fizîkî li qelem diden. Piraniya hunermendên şewekarî û kesên di vê meydanê da kar diken weku karkerên çapxane yan peyva reng bi wateya madeyên boyaxê *pigments* yê ku berhemên rengan bi kar tînin bi nav diken (El-Sefar, 2010: 64). Bi wateyeka dî reng ew bandora fîzyolojî ye, taybetmend e bi endamên laşê berhemdar ve li ser torên çavî. Çi ji aliyê berhemdariya madidê boyaxê yê rengîn yan jî tîrojên ronahiyê yê rengîn (Elî, 2001: 7).

Herwesa şewekarê kurd Fehmî Balayî derbare rengî de dibêjît: Eger rengî hestkirin bi çî hebûnên li derveyî endamên hestiyar yê giyanewerên xwedî ruh nebît. Reng tiştê herî balkêş e di xwezayê da ku beşdariyê di afirandina ciwanîyê da diketin. Reng yek e ji beşên

rêkxistina hesta mirovî bi taybetî hestê dîtînê. Diyardeya rengî li ser dirêjahiya pêlên ronahiyê li ser her laşekî bi alîkariya torên çavî, lêdanên xwe vediguhezîne mejî û sîmbol û nîşanan. Diyardeya evan rengan jî girêdayî rewşa av û hewayî û ronahiya li ser ewî madeyê (Balayî, 2008: 11-12).

Reng şeweyê pêlên ronahiyê werdigirî û bandora xwe dikete ser çavan ji bo dîtînê. Ew ronahî dabeş bûye li ser pêlan. Reng jî bi rolê xwe van pêlan jêk cuda diketin, ji layê dirêjî û kurtiyê ve, ji vê bûyerê komeka rengan dirust dibîtin. Reng li ba me diyar dibin, wekî rengê sor, kesk, zer hwd. Reng wekî zexerfeyekê yan jî xemilandina ji bo çavan. Reng bi tenê hindek tîrojên ronahiyê ye. Li gor lerizîn û dirêjî û kurtiya wan tîrojan reng dirust dibîtin, hindî pêla ronahiyê nêzik bît reng berev sorî ve diçîtin û hindî pêl kurt bîtin reng berev şînî, zerî û binefşî ve diçîtin (Ubaiyd, 2013: 13).

Têgehê rengan di gelek biwarê jiyanê da:

Eger em ji guşenîgayê saykolojî ve berê xwe bidine rengan, dê bînin têgehê rengî ji layê saykolojî ve boçûnên cuda bi xwe ve girtine. Ku rengan bandorên xwe yên cuda li ser derûnê mirovan kiriye û diyarkirin û ronîkirina hestên wî yên derûnî û dîsan zewqa wan ya takekesî. Ji ber hindê jî reng bûye cihê giringî pêdanê ji layê kes û çanda gelan ve, reng li ba wan bûye xwedî raman û sîmbol, mîna sîmbol ji bo xweşî û nexweşîyan jiyan û mirinê û gelek tiştên dî. Li serdemên nû û hevçerxda jî diyarkirî ye ku rengî bandoreka mezin heye li ser şaneyên hestiyar ên mirovan, ji ber ku her renek xudan pêleka ronahiyê ya taybet e ji layê dirêjî û kurtiya pêlê ve. Lewra her pêleke cuda ji pêleka dî ya ronahiyê bandoreka cuda heye li ser amîrê hestiyar û derûnî. Ji ber hindê jî ev bandor erênî û nerênî ne (Ubaiyd, 2013: 10).

Ji ber hindê jî vekolînên saykolojî diyardiken, reng ne bi tinê hindek pêl û lerizînên ronahiyê ne. Lê ew xwedan bandorên bihêz in ku digehine kûrtirîn xela derûnê mirovî. Ji wan bandoran jî erênî dibine egerê bêhn firehiyê, viyan û gîrnijînê, hestên xweş li ba mirovî peyda diken. Hindek ji wan jî nerênî ne dibine egerê peydabûna hestên nexweş li ba mirovî, mîna kerbgirtin, diltengî, dudiliyê. Dîsan dibine egerê hindê heta bandoreka mezin li ser reftar û zewq û tendirustiya mirovî biken. Lewra jî di şaristanîyetên kevin da

mîna *Fîr'ewnîiya* reng wek çareserî ji bo nexweşîyan bi kar îname, zêdebarî şaristaniyeta *Grîkiyan* jî. Li ser demên nû jî senterên cuda cuda hene ji bo çareserkirina nexweşîyan bi rêya rengan.

Reng girêdayî derûn û cîhana taybet a hestê kesan e, dibîr li dema çavê mirovî li tişteki rengên dinêrîn, di şîyan da ye ew renga êkser bandora xwe li derûnê mirovî biket, yan jî biçîte di dilê mirovî da. Çünke dibîr qebîlîkirin û hezkirina her reneki bo reneki dîtir cuda û rêjeyî ye li ba kesekî bo kesekî dî. Ev çende jî dihête guherîn li gor hestê hundirê kesan. Bo nimûne dibîr ku renga *kesk* li ba kesekî reneki xweşikiyê bîr. Belê li ba kesekî dî nehête hezkirin. Yan bandoreka erênî yan nerênî hebîr li ser derûnê wî kesî (El-Zewahîre, 2000: 15).

Dîsan jî rengan saykolojiyeka taybet bi xwe ve heye ku bandora xwe dikete ser wijdan û rewşêr hêlûkewtên kesan. Ev çende jî ji jîngehekê bo jîngehekê û ji rewşênberîyekê bo yeka dî cuda ye. Çünke hindek rengan wate û sîmbol û bandorên xwe yêr cîgîr hene li ser derûnê mirovan nayêr guherîn hindek jî caran tene guherîn.

Eger di goşênîgaya hunerî da sehkeyine têgehê rengî. Dibîr kevalekê rengên ya hunerî bala me bikîşîr, sihra xwe ya rengan li mirovî biketin ku dibîr bo hindek dema kurt li beramber wî kevalî rawestîr û bihurî li binêrîr dibîr bandoreka mezin li me biketin. Çi rengên wê kevalî, rengên sar bin yan rengên germ bin dibîr mirov xwe tene da bibînîr û mirov husa hizîr biket ku ew rengên wê kevalê nîneratiya rastiya jiyana me biken. Gelek egerên dî ji ber hindê jî divêr haya mirovî li ser hunerê hebîr li ser raman û sîmbola rengan. Bi taybet hunerê nîgarkêşiyê ku zimanê derbirîrê ye bi rêya wan rengan hunermend dişêr hizîr û hestên xwe derbibîrîrîn. Lewra jî dema mirov şareza bîrîn di raman û sîmbola rengan da dema li wî kevalî dinêrîrîn dene bo mirovî rewş û mebesta ewî hunermendî diyar bîr.

Dîsan jî di biwarê edebiyatê da jî giringî yeka zor daye rengan taybet janrê helbestê. Çünke helbest huner e wekî her hunereke dî, lewra di vehandina helbestan da her afirînerêkî alavekî heye yan çend alav. Alavê helbestvanî jî peyv in, ku bi rêya peyvyan bişêrîn derbirîrê ji wêneyekî ciwan e hunerê biketin, cudahiya ewî wêneyî li dû şarezayî,

şêwaz, bagirewendê rewşenbîrî, şîyanên edebî û zimanî helbestvanî dimînit. Da bişêtin wêneyekî herî baş biafirînît ku pirî derbirîn û raman bîtin (El-Mitîrî, 2014: 1).

Peywendiya di navbera helbestê û rengî peywendiyeka bihêz e ku rengî bi şêweyekî diyar û ronî di nav helbestên gelek helbestan da rengeve da ye, dîsan di jiyan û jîngehên wan da bi şêweyekî rasterast û ne rasterast. Dibît ew jîngeha nivîser û edîb tê da dijîtin bandoreka bihêz lê biket berev cîhana rengan bibet. Bi taybet jî helbestvan da ku bişêt bi rêya rengan pitir derbirînê ji hizr û boçûnên xwe biket. Lewra dê hewl bidet berev cîhana rengan çît. Herwesa ji bo afirandina wêneyekî edebî yê ciwan dê penayê bibete ber rengan û dûv şêwazê xwe dê sereder digel rengan ketin û karên xwe yê edebî da bikarînet çî bi şêweyekî rasterast yan ne rasterast. Herweha reng zor têkelî cîhana wan ya taybet bi xeyal û fantazî bûye. Ji ber hindê jî, ji bo afirandina wêneyekî helbestê yê ciwan. Bi taybet helbestvanên Kurd gelek caran pena biriye ber keresteyên xwezayî û xwezaya Kurdistanê jî pir e ji rengan û reng ji bo derbirînên xwe bi kar îname wekî sîmbol bi kar îname ji bo gelek mijarên felsefî, ramyarî, rewşenbîrî, civakî, derûnî, evînî, estetîkî.

Herwesa eger em ji riwângê ayînî ve li rengî binêrin, dema tora çavî reng dîtî û bi rêya pileyên rengan reng jêk cuda kirin, mirovan bo rengî raman û sîmbol diyar kirin û li ser wan sîmbolan rêkeftin. Her rewşenbîriyekê û ayinekî hindek reng wek sîmbolên taybet bi xwe ve destnîşan kirin ew sîmbol bûne cihê giringî û pîroziyê li ba ewan ayîn û bawerîyan.

Reng di nav hemî têkst û rê û resm û bawerîyan da rengveda ye. Her ayinekî li dûv bawerî û taybetmendiya xwe giringî daye rengan û her bawerîyeke cuda ji bawerîya dî çend raman û delalet û dayine rengan, wek sîmbol bi kar îname ji bo derbirînên xwe yê ayînî yê cûrbecûr. Wekî di ayina îslamê da rengan rengvedaneka mezin hebûye ji ber ku gelek caran navên rengan di Qurana pîroz da hatiye ji ber hindê jî giringiyeka mezin pê daye. Bo nimûne rengê spî yazdeh caran di Qurana pîroz da hatiye. Rengê spî jî di îslamê da sîmbol e ji bo paqîjiyê û zelalî û karên baş (El-Dorî, 2002: 59).

Herwesa di ayinên wekî Êzdiyatî û Zerdeştîyê jî da rengî rengvedana xwe hebûye û her renek jî çend delalet û felsefeyan hatiye. “Bo nimûne di ayinê êzidiyan da, reng bi

şêweyekî berfireh bi kar îname. Çi bi şêweyekî rasterast bo nimûne rengê reş, sor, zer û kesk, yan ne rasterast hatine bikarînan wekî xerqe, berat, roj, agir.. gelekên din. Ku pişt her peyvekê da rengê heye. Bo nimûne rengê spî di gelek têkstên wan yên ayînî da bikarhatî ne” (Xanikî, 2011: 42).

Rengan di nerît, civak, têkst, xwendin û baweriya Êzidiyan da ciyekî baş û berfireh girtiye. Bo nimûne di vê sebeqa ayinê "Êzidiyan" da behsa rengê spî bi vî şêweyî hatiye kirin:

Libsê îmana yê spî ye

Ê nazke, ê letîfe, ê qewî ye

Hûn me hingêvinê gelî sunî ye

Ew zor rengê di xeyirî ye (Q. Mirîdiyê) (Xanikî, 2011: 45).

Ku wate rengê spî di ayinê Êzidiyan da rengê cilên zelumên ayinê Êzidiyan e, rengê spî sîmbola îmanê ye.

Herwesa ji layê çand û civaka gelan ve, rengê gelek sîmbol û raman bi xwe ve girtine. Lewra têgehiştin û zanîna sîmbol û ramana rengan di biyavê çand û rewşenbîriya gelan ve karekî fer û pêdivî ye. Sîmbol û bihayê rengê ji civakekê bo civakeke dî û ji neteweke bo neteweke cuda ye. Bo nimûne rengê spî li ba ewropîyan sîmbola paqijî, sozdariyê, aştiyê ye, li ba hindêk neteweyên dî rengê spî sîmbola mirinê ye. Bo nimûne li dema yek pêdivî bît ku karekî encam bidet li cihekî yan seferê biketin bo wî cihî yan her tiştekî dî, divêt pêzanîn li ser wî cihî hebin ewê kar pê heyî, ji her layekî ve civakî, ayînî û hunerî, htd. Giring e şahreza bîtin li ser dab û nerîtinî wan yên civakî taybet ew tiştên sîmbol li ba wan.

Bi wateyeka dî ya cuda, têgehê rengan li ba her miletekî ciyawaz e. Bo nimûne netewa "Basa" li *Lîbîriya* bi tenê du nav hene bo polînkirina rengan. "Zîza" bo porteçalî û

sor û zerî. "Hoy" bo kesk şîn û erciwanî. Lê gelê *Eskîmo* bo rengê spî bi tenê 17 nav hene ku li gor barûdax û astê befrê ev nav dihîne jêk cudakirin û bikarînan (El-Sedîq, 2019).

Bi kurtasî her renek xwedî raman, felsefe, sîmbolê xweyên cur bi cure. Karekê asan nîne ku mirov bişêtin ji bo her renekî raman yan sîmboleka drust û taybet destnîşan biketin. Çünke ev raman û sîmbole rêjeyî ne û cêgîrnînin ku li gor kes, çand, ayîn û.. hwd ev sîmbol û ramane dêne guherandin bo nimûne di bît rengî spî liba gelekî sîmbola aştiyê bîtin, belê li ba gelekê dî sîmbola mirnê bîtin .

1.2 TÊGEHÊ SÎMBOLÎZMÊ

Mijarên hêma û sîmbolan di edeb û fîkran da gelek kevin e. Belê wek rêbazeka edebî ya nû li dûmahiya sedsala *nozdeh* serhilda ye ku bi rêka amaje, hest û meremên helbetvanî dizanîn. Ev bizave di sala 1886an de li Frensa wek zaravekî edebî û helbest derket. Bo nimûne ew tiştên ku ziman neşetê derbirîne ji wî raman û hizirê rasterast biketin. Ji ber hindê sîmbolîzmê xal nînin ku lê birawestît, di naveroka fikra komelayetî da, ev rêbaze seretayeka bi bandor e di geşekirina modernîzmê di edeb û huner û aydîyan da.

Her weku aşkera ye bikarînana sîmbolan di nava tekstên edebî da karekî di nava xwe da faktor û çend hukar di duv da hene. Ku we diketin ku nivîser penayê bibete ber bikarînana sîmbolan. Derbarê giringiya sîmbolan da Graham Hu dibêjît: “Edeb amrazekî bi kar diînit ke xoyi le xoyda le encamî karêkî teşkîliye we dirust bûwe. Ku wate edeb şeweyekî remziye, be watayekî rasterast yan lawekî, çünke cure risteyek li wêne remziye hazirekanî be kar dênî ke zimanî pê delên” (Xuşnaw, 2010: 2).

Bi wateya derbirîneka ne aşkera ji aliyên hundirîn ku ziman neşetê rasterast bibînit yan naxwazît derbirîne bi aşkera jê biketin, bi şeweyekî nivîser bi rêya bikarînana sîmbolan digehîte wê derbirîn û encamê wî divêtin. Herwesa jî sîmbol ji naveroka hizirî û civakî vala nîne. Ev rêbaze xwedan bingehê bi bandor e, di edebiyata hizirî û edebî yê li paş xwe hêşitî têt dîtin (Berwarî, 2010: 177).

Gelek caran ziman di navbera nivîser û wergerî da neşet bibîte pira derbirînê, nivîser neçar dibin penayê bibin ber diruv û sîmbol û hêmayan. Lewra jî bikarînan wan dibîte egerê hindê ku ew harî zimanî ramanan dijenît. Mîna dema *Zerdeşt* gotî "hizireka çak, gotineka çak û kiryareka çak. Ziman wek jê neşet bihayê bûyerê bidetê, penayê dibete ber alavên dî yên têkstê. Di nivîsînên nû da çeveng wek tîkelî dihêne ziman, çûnke ziman wek sîstem, hemberî derbirînê, digihîşt (Osman, 2010: 54).

Sîmbolên wek biha dihêne guherîn, sîmbol bi xwe jî raman nadet, belku tîkhelên wan ramanan berhem dînin. Dirov bingehe gihiştîyê zanistê sîmbola û çawatiya bikarînan wan, wek name guherîn dadimezirînît, her îşaretek girêdayî sîmbol e û her sîmbola hewdanên (bagirawendên) civakî li pişt in. Ziman bi komê sîmbolan dihête nasîn. Tîkheliyên van sîmbolan goncîn dibîte sîstemê nivîsînê. Dema ziman dibîte ezimanê peywendî û derbirînan, hingî ziman jî biyavê tîkheliyê diçê keşê ramanê, wê demê hestên mirovî "bêhnkirin, dîtin û guhlêbûn"ê dibine ziman. Serbarî zimanê leşî û kevalê tîkstî, anku ziman û sîmbol ramanan bi rêka amaje yan deng/dengdêriyê digehînin û dirov bi rêka şeweyê deng û reng ramanan digehînin (Osman, 2010: 55).

Di ser dema raborî, sîmbol jî serdemekê bo ya dî û jî wergêrekî bo yê dî jî dihêne guherîn çûnke eger dûman li nik Hindiyên sor baştirîn amaje bît, li ba gelên dî, dûman amaja cenganê ye. Eger evro "Mar" wek ceveng çî ramanan bidet, belê wek dîroka *Mezopotamya* bo vedigerêt, "Mar" cevengê tenduristiyê ye (Osman, 2010: 55).

Li ser dîroka hebûna edebiyata sîmbolîk di cîhanê da boçûnên cuda hene, hind jî vekolêneran di ewê baweriyê da ne ku li welatê Hindî berî Grîkan ev cureyê edebiyatê hebûye. Lê gelek boçûnên dî diyar diken ku li pêşiyê li ba Feroniyên hebûye paşan gehiştîye Grîkan. Edebiyata sîmbolîk ne bi tenê di nava gelekî bi tenê hebûye belku li ser xaka gelek şaristanîyetên kevin hebûye. Lê li hindek cihan zû yan dereng yan zêde yan kêr. Ebdulla Îbin el-Muqafa "êkem kes bo di vî biwarî da ev cureyê edebiyatê jî Hinûda wergirtiye û xistiye di nava pertûkxana Erebî da. Lê rêbaza sîmbolîzm bi saxletên xwe yên taybet nehate naskirin ta ku destpêka salên heftêyan jî sedsala nozdehan ev aliyê edebiyatê li Frensa xuya bû. Herwesa wek aliyekî hunerê yê temam bi navê aliyê

sîmbolîzm xwe da naskirin û piştî hîngê li hemû ewropayê belav bû. Ji sedsala nozdehan ta ku destpêka sedsala bîstan vê rêbaza edebî xwe weke bihêztirîn rêbazên edebî li hemî ewropayê xwe da naskirin. Herwesa ew yasayên hatine danan bo vê rêbazê ji layî " Paul Verlaine , Charles Baudelaire û Stéphane Mallarmé " ve hatin danan, paşî hejmareka zor ya nivîskaran li derdora wan kom bûn (Berwarî, 2010: 177-178).

Bikarîna sîmbolan ji egerê hindê bûye da ku nivîskar pitir bişên derbirînê ji hundirê xwe biken ji ber ewê yekê sîmbol bikarînan berê xwe da vê rêbazê, wek rêkek bo wênekirina wan tiştan yên ku neşên derbirînê jê biken.

Herwesa dihête zanîn *Charles Baudelaire* yekem kes bû ku hebûna peywendiyên di navbera "deng, reng û bêhn"ê da destnîşan kir. Bi vê yekê helbestvanên vê rêbazê hemî li pey vê hizirê çûn sîmbol bo wan tiştan bikarin yên ew dixwazin û derbirînê ji wan hizir û mebestên di mêşkê wan da heyî biken. Piştî hîngê ji layê "Firlîn û Rambo" ve ev rêbaze hate paşdabirin, ta ku *Rakbo* helbestek bi navê tîpên dengî li ser hizira *Baudelaire* nivîsî (Berwarî, 2010: 179).

Sîmbolîzm: "Hemîşe le qelemirewî rexine heldê û lêhatuwane xoy le şrovekirin û wesfan derbaz dekat. Taqmêk tesewfî têda debînin, Taqmêkî îrfan rojhelat û rojava tiyada dedoziyêne we, jimareyekî dî berêgeiy rêgeyek dezanin bo îcadî zimanêkî taze le helbest. Hendêkî dî be hewlêkî dezanin bo wergirtineweiy ewzarî derbirîn le hunerekanî dîke. Çûn zorbeiy sîmbolastekan bewe denasêt detwanin hevirkî mosîqa biken" (Huseînî, 2006: 155).

Bi boçûna zimanvanan jî sîmbol cuda ye ji hêmayî li ser vê yekê "*Pol Rekor*" cudahiya hêma û sîmbolê di wê çendê da dibînît ku sîmbol hêmaşe, bellam hîma sîmbol niye. Hêma yek rehendî heye, ron û aşkera ye yek wata û yek amancî heye, belam sîmbol be pêçewaneyî hêma dû rehendî dû amancî heye. Le sîmbol dengekan dekrêne dal û medlulêkî tir û her em medlulî dûwem e debête sîmbol (Şêrzad, 2011: 84).

Bo nimûne formê "kesk" dû wata hene, ew jî kesk rengeke ji rengên di nava xwezayî da hene, ku eve hêmaye belê wataya diwê ya ew furm amajeyî pê didet, ew jî

"jiyan, nû wîbun, xweşî aramî, livîn.. htd" ku ew wateya dû wê ya evî formî heye dibîte sîmbole (Şêrzad, 2011: 84-85).

Sîmbol êk ji giringtirîn rêkan e di pêkînanana wîne helbestê da, taybetî di çerxê nû da, taybetmendî wergirtina şeweyên nû diderbirînê û bikarînanana wateyî û afrîner. Ku derbirînê ji atmosfera ruhî biket, bo nimûne rojavabûn bi wateya mirina rojê ye û hest û diltengî kirin. Herweha sîmbol hewil didet saxletên dûr û nêzîkî hev biket wekî gerdena bi heiv, ronahiya bigirîn roja tehl. Helbesta sîmbol giringiyê bi wan wêneyan didet yên ku xeyal bi xwe ra diînît herwesa muzîka zîndî ya dangan didet. Helbest veguhastina rewşa hundirîn ya helbestvanî ye, bo guhdarî yan xwîndewarî bi şeweyekî hukarî. Têkelbûna rêbaza sîmbol digel hizirên felsefî û giringî dan bi xeyala. Herwesa nezelaî û hevdijî û dûriyatî di navbera hemû tiştan da da ku sîmbol ji eqlê mirovan derdikevin ber bi ne zelaliyê ve bi sedema hevdijîya xwezayî (Berwarî, 2010: 181).

Sîmbolîzm bayexê bi wêneyê helbestê û rîtm helbestê didetin. Bi baweriya sîmbolastan wêne û rîtm du keresteyên zor giring in bo bikarînanana sîmbolan bi rêka wan dişên haletên agehî û ne agehî bi hindek tem û mejî bikene di nava helbestê da. Bi rêya rîtm û muzîka helbestî jî diket û bi asanî derbirînê ji nax û derûn û hezên veşartî biketin (Eswed, 2015: 300).

Herwesa îstatîka helbestê ser pişka hemî regezên dîtir e ciwanî dûmahîk armanca helbestê ye, êkemîn rêka gehîştinê ye bo ciwaniyê, birîti ye ji xeyal û îha û xewn wate sîmbol û sîmbolîzm. Herwesa tem û mejî êk ji regezên serekî yên sîmbolîzmê ye çunke tem û mejî ciwanî û aydiya û xewnê bi helbestê dibexşîtin. Herwesa têkdana rêsa û yasayên zimanî ye çunke ev çende alîkarî bigehandina armancên wan. Ji ber hindê bangeşî bo zimanekî nû bo helbestê dikir (Eswed, 2015: 301).

Bi kurtî di şîyan da ye bibêjîn rêbaza sîmbolîk rêbazeka edebî û felsefî rojavayê ye, bi rêka hêma û sîmbolan, yan di îşaretpêdanê da, derbirînê ji hizirên xwe yên felsefî û edebî diken.

1.3 SÎMBOLÎZM Û WATEYA NAVÊN RENGAN

1.3.1 Rengê Sor

Rengê sor li pileya yekê dihêtin. Ev rengê ji xwezayê hatiye wergirtin û ji rengê serekî û rengên germ e, ji ber ku ji tîrojên rojê hatiye wergirtin. Ji ronahî û agir û germatiyê hatiye û şîyanên hêz û hestên azrandinê li ba mirovî peyda diket. Ji ber girêdana evî rengî bi rengê xwînê ve lewra gelek caran bûye sîmbol ji bo şer, hevrikî, şoreş, eşqê û gelek tiştên dî (El-Yaqût, 2018: 30).

Herwesa ji ber girêdana rengê sor bi xwînê ve peywendî bi du tiştên dijber ve heye ew jî jîyan û mirin. Ji ber ku ji destdana xwînê di leşê mirovî da dibîte egerê mirinê, herwesa jî hebûna xwînê di laşê mirovî de û hatin û çûna wê di demarên laşî da dibîte egerê parastina jiyana mirovî. Ji ber hindê jî dikevîne şopan da li ba hindek miletan dema zarok ji dayik dibûn ser û çavên wan bi xwînê reng dikirin yan jî di xwînê di helandin da temen dirêj bîn (El -Qeran, 1984: 124).

Dîsan jî ramana rengê sor ji kesekî bo kesekî dî û civakekî bo civakê dîtir cuda ye û cêgir nîne, di gelek ayinên rojavayî da sîmbola qurbanîdanê ye di rêka baweriyên da. Lewra di bawerîya gelek ayinan da rengê sor sîmbolên nerênî wergirtîne wek kir ye sîmbola cehnemê ji ber girêdana wê bi rengê agirî ve ku rengê agirî sor e, lewra ji xwe ra sor kiriye rengê cehnemê. (El -Qeran, 1984: 124-128). Dîsan rengê sor dibîte amaje ku mirov yê hişyar bît ji metirsiyê. Ji ber hindê gilopa sor ya tirafîkê dema sor dibît nabît mirov derbasî aliyê dî bîtin ji ber ku metirsî li ser mirovî heye, divêt mirov rawestît û derbas nebîtin. Herwesa di kevneşopan da tê gotin dema tişteke mirovî gelek hêrs ture û biketin mirov dibîjît "ew kes ji bo min destmaleka sor e". Ku wate ev gotin ji patê Gayê sorê Îspanî hatiye, ku di kevin da li welatê Îspaniya li meydana yariya bi gayê diken destmaleka sor lê dihejand dema Ga wê rengê sor dibîne hêrs û ture dibe û hêrs dikete wî mirovî yê destmala sor di destê wî da. Ev yariyeyeke ji yarên geleriye welatê Îspaniya” (Balayî, 2008: 70).

Dîsan sor sîmbola rengê gencatî û geşbînî ye, ji ber hindê jî gelek helbestvanan di helbestên xwe da ev renga bi kar îname. Ji layekê dî ve rengê sor li ba civakên rojavaîy da sîmbola hêz, kar, metirsî, hêrs û evîniyê ye. Di civakên rojhelatî da sîmbole ji bo şenisê baş, keyfxweşî, taybet dema digel rengê spî tîkel dibît. Sererayî wateyên arêni gelek caran jî rengê sor wateyên negatîv bi xwe ve helgirtîne, mîna bê ewlehiyê û bêşansiyê dihêtin (Fethî, 2019).

Ji layekê dî ve sîmbola ciwanî, şermînî, li dema kesek şerm diketin dibîte egerê sorbûna rûyê wan ew jî ji egerê bilindbûna fişara xwînê ye li ba wî mirovî yan jî li dema hestkirin bi stres û nerehetiyê. Taybet li ba jinan dema rûyê wan sor dibin ku ev sîfete li ba gelek zilaman sîfeteke ji sîfetên ciwanên jinê ye ji bilî sîfeteke ciwaniyê jî sorbûna rûyê jinê sîmbola şerm û rewşitî wê ye baş e. Herwesa li ber kirina cilên rengê sor nîşana nazikî û nazdarî, lê rengê sor dikevîne şopan behra hemî jinan ne bû tenê ewên nazdar xwedan mal û dewlemendan bûn, da ku bihêne cudakirin ji gişt jinên ewî civakî ji ber hindê jî dihatine navkirin bi jinên xwedan ala sor yan cil şûran (Hemdan, 2008: 42-43).

Ji ber ku rengê sor sîmbola qurbanîdanê ye, rûsan wek sîmbol bo xwe ev renga helbijart di şoreşa xwe ya dijî qeyserî da û serkeftina li ser qeyserî di sala 1917an de, ji ber hindê jî rengê sor sîmbola komûnîzmê ye.

1.3.2 Rengê Zer

Êk ji rengên germ e ku hestê germ li ba mirovî peyda diketin. Nînertiya ronahiyê û birîsqedariyê diketin. Çûnke rengê rojê ye û çavkaniya ronahiyê ye û giringiya xwe heye ji layê germê û ronahiyê ve. Herwesa zer sîmbola xweşîya jiyanê û ektêvbûn û azirandina hestan e, dibîte egerê peydabûna xweşiyê û dîlfirehiyê (Şukrî, 1985: 6).

Herwesa ji layê ayînî ve giringî û pîrozî pê hatiye dan, çûnke li ba Misriyên kevin sîmbola xwedawend "Re"ye ku ew xwedawendê rojê bû li ba Misriyan. Herwesa li ba Îslamê pîroz e çûnke di Qurana pîroz da di sûreta "Beqere: 69" hatiye (Muxtar, 1982: 163).

Ku di vê ayetê da dema *Mûsa* ji netewa xwe dipirsîtîn çêlekî ser jê biken, ew bersivê diden çî reng e. *Mûsa* diyar diket ku xweda dibêjît "çêleka reng zer e yê berê xwe bidetê ji dîtina wê têr nabîtin" (Doskî, 2004: 10).

Ji hindêk riwange û aliyên dî ve hindêk watayên dî bi xwe ve girtîne. Gelek caran jî bo çareserkirina nexweşîyan bi kar hatiye, ji ber ku peywendî ya bi rojê ve heyî li gor baweriya hindêk gelan roj jiyana mirovî diparêzîtin, lewra di gelek şaristanîyetan da bi kar hatiye ji bo çareserkirinê. Gelek caran zerê ser bi kesekî ve bûye sîmbola tirs, xiyamet û xedrê. Yan jî delalet ji mirin û nîşanên nexweşîyan bûye ev sîmbole jî ji xwezayê zerê payîzê hatiye wergirtin çünke dûmahîka zerbûn û helweryana belgane, rengê keskê daru barî di werizê payîzê da rengê zer digirît ku xweza wek rengê biyabanê zer dibît (El-Yaqût, 2018: 29). Dibît ji ber wê yekê rengê zer sîmbola nexweşî û mirinê û nêzîkbûn ji ecêlî danaye, ji ber hindê jî gelek caran ev renge bûye cihê dilgiraniyê ji layê derûnî ve.

Dîsan jî nexweşiyek heye li dema toşbûnê rengê mirovî zer dibîtin ji ber rengê zer navê wê nexweşiyê kiriye "zerik". Dîsan rengê zer bi sîmbola mirinê ye, ji ber hindê jî gelek caran ev renge bûye cihê nexweşiyê ji layê derûnî ve.

1.3.3 Rengê Şîn

Rengê şîn gelek raman û sîmbolan bi xwe ve digirîtin. Ev çende jî li gor tariyatî û vebûna pilaya evî rengî ye, ji ber ku şînê tarî nêzîkî rengê reş e ku bandora xwe heye rengê neviyan, êk û du qebûlnekirinê û diltariyê ye digel yek. Gelek caran wek sîmbol ji xulan "Munister" hatiye di efsaneyên kevin da ku hêza xirabiyê li ser erdî bi kar tînin. Lê rengê şînê vebûyî taybetmendî û giringiya xwe hebûye di kevneşopan da û ta serdema nû jî giringiya wê maye, ji ber ku rengê derya û esmanî ye ku bandoreka rasterast li derûnê mirovî diketin taybet li dema rengê esmanîyê zelal bîtin (Abad, Belawî, 2012: 28). Dîsan rengê şînê vebûyî sîmbola bawerî, bêgunehî, gencatiyê ye, belê yê tarî rengê xavî û bêxîretiyê ye (Ebdulfettah, 2012: 261).

Gelek caran rengê şîn bi demê ve hatiye girêdan û bo dîratiyê û amadenebûn û xerîbiyê ye ji ber girêdana rengê şîn bi wesfa esmanî dûr ve. Ji ber ku rengê şîn sîmbola

esmanî ye ku rengê esmanî alîkar e ji bo bêhnfirehî û arambûna derûnê mirovî ye (Rondon: 1984: 105). Dîsan ji layê derûnê jî ve dibête egerê nûbûn û rîfrîşkirinê, herwesa rengê şîn dişîtin cîhaneka hestan ya xeyalî li ba mirovî peyda biketin, ku mirov tê da hest bi teziyatî xweşbûna keş û hewayekê hîn û tezî biketin.

Herwesa di çanda gelek gelan da sîmbola dilsoziyê wefadariyê ye ji bo desthelat û paşayên welatên xwe (Muxtar, 1997: 183).

Dîsan li ba gelê *Çîniyan* sîmbola mirinê ye û li ba *Îbriyan* jî rengê xweda ye, ji ber hindê li ba *Cihuyan* ev renga pîroziya xwe heye (Muxtar, 1982: 164-166). Herwesa li ba *Ereban* jî rengê şîn regekî nexweş nayê hezkirin, ta vê serdemê kerb ji evî rengî vedibin taybet di rengê çavan da, çünke rengê çavên dijminên wan yê *Romanî* şîn bûn (El-Yaqût, 2018: 29). Lewra Ereban digote dijminên xwe "dijminên şîn ên dilreq" dibête herwesa li ba helbestvanên Ereban jî sîmbolên nebaş wergirtine (Hemdan, 2008: 51).

Dîsan rengê şîn girêdayî ye bi nexweşî û mirinê ve, li dema pestana xwînê kêr dibête û di xwîn di demaran da kêr dihat û diçûtin rengê demarên leşî şîn dibêtin, yan jî yek ji nîşaneyên nexweşîya "bêhintengî" ê ku kesên ev nexweşîye lê rengê wan pitirîya caran yê şîn e yan jî li dema kesek dimirîtin rengê wî ber bi şînê vebûyî ve diçûtin.

Gelek caran di kevin da çaresekirina nexweşîyan bi rengî kiriye bo nimûne ev kesên nexweşîya "zerk" dihatê kirasekî zer li ber fikir da çareser bibête ji evê nexweşîya xwe. Dîsan jî di kulturê milî gelek caran morkeka rengê şîn bi kar tîna ji bo parastina mirovan ji çavên pîs û bexîlan (Abad, Belawî, 2012: 28).

1.3.4 Rengê Kesk

Rengê kesk ji hemî rengan berbelavtir e, çünke piraniya xwezaya derdora me rengê wê kesk e. Keskatiya avî xwezayê dibête cihê arambûna derûnê û mêşkî. Zorbeya caran jî rengê keskê vebûyî pitir tê qebûlîkirin ji rengê keskê tarî çünke rengê keskê vebûyî pitir bêhnfirehiyê li ba mirovî peyda diketin (Derbere, 1954: 25).

Ji ber ku ev renga pitir girêdayî dar û barî û berhemdariya wî ye, lewra ev renga sîmbola berdewamiya jiyanê ye. Ji ber ku peywendiya wî bi her tiştekî zindî ve heye. Herwesa girêdana wê bi efsaneya keskayeti yê "Gilgamêş" û geran li pey nemiriyê, vexwarina ava nemiriyê bi merema man di jiyanê da heta hetayê. Ji ber ku rengê dar û barekê kesk e lewma kesk sîmbol e ji bo nemiriyê û jiyanê. Ev renga sîmbol e ji bo jiyanê, geşbîniyê, hêvî, ciwaniyê, merdatiyê, nûkirina ruhê ye, rengê bihar û gencatiyê ye, rengê tenahiyê ye û pêşdaçûnê ye, aşitî û aramiya derûnî ye, rengê her tiştekî zindî ye ('Ecîne, 1984: 291).

Ji ber ku rengê kesk rengê arambûna derûnî ye ji ber hindê bo çavan yê xweş e û ji layê çavan ve dihête hezkirin û mêşkê mirovî pê aram dibîtin, lewra dibît gelek caran di dema bêhtengiyê û hêrsê da mirov biçît li nav dar û bar yan baxçeyekî birînte xar da ku derûnê mirovî aram dibîtin. Ji ber hindê jî cil û bergên nojdaran kesk in da ku nexweş ji layê derûnî ve hest bi hêminî û arambûna derûnî biketîn.

Dîsan rengê kesk ji aliyê ayînî ve giringî û pîroziya xwe heye, gelek caran di rê û resmên xwe yên ayînî da evî rengî bi kar tînin. Ji ber ku sîmbola tobekirinê û bixwedaçûnê ye û rihetiya derûnê mirovên îmandar e. Dîsan di ayinê îslamê da rengkirina mizgeftan bi rengê kesk vedigerîte bo wê yekê ku rengê buhişt û dar û barê buhişt û firdewsê ye. Dîsan jî di Qurana pîroz da hatiye ku rengê cilên buhiştîyan e. Ev çende bûye cihê taybetîbûn û giringiya rengê kesk li ba ayina îslamê (El-Yaqût, 2018: 26-27).

Ji aliyê zanistî ve jî ji encamê hindek vekayinan da diyar bûye ku rengê kesk alîkar e ji bo baştir xwendinê û aktîvbûna mêşkî, lewra hindek caran xwendekar rûpeleka tenik a roniya rengê kesk didanina ser wî tiştê wan divît bixwînin ji bo wê yekê ku rengê kesk alîkar e bo pitir têgihiştin û xwendinê (Şe'ban, 2017: 58).

Gelek caran jî sîmbolên ciyawaz bi xwe ve girtine taybet li ba "Zanayên Wîzeyê" ku rengê kesek kiriye sîmbola herjîkirinê, eve jî boçûneka cuda û ciyawaz û hevdij e digel boçûnên zorbe ya xelkî derheqê rengê sor de ji ber ku rengê sor rengê hestan û hejêkirinê ye (Xanikî, 2008: 27).

Di serdemên nû da jî rengê kesk bûye sîmbola artîşan û cil û berg tirumbêl hemî kerestên xwe yê artîşî bi rengê kesk boyax diken (Şe'ban, 2017: 65) ku ji serdemekî bo serdemekî û ji miletekî bo miletekî, ji zanistekî bo zanistekî sîmbol û wateya rengê kesk ji yek cuda ye.

1.3.5 Rengê Spî

Rengê spî ji rengên sare lewra hestê aramiyê li ba mirovî peyda diketin. Rengê spî hemî rengan kom diket, mirov di karîrê vê rastiye di bazneya renganda bibînît ku bi lez hêza ronahiyê zêde dibît, em bazneya rengên di ropelekê rengên da dibînîn. Ev renga piraniya caran di bîrê sîmbol ji bû serkeftin û paqijî û aşitiyê. Li ba Yonanî yan wateya keyf xweşiyê didet. Ji ber ku rengê spî girêdayî ye bi ronahiyê ve bûye sîmbol ji bo hêza xweday ya kontrolkirî li ser her tiştekî (Ebdulwehab, 1985: 85).

Rengê spî dihête hejmartin ji rengên aram û herwesa hestê tenahiyê li ba mirovî peyda diketin ji ber hindê jî gelek caran mirov melên xwe bi rengê spî rang diketin daku hest bi aramî û bihn firheyî biketin, ji ber hindê rengê spî digel rengên cuda têkel diken ji bo goncandin û kêmkirina hêz û pileya wî rengî (Tesnîm, 2019).

Ev renga sîmbola paqijî, serkeftin, bê gonehiyê ye. Herwesa spî sîmbola hîviyî û geşbîniyê, zelalî, lêburîn û dilsaxiyê ye. Sîmbola viyan û êk dû qobîlîkirinê ye sîmbola radestkirin û jiyanê ye. Raste gelek caran delaletê puzetêf bi xwe ve digirît, lê di heman wext da hindê wateyên nîgetîv jî hene bo nimûne rengê spî bi wateya nizîk bûn ji mirinê ye, ji ber hindê jî li gelek welatan rengê spî sîmbola mirinê ye (Beyheqî, 1386: 13).

Di çanda gelanda rengê spî çend sîmbolên xwe hene. Ku renga spî sîmbola nûkirin û jibîrkirina arîşe û demên bûrî ye, bû nimûne gelek caran dibêjin da em ropelekê spî veken ku sîmbola nûyatiyê ye.

Dîsan li rojava yê Efrîqiya dema zalamên wan ji bo şeran derdiketin, jinên wan laşê xwe bi boyaxa spî reng dikir û radibûn bi hindê livînê û resmên cadugerî û ciyawaz (El-Sewah, 1993: 206). Herwesa li welatê "Meksîkê" jî jinên wan di rê û resmê cejna

"Heyivê" da laşên xwe bi boyaxa spî reng dikirin da ku şeweyê wan wek şebehan "Ghost" lê bihên ji bo encamdana rê û resmên xwe yên ayînê (Ebu Yehya, 1997: 181).

Herwesa ew zelumên desthelat dikirin yek ji mercan diviya rengê pîstê wan yê spî ba, ji ber hindê jî ta serdemên nû kesên pîstê wan spî neba ne dişiyan desthelatê werbigirin, çunke yek ji sîfetên ciwaniyê ye bo mirovan (Hemdan, 2008: 39).

Sîmbol û ramanên rengan li gor dem û cihê dihête guherîn, ramanên erênî û nerênî bixwe ve digirin lê li pitirîya kevine şopan da rengê spî berinyase bi rengê ciwanî û berdewam bûna jiyanê ye. Bi bûcûna min rengê spî rengê paqijî û tendirustiyê ye, dibîr ji ber hindê jî rengê spî li nexweşxana û cihê tendirustî bi kar dînin.

1.3.6 Rengê Reş

Rengê reş hemî ronahiyê dimêjîr lewra rengê hêzê û berzebûna ronahiyê ye. Rengê reş sîmbola ji bo bîrs, xem, bê hêviyê û mangirtinê ye. Sîmbola ne amadebûna nûyatiyê ye, sîmbola desthelatê ye, maldariyê, ne eşkerayê, şer, xezebê, mirinê ye. Di civakên rojavayî da nîşana tirs, yaxîbûn, sêks, berelay, herwesa li *Misra Kevin* sîmbola rewşengîrê bûye (Telal, 2018).

Herwesa hindê bi rengê lasaykirinê dizanin, ew kesên hez ji vî rengê diken digirtinê beramberî jiyan paşeroja xwe direşbînin lewra jî sîmbola bêdengiyê û tariyatiyê ye. Lewra jî ew kes bi kar tînin ew ên di cîhaneka tarî da dijîn da ku kes bi sanehî kesayetiya wan aşkera neketin, dibîr ev çende jî bi vegerîte ji bo reşatiya şevê ku şev bêdengî ye û penageha aram û nepenîyan e lewra jî kesên heza rengê reş heyî hez ji şevê diken. Bazirgan siyasî û mafîya vî rengê di cilên xwe da bi kar dînin ji ber ku cîhana wan kesan ya taybet e û nepenî e. Herwesa zelumên ayînê û dibilomasî di cilên xwe da bi kar dînin. Dîsan ew kesên hez ji vî rengê diken nakevîne xeletiyên viyanê çunke sînoran di navbera xwe û kesên derdora xwe didanin ji ber hindî çî hez diken ji jiyaneka taybet bixwe ve hebîtin. Dibîr ev renga bêhnfireheyî bîr li ba wan kesan xalên lawaziya hene ku bi rengê reş dihên veşartin. Gelek caran dibêjin rengê reş wek fêlekê dihête bikarînan di cil û bergan da ji bo ciwankirina bejn û bala mirovî, bi taybetî li ba jinê (Telal, 2019).

Dibît li ba gelek kesan rengê reş, rengê dijî ciwaniyê ye û rengê xemgînê û reşbîniyê ye. Gelek caran jî sîmbola nemanî ye, tirs ji tiştê ne diyar. Rengê reş li dûv dem û cihan wataya wê hatiye guherîn bo nimûne di kevneşopan da rengêkî nebaş bûye ji ber ku rengê *Benda* yan rengê reş bûye.

1.4 SÎMBOLÎZMA RENGAN DI BAWERIYA AYINAN DA

Ayinan peywendiyeka cuda û taybet bi rengan ve heye. Di nav têkst û rê û resmên wan a rengveda ye, her ayinekî bi rengêkî yan çend rengên taybetmendî ji xwe ra çêkiriye. Bêguman hindek ayinan li gor atmosfîra û serbora xwe taybetmendiyeke ruhanî standiye, li cem bûye sîmbolên pîroziyan başî û xirabiyê, xweşî û nexweşiyê, gunehê yan bêgunehiyê. Dîsan rengan di nav pirtûk û têkstên pîroz û dab û nerîtên tev ayinan da cihê xwe girtiye û her êk jî bi hindek sîmbol û felsefeyan berê xwe didene her rengêkî.

Ayinan bihayekê baş daye rengan û her rengê helgira watayek û sîmbolan destnîşan kiriye. Reng jî li gor her ayinekî bi hemî şêweyan bûne sîmbolên başî û xirabiyê. Her rengê li gor bîr û bawerî û taybetmendiya xwe her rengê kiriye sîmbol ji bo hindek tişt û pîroziyan. Dibît gelek ji wan raman û sîmbolan jî girêdayî xweza û atmosfîra ewî ayînî bin. Li gor dem û cihan bi nerînên rêjeiy ev raman û sîmbole dihêne guherîn li ba her ayinekî û civakekî, ku pitirîya wan sîmbolan ji çavkaniyên ayînî û saykolojî û civakî wergrîtin e.

Dema li dest pêka jiyanê mirovên kevin wêne li ser dîwarên şkeftan dirûst kirîn. peywendiyeka bihêz di navbera bawerîyan û huner û wêneyan da heb û, heta ku yek bû yekî hatiye û reng bûye alavekê sîmbolîk ji bo têgehiştin û bawerîyan. Dema reng bi şêweyekî piraktîkî tê bikarînan saluxetê ronahî û helatinê didet. Ku bê ronahî jî diyardeya rengî nabît. Ji ber ku ronahiya esmanî ji rojê tê pîroze ji layê bawerîyan û ayinan da pîroz e û giringî pê tî dan (Balayî, 2008: 83).

1.4.1 Reng di Ayinê Îslamê da

Li gor baweriya ayinê îslamê reng ji bo sîmbol û destnîşankirin û derbirîn û hestên ciwaniyê bi kar hatiye. Di baweriya îslamê da reng girêdayî du jêderên serekî ye:

Jêderê yekem: Ew ronahiya ji esmanî ku nêzîkî xweda ye dibêjin ronahiya xweda ye "Nûrullah".

Jêderê duyemîn: Ronahiya dilan e. Ronahiyê didete hundirê mirovî derûnê tarî, ji ber vê jî ronahî dibîte nîşana bawerî û çakiyê. Rengê spî xwe di vê ronahiyê da dibînît. Rengê reş wek rengê tariyê û nexweşî û xemê tê bikarînan. Herweha tiştê dî yê peywendîdar bi rengan da heye çav e. Elavê ronahiyê çav rengî destnîşan diketin herwesa xwedê ew çave pêşkêşî mirovî kirî da hest bi wê xweşî û ciwanî û biken. Gelek caran jî ronahiyê bi çav nav diken. Reng û ciwanî nêzîkî ronahiyê dibin paşan diçine di nava pêzanînên rastiya xwedayî da (Balayî, 2008: 83-84).

Eve jî wê çendê diyar diket ku cudahiya rengan di xwezayê mirovan da ne tiştêkî demildest her wakî di Qurana pîroz da hatî: Di sureta "Fatir: 27" de. Di evê ayeta Qurana pîroz da Xwedê weha kerem diketin: Erê ma te nedîtiye Xwedê avek ji esmanî îlaye xwarê, hindek dar û bar li erdî me pê avdan û me ji wan dar û baran berên rengîn dan. Hindek ji wî beriyê sor e, hindek yê reş e, hindek yê zer e û gelek rengên dî? Ji çiyayan me rêkên sor û rengên cuda cuda dirust kirin û me ji çiyayan hind çiyayên gelek reş çêkirin (Dorskî, 2004: 437).

Dema em li Qurana pîroz binêrîn, reng di çend ayetan da bi kar hatiye bo nimûne; navê reng û peywendiyên wê neh caran di heft ayetên pîroz da hatiye. Herwesa rengê kesk, zer, spî, şîn, reş û sor bi nav kirine. Rengê reş di çar ayetan da hatiye, ku sîmbola gunehbariyê û kafirî û minafiqiyê ye lê car (El-Henbelî, 2019).

Rengê Spî: Di neh ayetan da dubare bûye. Ku sîmbola bawerî, pakî, viyan, dilsaxî, xêr, heqî û hestên mirovatiyê ye. Ji ber ku dibêjin alayê xwedayî spî ye lewra jî bo kefenê

miriyan rengê spî bi kar tê û cilên heciyan dema diçine pêroziya berê reş rengê spî li xwe diken (El-Henbelî, 2006).

Rengê Şîn: Carekê hatiye û ew jî sîmbola asmanî ye û pêçewaniya wê di av û deryayê da. Di sureta (Tahe, 102) de. Di vê ayetê da xwedê mezin diyar diket ku, roja qiyametê dema ferîşte pif diken û em kafra di hajûin rengê wan yê şîn e (Doskî, 2004: 319). Li gor baweriya îslamê rengê şîn sîmbol e ji bo xirabî û mirovên xirab û gunehkar.

Rengê sor û rengê zer : Rengê sor jî carekê bi kar hatiye ji bo wesifkirina çiyayan rengê zer jî sê caran bi kar hatiye ku sîmbola qonaxa gehîştina fêkiyê carekê û roja qiyametê û bay û derbirînê ji xweşiyê diketin. Her xweda di fermuît. Rengê zer di Qurana pêroz da di sureta “Beqere: 69” de hatiye (Muxtar, 1982: 163). "Ku di vê ayetê da dema Mosa ji netewa xwe dipirsîtin çêlekî serjêbiken, ew bersivê diden çî reng e. Mosa diyar diket ku xweda dibêjît "çêleka reng zer e yê berê xwe bidetê ji dîtina wê têr nabîtin "(Doskî, 2004: 10). Xwedê weha kerem diketin.

Rengê Kesk: Di heşt ayetan da dubare bûye ku sîmbola nepeniyên ruhê didete nêrîn û ciwanî, giya û berhem, belatînik, cil û nav malî. Ji hemiyan pitir rengî xweşiyê ye. Di Qurana pêroz da hatiye di sureta “Hec: 63” de "Ma hîn nabînin ku xwedayî ji esmanî ava baranê înayê xwar, ku bi rêka wê avê erd pê kesk dibîtin û şînikatî jê piyda dibîtin" (Elî, 2011: 249).

Dîsan di sureta “Kehf: 31” de xweda herwesa difermût: Cilkên kesk li ber xwe diken ew cile nazk û tenik in ku ji armîşî hatîne dirûstkirin (Pirîsî, 2012: 395). Dîsan jî rengê kesk li ba îslamê sîmbola beheştê ye her di Qurana pêroz da hatî.

1.4.2 Reng di Ayinê Mesîhyetê da

Di baweriya ayinê kirîstiyana hunermend wesf diken bi melean ku mizgîniya Ezirayê ji dayikbûna Mesîhî bi rengê sor bo herwesa rengê xwîna Mesîhî ye. Ji ber wî rengê ebayên qeşa rengê şehadetê ye di rêya ayînê da. Eve jî bo me wê çendê diyar diketin

ku her ayinek û civakek boçûneka cuda heye di remz û sîmbolîzma rengan da her yek li gor kevneşopên dîrokî şirove diket (Balayî, 2008: 66).

Rengê Sor: Di *Încîlê* da sîmbola xwîna *Mesîhî* ye. Ku ev pêxembere bi xaçê ve hatiye helwasîtin, xwîna wî ji bona mirovayetiye hatiye rêtin dema em wî li bîr tînin, dilsoziya wî tê bîra me lewma divê her tim dilê meda bîtin. Ji ber wê jî dê me wisa hijmêrît ku em ji nû ve ji dayik bûne (Balayî, 2008: 90).

Rengê Zer: Rengekî pîroz e ne bi tenê li ba *Çînî* û *Hindiyan* herwesa li ba *Mesîhiyeta* ewropîyan jî pîroz û giring e. Ku kenîseyê giringî bi rengê zer daye û di tabloyên pîroz da bi kar îname, wek bagirewend bi kar îname ji belgîn darên rengê zer çunke rengê rojê ye (El-Yaqût, 2018: 163). Di berdewamiya jiyanê di navbera xwedayî û mirovî sozek heye, ji ber wê yekê jî ew soze mîna zêrî ye ji ber hindê ev renga li ba kirîstîyanan pîroz e.

Rengê Spî: Di *Încîlê* da sîmbola rengê paqijî û tafilkirinê ye. Lewma dema xwedê li me dinêrît li dilê me yê spî dinêrît, ne li xerabiyên me yên reş dinêrît. Bi vê yekê xweya dibît ku rengê reş sîmbola xirabî ye.

1.4.3 Reng di Ayinê Êzidiyan da

Ayinê Êzidiyan û rengan peywendiyeka bihêz bi hev re heye. Her ayinekî sîmbol û felsefeyên xwe yên taybet derheqê her renekî da hene, ji ber hindê jî rengan di ayinê Êzidiyan û civaka çendîn biwarên dî de cihê xwe girtiye.

Rengên rasterast yên gelek bi kar dihên di ayinê Êzidiyan de jî ev in: Spî, sor, reş, kesk zer, kîm, şîn. Wek tev ayinan ayinê êzidiyan ji encamê serbûr û jîngeha xwe taybetmendiya ayina xwe hindek reng li dev wan hezkirî ne hindek ji wan ne hezkirî ne. Ji wan rengên êzidî hejê diken û gelek giringiyê pê diden rengê spî ye bo nimûne. Dîsan jî êzidî hej rengê şîn nake, ji ber ku evî rengî bi rengê bextreşiyê dizanin. Lewma jî zû bi zû wan cilên rengê wan şîn bi kar naynin (Xanikî, 2011: 20).

Li ser vê yekê nivîskarê Kurd "Hisên Sîto" di pertûka xwe ya bi navê (Dîrase tarîxiye fî el- Diyane el- Yezîdiye) da dibêjît "di fermanên bi serê Êzidiyan hatîn ji qirkirin û kuştin wan. Ew dijminên hêrşkerên bi wan feremana rabuîn alayê wan rengê şîn bû. Li bin wî alayê hildayî fermana wan rakir. Ji wê rojê û şûnda ev reng li ba Êzidiyan qedexe ye (Balayî, 2008: 91). Lewra dibît ji ber hindê jî ne Êzidî cilên şîn li ber xwe diken ne jî navmilên xwe şîn diken û dixemilînin.

Herwesa di wê pertûkê da behs kiriye ku yek ji şêxên Êzidiyan ku ne dixwast navê xwe bêjît got "qedexekirina rengê şîn li ba Êzidiyan. Vedigerîte ve *Şêxadî* yê yekê, dema çûye esmanî li ber çavên wan wenda bû û xweya nedikir bi tenê esmanê şîn. Wan hizir dikir *Şêxadî* kincên şîn li xwe kirine. Ji wê demê û şûn da Êzidî rengê şîn li xwe nakin ji ber rêzgirtin û rûmetiya *Şêxadî*" (Balayî, 2008: 91). Ji ber ku gelek caran rêzê li cihên xwe yên ayîn digirin û bi cilên rengê şîn serdena cihên xwe yên pîroz nakek wek perestgeha pîroza *Laleş*.

Dîsan gelek Êzidî di êk dem da hez li rengê diken ku li ba wan xweş û nexweş wek rengê reş. Hez jê diken ji ber navê "*Mishefa Reş* " û "*Xerqe*" cilkekê pîroz e ku çend *Xas* û *Babiçakan* Êzidiyan kiriye ber xwe di tekstên ayînê jî da sîmbola mihebet û dilovaniya xwedê ye.

Rengvedana rengan di nav da ku wek nasnav yan bi çendî navên *Xas* û *Babiçakan* Êzidiyan ve hatibe bikarînan. Bi karînanana van rengan her yek raman û wateyên xwe yên taybet hene ji wan *Xasan* jî reng çûye di gel navên wan a ku bi şêweyekî rasterast yan siruştî bi kar hatiye.

Bi şêweyekî rasterast: Evdê reş, Pîr reşê heyran, Mam reşê şêxê zerî, Êzîdê sor, , Şêx reş. Bi şêweyekî nerasterast: Şêx Babayê Kezî, Gulî zêr wata rengê zer, Şêşmis "ku xwedawendê rojê" ye ku bi ramana rengê zer yan sor yan pirteqalî, yan jî bi şêweyekî siruştî bi kar hatiye, ku wek nav bû mirovên normal û ne ayînê jî wan mî reşû, sorû, şînû, reşê spî av gewrê ku bû her du regezan bi kar îname (Xanikî, 2011: 30-31).

1.4.4 Reng li ba Zerdeştîyan

Agir û roj di serdemên kevin da ji layî gelên hind û ewropî ve hatine perestin. Li gor baweriyên wan agir û ronahî fakterên serekî yê ciwanî û sudmendiye bû, hevalekî dilsoz bû di tarîti û serma û nexweşîyan da, ji ber hindê jî çî neteweyan wek netewê Îranî perestina agir î û ronahiyê nekiriye.

Lewra jî di baweriya Zerdeştîyan da agir jêderê ronahiya xwedê ye, ew pira peywendîya di nav bera xwedê û zîndeweran da ye. Ronahî sîmbola nûra Yezdanî ye û tarîti sîmbola Ehrîmenî ye. Ji ber vê çendê ronahî û tariyê bandora xwe li ser huner û edebiyata Farsî kiriye û rengveda ye. Ev çende jî vedigerîteve bo vê xala felsefiya ayînê Zerdeştîyan wek ceng û hevrikiya ciwanî û kirêti, ronahî û tariyê. Ji ber hindê jî rengê zer li ba wan pîroz e sîmbola ji bo ciwanî û pîroziyê. Evê çende heta piştî hatina Îslamê jî rengvedana xwe hebûye di nav têkstên edebî yên Îranê da (Rehmî, 2010: 92).

Ayînê Zerdeştî bi navê pêxemberê vê ayînî hatiye binavkirin "Zerdeşt 621-551" berî zayînê bûye li Urmî û Azerbêcana Îranê ji dayik bûye navê babê wî "Buruzihaz" bûye. Navê pertûka wî ya ayînî Avêsta ye. Reng li ba zerdeştîyan pîroziya xwe hebûye taybet rengê zer ew jî vedigerîte ve bo sîmbolên vî ayînî ew jî di baweriya wenda agir û ronahiya rojê sîmbola wan bûye ta roja me ya nûke jî ew sîmbol e raman wateyên xwe hene. Agirê wan ta nûke jî maye helkirî mirîdên evî ayînî nahêlin ew agir bivemirîtin (Qeçax, 2016: 221-222). Li dema metirsî û hêrşên dijminên wan hatine ser ev agire revandiye Hindistanê û paşî zîvirandiye ve Îranê nûke jî li mezintirîn perestgeha "Yezd" agir berdewam yê hele.

Ji ber ku agir li ba Zerdeştîyan pîroz e ewan laşên miriyên xwe nedisotin çunke bi baweriya wan ew laşe dê agirî pîs biken. Dema kesek dîmir wana dihêla li ser darekê yan berkî heta *Pedar* teyr û giyaneweran ew laşê mirî xwariba. Ji ber pîroziya agirî li ba wan, alayê Zerdeştîyan rengê zer sîmbola agirî ye û agir li ba wan tişteki cuda û taybet bû. Herwesa jî li gor baweriya wan cehnema wan jî bi befrê ye ne agir e. Ji ber ku devera Zerdeştîyan hemî keskatî û befr bû hêviya wan zeratî bû bigehinê li gor hizira wan her tiştê bigehît û baş çêbît zer dibîtin (Qeçax, 2016: 221-222).

1.4.5 Pîroziya Rengan bi Şêweyekî Giştî li ba Çendîn Bawerî û Ayinan

Her ayinek û civakek boçûnek cuda heye di remz û sîmbolîzma rengan da her yek li gor kevneşopên dîrokî şirove diket.

Rengê zer rengê Hindus û Boza ye. Rengekî nayê hezkirin di ayina îslamê da. Zer li ba Girîkan rengê agirî ye, di kirîstîyan da rengê jîyan û rastiye ye (Balayî, 2008: 66). Rengê zer misriyên kevin di peristgehên xwe da bi kar îname wek sîmbol bo xwedawendê rojê (Muxtar, 1997: 163).

Rengê spî di serdemên kevin da reng û taybet bû bi xwedawendên Romaniyan "*Jupîter*" ku giyanewerên rengê spî bo wî dikirine qurban. Ji ber ku rengê spî sîmbola paqijî û zelalî ye herwesa rengê spî di Mesîhiyetê da rengê Mesîhî ye (Muxtar, 1997: 164). Herwesa li ba ayinê Îslamê her dema lavan dikan dibêjin "ya xwedê min ji gunehan paqij bike ku çawa kirasê spî ji pêsiyê paqij dibêtin".

Rengê kesk di bawerîyan da sîmbola dilsozî, nemirî, hêviyên ruhê ye. Yê berinyase bi rengê kasulîkiya, li ba wan pir tê hezkirin, gelek dihête bikarînan di cejna *Fesih* da sîmbola firîkirinê ye. Rastgoya cîhana Mesîhiyetê di rengê kesk da tê xweyakirin. Dibêtin ku rengê kesk girêdayî keskatiyê û berhemdariya dar û barî ye, lewma dibête sîmbola jîyanê, piyêşkeftin, zêdebûn, gencînî, keyfxweşî, aramiyê û xêrî bîtin. Ji ber hindê li ba ayinê Îslamê jî dibêtin di dema rengkirina mizgeftan de bi rengê kesk yan jî rengê cil û bergên zelayên ayînî ye ku rengê kesk li ber xwe dikan (Muxtar, 1997: 164). Rengê kesk li ba misriyên kevin sîmbola kesakatî û nîşana jîyan û nemiriyê ye. Li ba Yonaniyan kesk sîbayin xwe da wend Evrudît e xwedawenda ciwaniyê. Li ba Babiliyan kesk remzê jiyaniyê ye (Balayî, 2008: 66).

Rengê sor sîmbola xwegurîkirin û şehîdkirinê ye ji bo bîr û bawerîyeke taybet yan ayinekê destnîşankirî. Sîmbola cehnemê ye di zorbeya ayinan da ku her wesfa cehenemê dihête kirin bi rengê sor. Dibêtin ev rege bibine sîmbol bo van ayîn û bawerîyan ji raman û sîmbola rengan ji çavkaniyên ya xwezayî hatiye. Lewra raman rengê sor sîmbola

şehîdbûnê çünke rengê xwînê sor e dîsan sîmbola cehnemê ye jî ji rengê agirî hatiye wergirtin (El-Yaqût, 2018: 53).

Rengê şîn di Îbriyetê da cihê wê taybet e, ku ew rengê xwedê Yehudiya ye *ZORD JEBORAH* rengêkî pîroz e li ba *Yahûdiyan* çünke li gor baweriya wan rengê xwedêyê wan e. Ji rengê avê hatiye. Dîsan li ba misriyên kevin jî bi şêweyekî zor hatiye bikarînan ji ber ku wan ev renga girêdayî baweriyên wan bûbû. Herwesa sîmbol bû ayinên wan û girêdayî xwedawendê wan *Amun* ku ev sîmbole derbirînê ji rengê esmanî diketin. Dîsan rengê parastinê ye ji pîsatiya çavhavîtinê (El-Yaqût, 2018: 53). Rengê şîn esmanî û deryayî li ba Romaniyan rengê xwe da wenda "*Cutîr*" xweda ya esmanî bi rengê şîn. Di kirîstiyanan da rengê şîn rengê cilên xanima "*Ezira*" yê sîmbola rûnahî û zelaliyê ye. Li ba farîsan şînê tarî sîmbola xemê ye (Muxtar, 1997: 164).

Rengê reş hemî ayinên Îbrahîmî, Yehudî, Mesîhyet, Îslam, ku Îslam ji hemî ayine baweriyên di mêjûyê da pitir kerb ji rengê reş ve bûne. Rengê reş kiriye sîmbol ji bo bêdîn û kafîran (El-Henbelî, 2019). Ji ayinên Îbrahîmî ji wan ayinan e ku rengê reş wek sîmbola nexweşiyê dibînin û pitir ji her rengêkî din ji reşî îcaz dibin. Sererayî hindî jî ev renga bi rengêkî êkcar zor di nav wan da hatiye bikarînan. Xanikî lewma ye jî êzidî puşên rengê reş li ba êzidiyan nayê bikarînan ji bo taziyan û xeman û şîniya bi tenê dibît di gel rengêkî spî bi kar bînin çünke rengê spî pîroz e û sîmbola aşitî û dilsoziyê ye (Enwer, 2004: 192).

1.5 SÎMBOLÎZMA RENGAN DI ÇANDA GELAN DA

Di navbera mirovî û rengan da peywendiyeka hemecur heye. Her mirovek li dûv ewê jîngeha tê da dijîtin. Çi qenc yan xirab bo her yek ji wan navên rengê sîmbol û wate û ramanên cuda danayine. Bo her rengêkî, navek danaye ku derbirînê ji wateya wan diketin ku bi hindê her yek ji yadî bihête cudakirin. Li dûv borîna demê di ferhenga rengan da ji encam û borîn û guherîna demê û niyasîna wî jîngeh û civaka tê da dijîtin ciyawaz digel civakên di ji layenên di ve.

Bi borîna demê û pêşkeftina rewşenbîrî û jiyanê rengan gelek bêje wata û sîmbolên cuda wergirtî ne. Di biwarê saykolojî û sosyolojî de yê girêdanên dirêj û girêdayî

guherînên gerdûnê û yên derveyê kontrola mirovan. Dîsan jî rûdanên madî yan ji encamê şîyanên bandora hundirîn ya rengan, ku dişên bandora xwe li ser karvedan û hestên mirovan biken.

Di nerîtan da bi giştî hindek pêname ji bo rengan û wateya wan hene hatine kirin, li ser binyatê kulturê jiyara mirovan hatine wergirtin ku her rengê bûye xudan raman û sîmboleka cuda û taybet, bo nimûne rengê reş rengê xemgîniyê, nexweşî, bêzariyê ye. Rengê spî rengê û paqijiyê, tafilkirin, safiyatiyê ye. Rengê kesk rengê aşitî û tenahiyê ye û îminahiyê ye. Rengê sor rengê şoreşê ye û di zimanê da sîmbola evîniyê ye. Belê rengê şîn di çanda gelan da hind giringî pê nehatiye dan ji ber hindî geştiye rengên qehwayî û lîmonî (Hemdan: 2008, 39).

Her ji kevin da mirovî hewl daye şarezayî pîzanîne rengan bibît di xwezayî da. Taybetmendiya rengan û dûrpêçkirina spî û kefa deryayî û çandin û şînatîya esmanî. Hunermendê Frenisî "*Eugène Delacroix*" di bîrewerên xwe da dibêjît: Li ser ciwanî û balkêşîya rengan di dîmenekî hestkirinê da çend ez *Palîta* rengan di destê xwe digirim ji bo wênekirina tabloyekî, dixwazim rengê giran bêxime ser tabloyekî tariyê sor. Pêzanîne fîzîkî yên nû diyar diken ku reng ji tîrojên rojê yên kurt û dirêj peyda dibin. Çendîn pêl dûr bin reng berev sorî ve diçin çend pêl di dirêj bin reng berev şînî ser binefşî ve diçin. Ta ku dibîte rengê ser bi binefşî ve ji aliyekî ve û rengê ser bi sorî ve. Ji aliyekî dîve ew rengên serekî "sor, zer, şîn ku her rengê em bixwazin em dişên ji van rengan dirust biken û derbêxîn, bi tenê rengê reş nebît ku hemî rengan dimêjît lê rengê spî heme rengan dikete yek digel hindek rengên sar û germ dibît rengê sor û zer, hind caran jî sar dibît digel şîn û kesk" (Balayî, 2008: 65).

1.5.1 Reng li ba Kurdan

Her wekî me diyar kirî ku sîmbolîzm û wateya rengan, li gor cih û jîngeh û bawerî xwezaya deveran e. Bo nimûne sîmbolîzma rengan li ba civakên ewropî û emirîkî jêk cuda ye, herwesa li deverên xwezaya wan jêk cuda yek nîne. Bo nimûne raman û sîmbola rengan li ba Kurdan û li ba ereban wek yek nîne, çunke ji layê xwezayê û jîngehê ve

cudahiyeka mezin di navbera wanda heye. Xwezaya Kurdistanê bi rengên cur bi cur xemilandiye çunke devera Kurdistanê pir e ji rîbar deşt û çiya û darûbarî.

Dîsan jî her tiştekî Kurdan hebît reng tê da heye û reng tev li hemî jiyana wan bûye. Di nava xweza, ziman, huner, edeb, nexş û nîgarî, civak û nerêtên wan têkel bûye. Rengî rengvedana xwe hebûye di jiyana rojane ya Kurdan da.

Bi wateyeka dî di nav dil û derûnê mirovê Kurd de cihê xwe kiriye, rengên siruştê wan bûye, egera evê çendê ku bandora xwe li ser takê Kurd kiriye. Di naxê wan da çespaye û bandora xwe li hizr û bîr û baweriyên wan kirîne. Ev çende bûye eger ku heme curiya rengî û bikarînana gelek rengan di jiyana Kurdan da ji layê civakî û rewşenbîrî û hizr û bîrên ayînî, jiyana rojane û heta di nava kelûpelên navmalê û di cil û bergan jî da gelek rengan bi kar tînin ji egerê bandora xwezayê jîngeha wan ya rengîn da. Ne wekî xweza deverên biyabanî û navçeyên dûr geya erebî ku bi tenê rengên reş û spî bi kar tînin di piraniya kerestên xwe da, lê li ba Kurdan hemî rengan bi kar tînin. Ev çende çî bihayekî û xweşiyekê ciwaniyekê didete jiyana wan çunke bikarînana yek reng yan du rengan bi tenê dibine egerê hişkî û nexweşiyên û rutîniya jiyanê (Rondik, 2017: 4).

Her civakekê nerêtên xwe yê civakî yê taybet hene û girêdayî jiyana wan ya rojane ye. Di çanda Kurdan jî da her renekî biha û giringî û sîmbolîzma xwe heye; bo nimûne rengê sor li ba Kurdan ji layekî ve sîmbola xweşî û şadiyê ye û sîmbola hest û viyanê xweşiyê ye lewma jinên Kurdan gelek di cilên xwe yê govandan da bi kar tînin.

Di serdemên jiyana kevin da li Kurdistanê taybetî li gundan. Di helkeftên pîroz da hêk ji bo zarokan sor dikirin ji madideyekê sor di rihên giyayê "Beqemî" rengê sor amade dikir (Balayî, 2008: 12).

Herwesa ji aliyekî dî ve sîmbola bergîrîkirin û qurbanîdanê ye. Dîsan rengê kesk li ba Kurdan renekî giring û pîroz e ji layê *Kurdên Misilman* ve, rengê kesk sîmbola aramî û razemendiyê ye çunke rengê kesk ji layê derûnî jî ve bêhnfirehiyekê didete mirovî, ji layî bawreya ayînî ve *Kurdên Misilman* pîroziya daye vî rengî. Dîsan jî gelek cihên ayînî bi rengê kesk hatiye rengkirin, di perstgehan û cil û bergên ayînî da rengê kesk bi kar tînin.

Herwesa Êzdiyan jî giringî daye vî rengî ku rengê jiyanê vejîn û geşbûnê ye û di gelek têkstên wan yên pîroz da rengê kesk hatiye wek sîmbol bû gelek tiştan bi kar îname. Rengê spî li ba Kurdan sîmbola aşitî baqijiyê ye û aştiyê ye, lewra cilên bûka bi rengê spî xemilandî ye ku sîmbola paqijî û şeref û bê gonehiya bûkê ye. Herwesa di hindek nerîtên civakî da dema kesek rengê spî dikevîte pora wî ku sîmbola mezinahiya jiyê wî ye dibête cihê bawerpêkirin û rêza kesên derdora wî. Rengê reş jî sîmbola xemgîniyê û bextreşiyê ye li ba me Kurdan ji bo taziyên xwe rengê reş bi kar tînin wek sîmbola derbirîna xema xwe. Herwesa gelek kerb ji bo pşîka reş heye ku sîmbola bextreşiyê ye li ba Kurdan cuda ji van nerînan jî hindek caran sîmbola ciwanîyê jî bi kar îname wekî birî reş çavên reş, por reş.. htd. Dîsan rengê zer li ba Kurdan nerînen cuda bi xwe ve girtine ji ber ku renekî vebûyî û zîqe, texa gencan di cilên xwe da bi kar tînin taybet jin. Dîsan jî hindek nexweşî bi rengê zer nav kirîne mîna nexweşiya zerikê. Rengê şîn li ba civakê Kurdan wek sîmbola parastinê ye ji çavên bexîlan bi kar hatiye ku taybet bo zarokan ve ku morîkeka rengê şîn bi cilên wan ve diken da ku bihête parastin ji her tiştê xirab û çavên pîs. Rengê binefşî sîmbola ciwanî û nazikiyê ye û golek li Kurdistanê heye ciwan û nazik e ji ber vê golê navê gelek jinan bi vî navî hatîne navkirin (Rondik, 2017: 50-51-52). Gelek caran hindek navên xerîb û cuda Kurd bikar tînin mîna: kej, boz, xemir, esmer, sîs... htd..

Ji kevin da Kurdan reng bi kar îname û li serdema mîrên babikalên Kurdan, li ser rengirkina pênc *Şurhên Ekbadan* reng bi kar hatîne. Her şurhek bi renekî û her renek bi hêmayekî di bihayekê diyarkirî da bi kar îname (Balayî, 2008: 102-103).

1.5.2 Pîroziya Rengê Şîn (Tirkwazî) li ba Tirkan

Rengê feyruzî yan tirkwazî yek ji pileyên rengê şîn e. Ev şîne nêzîkî rengê keskî ye. Navê rengê feyruzî ji kevirê bibiha yê "Feyruz" yan jî "Feyruze" hatîye. Rojhilatnasên ewropî bi *Tirkwaz* nav dikir, bi ramana berê tirkan. Li serdemên kevin yên berî ya îslamê ku tirkan li despêkê peristina esmanî dikir lewra kiriye sîmbola esmanî, ev gelek caran jî bi navê *gök rengi* wate rengê esmanî bi nav diken. Dîsan li gor bawerîya wan gelek sîmbol û têgehên dî ji bo evî rengî hene weku dilsozî, ronahî, paqijî, hevalînî, hişmendî, rastî, hevsengî, aramî, afirandin, ruh û hêvî. Ev renga dibe egerê peyda bûna hestên bêhnifrehî

û aramiya derûnî. Dîsan li gor bawerya tirkan ev renga mirovî berev cîhana xeyal û hizran dibetin (Bedir, 2020).

Li serdemên Osmanîyan jî evî renga giringî û pîroziya xwe hebûye. Lewra di gelek karên avahî û xemlandinê da bikarîname. Kirye sîmbola meznahî û desthelatê. Ji ber giringiya dîrokî û heza evî rengî, careka dî li sala 2013an ev renga li welatê tirkîya bi şêwekê berçav diyarbûye. Di gelek kar û rê û resmên hikumî û fermî da rengê tirkwazî bi kar tînin. Heta cilên fermî yên serbaz û yarîkerên werizşî jî hatine guhartin bo evî rengî (Bedir, 2020).

1.5.3 Reng li Ba Ereban

Rengî peywendî di gel cihî û civaka mirov tê da dijîtin heye. Lewra demê em li rengên civaka erebî dinêrîn, bi taybetî dever û welatên "Kendava Erebi" ku pila germê li evan deveran bilind e, çûnke ev devere biyaban û deşt e. Ji ber evê yekê jî zêlamên van herêman cilên reng vebûyî li xwe diken. Dişdaşeyên rengê spî li ber xwe diken, da bişên xwe biguncînin li gel xwezaya devera xwe, çûnke rengên vebûyî bi taybetî rengê spî, tîrojkên rojê li ser pêçewane dibin. Ji ber ku rengê spî tîrêjan namêjîtin. Herwesa di werzê zivistanê da cilên rengê tarî bi taybetî rengê reş li xwe diken, çûnke rengê reş hemî ronahiyê dimêjîtin (Balayî, 2008: 68).

Herwesa jinên vê herêmê jî ji bilî rengê reş, regekê dî li xwe naken. Eve vedigerîte dîroka wan ya kevin ta ku îro jî bandûra xwe li ser wan maye û guhartin bi ser da nehatiye. Zû bi zû rê nade jinên xwe ku rengên cuda li xwe biken. Çûnke li gor ayinê îslamê rengê reş jinê diparêzît, evê çendê jî bandora xwe li gelek civakên musulman kiriye. Pîsporên saykolociyê diyar diken ku rengên çavlêker mirovî berev jiyaneke rutîn diben (Balayî, 2008: 68-69).

1.5.4 Reng di Çanda Farisan da

Reng di her civak û çandekê da raman û sîmbolên xwe yên civakî û ayinî hene, ji civakekî bo yeke dî li gor jîngeh û demî dihêne guherîn.

Di dîroka farisan da rengên berdewam derketîne meydanê rengên spî, reş, mor in ku giringî û pîroziya xwe hebûne li ba farisan ji serdemên kevin ta serdemên nûke jî mane. Rengan di çanda farisan da gelek rol û giringiya xwe hebûye bi taybetî li ba hunermendên wan ku di karên xwe yê hunerî da gelek reng bi kar înayine weku xemlandna "*Neqşê Rostemî*" da. Dîsan Xemlandina gorê "*Daryûsê Mezin*" bi rengî mor "*Binefşî*" ku di çandna farsan da sîmbolên ciwanî û hunerî bi xwe ve dîtine. Dîsan di çanda farisan da rengê spî sîmbola paqijî û zelaliyê ye. Li demê çûna farisan bo nava ayinê "*Zerdeştîyan*" da spî kire sîmbola paqijiya derûnî, ji ber hindê jî cilên zelandên ayinî û xwedan baweran bi rengî spî hatin xemilandin. (Nîknam, 2020).

Rengê kesk jî di çanda wan ya neteweyî da, sîmbola jiyan û nemiriyê ye. Evî renga pîroziya xwe hebûye bi taybetî di serdemên kevin da, lewra farisan di kevneşopên xwe da gelek giringî bi rengê kesk daye di piraniya rê û resmên xwe da bi kar înayine. Bo nimûne di helkeftên dawet û dîlan da bi kar înayine, wek sîmbol ji bo xweşî û jiyanê bi kar înayine. Ku di evê rê û resmê da kes û karên zavayî da çeqê dareka kesk bilind biken û parçe qumaşekê kesk wek sîmboleka da ku di jiyana xwe ya hevjinî da xweşî û bereket para wan bîtin. Dîsan colên bûkê bi parçe qumaşekê kesk dihate xemlandin û zava jî kulavekê kesk li serê xwe dikir. Dîsan qumaşekê kesk li ser milê xwe yê rastê didana. Her tiştê dihate bi kar înan di evan rê û resman da bi rengê kesk dixemland (Nîknam, 2020).

1.5.5 Reng di Çenda Fîrewniyan da

Reng dihête hijmartin pişkeka herî giring di şaristaniyeta mirovan a tiyê da. Li serdemên şaristaniyeta *Fîrewniyan* mirovan reng wek sîmbol bo gelek tiştan bi kar înayine. Di cil û bergên keşên ayinî da rengên sor û bikardîna. Rengê zer û rengê şînê vebûyî yê esmanî di rengkirina dîwarên peristgeha û peykerên pîrozên perestgehan da bi kar înayine dîsan jî erdê perestgehê bi rengê kesk dihate xemilandin. Ku rengê kesk li ba Misiriyên kevin rengê xweşî nûkirin û bêhnvedanê bû (Mitwec, 2004: 185-190).

Herwesa *Fîrewnî* tanceka rengê spî li serê xwe di kr wek sîmbol ji bo diyarkirina desthelat û kontrolkirina xwe li ser *Misira jûrî*. Herwesa tanceka rengê sor bû diyarkirina

dest helata xwe li ser *Misira jêrî*. Çünke di efsaneyên Misiriyên kevin da rengê sor sîmbola Misira jêrî bû (Tîbu, 2004: 43).

Di şaristaniyeta Misiryan da ku reng di piraniya biwarên jiyana xwe bi kar îname wekî biwarên pêşesaziyên hunerî, ayînî, bînasaz.. htd, bi kar îname her yek ji wan helgira raman û sîmbolên taybet û cuda bû. Bo nimûne rengê şîn li ba wana hatiye girêdan bi rîbarê nîl ve ku rengê wî rîbarî rengê şîn û rengê kesk rengê çendîne ye, rengê zer rengê rojê ye û rengê sor rengê xwîn û hîzê ye (Hewas, 2019).

Wate bi vê çendê her renek li wê serdemê bibû xwedan sîmbol û raman bo nimûne çînen civaka wan hatibûne dabeşkirin û pulînkirin. Lewra rengan jî cudahiya xwe heb û curekê rengan taybet bûn ji bo malbata şahan yan malbata desthelatdaran û rengkirina kelhên wana, cure dî wê yê rengan jî bo gîşt xelkê sade ku bi vê dabeşkirinê reng ji hev hatine cudakirin û ji bo nasîna her du çîna ji yek çîna malbatên şahane û çîna xelkê normal û cudakirina çîneyî bi rêya rengan (Mitwec, 2004: 185-190).

Wate li vîrê her renekî sîmbola xwe hebûye di nerîten gîştî da hindek sîmbol û pêname û wateyên cîgir ji bo rengan hebûn rene heta nûke jî mabin ku ji kulturê civakî hatine wergirtin ku civak li ser razî û rekeftiye.

1.5.6 Reng bi Şeweyekî Gîştî li ba Çendîn Gel û Netewe yan

Her ji kevin were bizav hatine kirin ji bo peydakirina peywendiyekê di navbera rengan û digel regezên jiyana deverên cuda û li welatê Çînê berev rojhelatî şîn sîmbola darê ye. Rengê sor berev başûrî sîmbola agirî ye. Di hizirên kevin da hizira mirovê destpêkê da rengê sor hêza xwezayî ye û berhemdarî û nemiriyê. Piraniya çanda kevin remzê agir û sor asêbûn bi kar anîye. Misiriyên kevin xwedawenda "Sîp" resm kiriye û xwedawenda asiya rengê sor herwesa nîneratiya Xwedawendê rojê "Ra" dîkir. Di efsaneyên girîkî û romanî da hizir dîkirin xwedawend *Dînus* bi rengê sor bû. Herweha xwedawend "Mars" xwedawendê şerî bû (Balayî, 2008: 65).

Rengê sor li ba çanda gelan kelek watayên cura û cur bi xwe ve girtine û li dûv xwezaya her gelekî. Rengê sor li ba çîniyan sîmbola xweşiyê ye û bi şeweyekî berfireh di ahengên bûk û zavayan bi kar tînin. Ji ber hindê li şehiyana bûk kirasekî rengê sor li bejna xwe dike wek nerîteke wî welatî û wî civakî. Herwesa sîmbola dilsozî, serkeftin, dewlemendî, xweşî û hestsoza ye û gelek caran helgira watayeka nerênî ye ji ber ku gelek caran dema kesek dimirîtin navê wî bi rengê sor dinivîsîn. Li naverasta Efrîqiya cengawer laşê xwe bi rengê sor reng diken di nava kernevalan da ji ber ku li ba wana rengê jiyan tendirustiyê ye gelek caran jî nexuşan bi vî rengî reng diken. Li gelek deverên di rengê sor watayeka cuda bixwe ve digirîtin ku sîmbola tazîyan e û nîneratiya mirinê diketin, çunke gelek caran xelkî wana dihête kuştin bi destî hirçên sor, ji ber hindê jî rêkxirawa "xaça sor" li gelek deverên kîşwerê "Asiya" wana rengên xwe guhartine ji rengê sor bo rengê kesk yan spî (Hisour, 2019).

Dîsan sîmbolîzma rengan di çanda gelan da hindek caran wek şeweyê efsaneyî hatîne baskirin. Gelek caran sîmbole ji xwezayî wergirtine girêdayî delalet û wate û çavkaniya wî sîmbolîzma rengan ya saykolojiya lewa ji ber hindek delaletên derûnî û ev renga wek sîmbol destnîşan kirine ji bo gelek tiştan. Lewra sîmbolîzma rengan di efsaneyan da û fantastîk û mîtolojiya vedigerîte ve bo çerxên berê yên mêjûyî. Mirovên kevin hewl daye bo şirovekirina kod û hêma û sîmbolên girêdayî ramanên rengan, ewên bûne egerê hizirkirin û peydabûna hizr û tirsê li ba wana ji ber hindê rabûye bi şirovekirin û şîkirina wan diyardeyên xwezayî mîna volkan û bîveleriz û ronahî dengê bi rîsiyan ku ji wana hemî encamê hêzeka veşartî û nediyar e. Derencamî van rûdanên xwezayî rabûn bi vegêrana çend fantastîk û efsana ji bo şirovekirina wan diyardeyên xwezayî.

Ji ber vê yekê jî vekoler rabûne bi veguhastina wan wate û sîmbolên rengan mîtolojî yan da bi armanca diyarkirina nejad û resenaya çavkanêa wateya wan sîmbolan ku pitirîya wan girêdayî ne bi sîmbolên psîkolojî ve pişit bestina wan li ser ji rûdanên xwezayê bûne.

Li dev gelek milletan reng hatîne bikarînan ji bo aşkerakirina derewan, ku ewan berekê taybet bi vî karî ve dikire destê tawanbarî da wî ew berê di destê xwe da dilivlivand ta ku rengê wî reş biba. Eger rengê wî berî reş biba yekser digot ew kese gunehbar e. Dîsan

li gor hizira wana ku rengê zer ew reng e ku dibîte egerê peydakirina şensî û dewlemendiyê ye. Herwesa berê rengê kesk dibîte egerê vejîn û jiyan û pêşveçûnê û rengê spî ew diparêzît ji çavan û bexîliyê. Herwesa li gor hizira Japonîa ku rengê sor kabusan vedirvînît. Dîsan li Misira kevin serbazên wan gustîlên rengê sor li tiliya xwe dikirin ji bo ku di şeran da birîndar nebin eger birîndar jî bûn xwîn ji birînên wan nehên (El-Yaqût, 2018: 66).

Dîsan Rengê spî giringî û pîroziyeka mezin di jiyana milletê Mengolî da heye. Rengvedaneka mezin li ser jiyana wan kiriye ji her layekî ve wekî xwarin, cil, çadir, nerîtên civakî, giyandar.. htd. Egerê pîrozî û giringî pêdana rengê spî li ba wan girêdayî rewş û jiyana wan e, bo baweriya ayîn û dastanên wan yên kevin vedigerît wek kevneşop li ba wan maye. Li gor hizira wan rengê spî pîroziya ruhiyeta nîşê beriya wan e. Rengê spî li ba wan wek sîmbola pîroziyê û bexteweriyê ye. Yek ji nerîtên wan yên gelerî li dema gîrana aheng û govendan dê zava qumaşekî spî li naftenga xwe girêdet li hêviya bûkê rawestît û paşî her du dê bardaxekê avemastê bi hev ra vexwen dê her du amadeyî govenda xwe bin. Ev çende bala mirovî dikêşît û taybet ew kesên seredana vê herêmê diken (El-Sîn, 2019).

Dîsan di kevin da li ba gelê emirîkî rengê şîn bi kar îname, wek sîmbol ji bo nawçeya Emirîka Başûr rengî spî jî sîmbola Emirîka Rojhelat bû. Zer jî bo Emirîka Rojava û rengê reş bo Emirîka Bakûr. Herwesa Hindusa rengê reş sîmbola cîhana jêrî û ji bo cîhana jorî gelek reng sîmbol bûn (Muxtar, 1982: 162-163).

Dîsan jî li gelek welatan hindêk bîr û bawerî û nerîtên xerîb û ciyawaz hene ku ji bab û bapîran wergirtine. Wek handana xelkî diken ji bo hizira peydakirina şensî bi rêya rengê ewan cilên li ber xwe diken li dema bi dûmahîk hatin û xelasbûna salê û pêşwazî kirin li sala nû bi rêya cilên li ber xwe diken di helbijartina hindêk rengan, yek ji wana rengê zer ku li gor hizira wana ku ew rengê cilikan. Dibîte egerê şansînan û derfetên wan zortir lê dihên ji bo derav û dewlemendiyê û barê wan ê aborî baştir lêhîtin taybet ku zêlam li ber xwe diken. Du rengê sor jin li ber xwe diken wek sîmbol ji bo evîniyê hestan li ber xwe diken li dema hatina sala nû (El-Yaqût, 2018: 66). Dibît eve hemî ji verêja hizir û bîrên wan yên derûnî bin.

Dîsan jî bikarînana rengê şînê tarî jî li gor hizira gelek gelan ve ku şîyan hene ji bo parastinê ji çavên bexîliyê ku Faraoniya bi kar înayine di cil û bergên xwe da û kel û pelên ciwanikarî û tancên xwe da (El-Yaqût, 2018: 67).

Herwesa ji ber evan hizr û bîr û baweran heta nûke jî gelek ji xelkî sîramîkên rengê şîn û li ser mal û xanî û avahiyên xwe her ji kevin da heta serdemên nûke jî ev çende maye û rengvedana xwe di nava me kurdan jî da kiriye. Gelek caran bi şêweyê çavik yan morîkên şîn hatîne dirustkirin û li dor gerdena zarokan alandin. Ta nûke jî wek nerîtek li nava zorbeya gelan da maye ku rengê şîn sîmbola parastinê ye ji çavan û bexîliyê.

1.6 SÎMBOLÎZMA RENGAN DI SAYKOLOJIYA KESAN DA

Vekoler û pisporên saykolojî diyar diken ku reng ne bi tenê hindek pêl û tîşkên ronahiyê ne. Belê bo ewan diyar bûye ku peywendiyeka mukim di navbera reng û derûnê mirovî de heye. Bandora mezin dikete ser derûnê mirovan ta wî radeyî ku bandora wî digehîte kûrtirîn xala naxê mirovî. Bandorên saykolojî dabeş dibin li ser bandorên rasterast û nerasterast dişên vê çendê bi zanist nav bikin ku wek zanist jî bihête xwendin.

Herwesa pisporên şareza yên vê çendê dane diyarkirîn ne ku dişên kesayetiya her kesekî diyar û nas bikin bi rêka ew rengên xweşîtî li ba wan û her renekî ji wana çi bandorek li ser derûnê her kesekî heye û ka dişet bandorên *pozetêv* û bandorên *nîgetîv* li ba wan peyda biket (Ebu Eyaş, 2019). Hindek ji wan bandoran erênî ne derbirînê ji geşbînî, bêhnfirehiyê, keyfxweşî û evîniyê diken. Hindek ji wana jî yên nerênî ne ku bandorê dikene ser hest û suzan dibine egerê peydabûna dudilî, bêhtengî, tevlihevbûnê, xemokî û ne viyanê, zêdebarî bandora wê ya tendirustî.

Dîsan her mirovek renek li ba wî balkêş e, li ser vê gotinê vekolerên pisporên di vî karî da di şiroveyên xwe yên zanistî da aşkera kiriye, ku rengî bandoreka xwe ya bihêz li ser derûnê mirovî heye. Gelek kes renekî bêdeng di piraniya odeyên xwe da di qulaçeka biçwîk da rêk dixen. Rengê spî di vê rêkxistinê da bi kar tê, ronahiyê jî li ser şêweyekî siruştî rêk dixen. Ronahiya odeyan bi ronahiya gilopa spî hawkêşe diken digel rengê kesk. Ji bo hawkêşeya di nava malê da derûnê mirovî rehet biketin û mirov hest bi bêdengiyê

biket. Yan bi alîkariya tabloyeka hunerî ku rengên wê digel rengên odê hawkêşekê dirust biken û biguncin (Balayî, 2008: 57-58).

Ji ber hindê jî reng dişêtin bandorê li derûnê mirovan biketin û dişêtin kesayetiya wî diyar biketin ku her rengekî di saykolojiyê da têgeh, sîmbol, ramana xwe ya cuda û taybet heye. Diyarkirina hindek rengan û ek sîmbol ji bo hindek tiştên diyarkirî (Muxtar, 1982: 228-230).

Bandora her rengekî ji ya dî cuda ye, bo nimûne rengî şîn û kesk rengê bêhnfirehiyê û aramiyê ye. Rengê zer rengê balkêşî û keyfxweşiyê ye. Rengê sor yê azirandina hestan e. Rengê mor rengê xemgîniyê ye û rengê pirteqalî yê germ û balkêş e. Reng dişêtin bandora xwe li mirovan biketin û siruştê wana aşkera biketin ku ew bixwazin yan nexwazin reng dişêtin siruştê wan zelal û aşkera biketin. Bo nimûne rengê sor girêdayî dilsoziyê ye û sîmbola evîniyê ye.

Di serdema nûke da em pêdivî bi wê çendê ne ku babetên rengan bigehîn ji layê barê derûnî ve. Çünke bi tenê reng ne bercestekirin û nîşandana ciwaniya rengan e. Tiştê di xwezayî da pir e ji rengan mîna rengê teyran, baxçeyan, esman, stêr, berhemên dar û barî, heyv û heft rengî.

Herwesa pisporên şarezayên evê çendê didene diyarkirin ku dişên kesayetiya her kesekî diyar û nas bikin bi rêka rengê xweşitî li ba wan. Herwesa helbijartina kesan ji bo rengî cil û bergan yan bo her tiştêkî dî bi şêweyekî tera û bera nîne lê vedigerîte ji bo begrewend û barê derûnê wan.

Ji ber vê yekê jî gelek dîktor di biwarê tendirustî da reng wek çareserî bi kar înayê yan û di dîzayin û xemilandina klînîkên xwe yê taybet, çî rengê dîwaran bît yan bi rêka tabloyeka ranga û reng bît ku jorên klînîkên xwe pê dixemilînin, da ku li dema seredana nexuşan bo cihên wan êkser hest bi derûneke aram û tenaw biketin û ji layê derûnî ve bêhnfireh bibin. Çünke dema nexuş çavê wî bi rengekî dikevêt êkser çav îşaretan ji bo navçeyên taybet ên mêşkî firê diketin (Îsawî, 2016: 15).

Herwesa ji bo çareserkirina nexweşan bi rêya rengan tîmekê zanayan rabûn bi dahênana hindek amîr û rêkan bi tomarkirin û zanîna rengvedan û bandora rengan li mirovan ji layê derûn û fîsyolojî ve. Bi watayeka dî tomarkirina hemî rengvedan û karlêkirinên saykolojî û fîsyolojî li bin bandora rengan. Bandorên zêde lêdanan, lêdanên dilî, livîna çavan li dema vekirin û girtinê da, kiryara henasekirinê da û çalakî û karvedanên mêşkî û gelekên dî...

Li ser vî babetî û li gor vekolînan gehîştine gelek encaman jî di sala 1878an de zana "D.B. Gadialy" ka çawa tîrûşkên rengên bandora xwe dikete ser çareserkirina nexweşiyên û giyanandarên zindî. Di sala 1933an de piştî çend sala vekolînek bi navê (Ensîklopediya hunerê pîvandina rengên spektral) di biwarê çareserkirinê de bi rêka rengî encam da. Ji ber hindê jî ew teoriyên di vî biwarî da hatine pêşxistin vedigerin ve bo karê vî zanayî di biwarê çareserkirina bi rêya rengan de. Herwesa di sala 1990î de zanayê elmanî "L.Fa" ferhengê zanistî dana li ser rengên sereke û rengên timamekrên êk. çewaniya çareserbûna ji nexweşiyên bi rêka amîrên çareseriyê yên cuda cuda bi navê amîrên çareseriyê siruştî bi rêka tîşkên rengên. Herwesa di vekolînên hevçerx da gehîştine wê çendê ku bikarînana bi rêya rengan dibine egerê hûrbînî û çalakkîna şiyanan li ser xwandê û bîrînanê û bihêzkirina bîrînanê ji 55% heta 78%. Ji layê derûnî ve vekolîn taqîkirin diyar diken ku rengan bandora xwe heye li ser derûnê ji layê hestkirina mirovî bi germatiyê. Li gor vekolînekê li welatê *Nerwîj* diyar bû li dema mirov li odeka rengê şîn ve bîtin, dê rabin bi zêdekirina amîrên germkirinê bi sê pileyan cuda ji wan ewên dijûrên boyaxkirî bi rengê sor. Vekolîn diyar diken li ser kîmkirin vebûn û girtina rengan û pileya wan dibine egerê zanîna demê li ba mirovî û bandora xwe li ser hestyariya mirovî diketin. Li Busina welatiyê emirîkî pîsporên pîstî jî diyar diken ku tîşka rengê şîn mirovî her dihêlin genc û serûçavên mirovî geş û ciwan diken. Dibît hind bandora xwe lîzerî nebît lê baş e (Cibrîl, 2013: 71-72).

Di sala 2000î de li bajarê *Gilasko* taqîkirineka saykolojiyê kir. Ew jî rabûn bi guhartina ronahiya golopên ser cadeyan bi rengê şîn ji bo bandora wî rengî li ser xelkê wî bajarî bo wan diyar bû ku rêjeya ajawegeriyê kêmtir lê hat ji rêja kevintir (John, 2018). Dîsan jî li welatê *Japonê* di sala 2009an de ronahiya rengê şîn li wîstgehên qîtarê bi kar

înan ji bo kêmkirina xwe kujiyê li van cihan. Ku wate li rastê rengê şîn bandoreka erênî dikete ser derûnê kesan û derûnê wan aram diketin.

Carl Gustav Jung yê elmanî ji nav û dengtirîn vekolerên saykolojî ye. Ji ewên giringiyê bi taybetmendiya rengan ramanên wan rêkên bikarîna wek alavek ji bo çaresekirina nexweşiyên derûnî bi rengan. Taybet bikarîna tabloyên *Pablo Picasso* ku pir in ji sîmbolên ruhanî û hestî. Dîsan gelek vekolîn li ser giringî û bandora rengan û tabloyan li ser nexweşên derûnî û herwesa gelek karkîye ji guherîna zimanî bo sîmbol û rengî (Riley, 1995: 307).

1.6.1 Bandora Rengan li ser Derûnê Kesan

1.6.1.1 Rengê Sor

Herwekî me diyar kirî ku rengê sor yekem reng e ku mirovan nas kirî di xwezayê da. Rengê sor xwedana dirêjtirîn pêl e ji ber hindê rengê balkêş, birîsqedar û germ e. Rolekî mezin heye di bilindkirina lêdanên dilî û di azirandina hestan da li ba mirovî, ji ber hindê jî bi hestên evîniyê ve tê girêdan. Herwesa jî bi hindek nerînên dî yên cuda rengê sor karvedan û hêzê li ba mirovî dirust diketin.

Rengê sor ji layê saykolojiyê ve gelek sîmbolên ciyawaz jî bi xwe ve digirîtin, ev sîmbol û wataye ji kesekî bo kesekî dîtir cuda û rêjeyî ye dibî bandorên baş û xirab hebin li ser kesan (Cherry, 2019).

Ji ber vê çendê jî nabî rengê sor di odayên nivistinê da bi kar naînin çunke li dema xewê mirov dê tuşî dîtina xewnî nexweş bî. Ji ber hindê jî ew kesên hez rengê sor diken bi kesên çalak û romanîsî û hestiyar dihêne wesifkirin. Ji ber hindê dişên zî bala xelkî bo xwe bikêşin û dibine cihê giringiya kesên derdora xwe heta dema xwe li wê civatê amade jî nebin. Herwesa jî kesên rengê sor baweriyeka zêde bixwe heye ji ber hindê bandora xwe dikene ser kesên derdora xwe. Dibêjin mêşkê wan vekirîye û taybet in. Dîsan ev kese dem demî ne û dibî gelek jî aciz bibin lê di serhindê ra kontrola xwe ji dest naden.

Zanayê *Emirîkî Andro. J. Aliyot* di vekolînekê da diyar kir ku jina rengê sor di cilên xwe da bi kar tînit pitir bala zelaman bo xwe dikêştin. Hestên wî yên seksî diazîrînit, pitir ji jineka regekî dî di cilên xwe da bi kar tînit. Lewra jî dema jin vî rengî li xwe diket bi wateya hindê ku bo zelaî diyar biket ku ew ya giring e (Alter, 2019).

1.6.1.2 Rengê Zer

Rengê zer moralê li ba mirovî bilind diket û wediket ku mirov pitir rêzê li hundirê xwe bigirîtin. Ji ber hindê rengê bawerî bixwebûn û geşbîniyê ye. Dibît gelek caran jî di derûnê da cure tirs û dudiliyê peyda biketin.

Sîgman di nameyeka xwe da bo *Hewayê* dibêjît: Pêdiviya te bi rengê zerî û hizirê heye hezên te bo dîtina tiştan di riyalîte da giring in. Her dema tu hest bi kêmasî û nexweşiya di nav malbatê da dikî, pêwîstiya te bi rengê zer heye, livêrê dê zer alîkariya te dike bo gehîştin û bidestxistina tiştan hewrekî tê zanîn ku ev renga laşê te ji jehr û nexweşî û dilpîsê rizgar dike (Balayî, 2008: 28).

Di rengên kesk û sorî da rengê zer ji hemî rengan birisqedartir e. Çavên mirovî rengê zer ji hemî rengan pitir têbînî diketin. Ji ber hindê di saykolojiyê da regekî rehet e ji bo dîtî û derûnê mirovî. Ji ber giringiya raman û sîmbolîzmê rengê zer di saykolojiyê da cihekî taybet girtiye. Ku hestên bêhnvedana mêşkî li ba mirovî peyda diketin û wel mirovî diketin ku hizir di roj, havîn, derya, xweşî û rîlaksê biketin û gelek sîmbol û ramanên dî hene (Îshan, 2019).

Rengê zer bandora xwe ya kehrumugnatîzî heye ji ber hindê karvedanên kîmyayî li ser amîrê taybet ê hestiyar û çavan diketin. Ew jî bi rolê xwe hindek îşaretan bo mêşkî fire dikin û şirove dibîtin bo rengê zer û bandora xwe li çalakiya mêşkî diketin. Ji ber hindê jî laşî mirovî bihêz çalak diketin. Laşê mirovî pêdivî bi tîşka rojê heye ku di hundirê xwe da rengê wê zer e çunke ew tîşke dibîne egerê bihêzkirina livîna bizava demarên mirovî (Xemqanî, 2015: 86-93).

Ji ber hindê jî kesên hez ji rengê zer diken hez ji hizirkirinê diken. Gelek di run û hîrbînî di jiyana xwe da. Şiyanên wan yên mêşkî gelek zor in. Pitirîya caran jî boçûnên

wan dirust in û hizirên wan nimûneyî ne. Ji ber ku rengê zer sîmbola jîrî û têgehiştina bilind e. Xwedanên vî rengî gelek helgirên hêza arênî ne û hêzî dibexşîne kesên derdora xwe jî (Ebdull Hemîd, 2019).

1.6.1.3 Rengê Kesk

Zanayên saykolojî diyar diken ku rengê kesk xwedana gelek raman û sîmbol e di saykolojiyê da. Ji ber ku rengê kesk girêdayî xwezayê û jiyanê ye. Lewra rengê kesk bi wateya destpêka her nûyatiyekê ye. Kesk sîmbola tendirustiyeka baş dihêtin, ji ber hindê jî li nexweşxana evî rengî bi kar tînin. Sîmbola zelalî, xweza, geşbînî, nûkirina berdewam, ektîvî, xîr û aşitiyê ye. Rengê kesk renekî xweş e bo dîtîne û zîka diçîte di dilê mirovî da bi taybet keskê vabûyî. Zêdebarî ewê çendê jî hindek caran jî hindek ramanên, nerînên nîgetîf hene li ser rengê kesk bi wataya bexîlê jî dihîtin (Derbere, 1954: 26).

Di biwarê saykolojiyê da dema kesek bêhteng dibîtin li cihekî tijî dar û bar û keskatî rînîte xar, dê hest bi bêhnfirehiyê û geşbîniyê ketin. Ji ber ku bikarînana rengê kesk dibîte egerê mîjana hemî hêzên nerînê.

Ji ber vê yekê jî gelek caran rengê kesk ji bo çareserîya nexweşîyan bi kar hatiye taybet li serdema şaristaniyeta *Fîrewniyan* da ku êkem şaristaniyet bo rengê kesk bi kar îname ji bo çaresekirinê.

Dîsan bikarînana rengê kesk di odeyên nivistinê de dibîte cihê bêhnvedanê, rehetiyê, bédengiyê, aramiya derûnê mirovî.

Kesên hez ji rengê kesk diken xwedî kesayetiya taybet in. Ji sîfetên wan dilsoz û bi wefa ne, zêde hestiyar in, hîç carekê dudil nabin di harîkirina kesan da di her biwarekî da. Ji ber hindê jî hest bi dilxweşiyê diken li dema alîkariya kesên derdora xwe diken. Pisborên saykolojî diyar diken kesên hej vî rengî diken cihê bawerî ne û bi rûmet (Ebdull Hemîd, 2019).

1.6.1.4 Rengê Şîn

Ji ber ku rengê şîn rengê esman û deryayê ye ev renege bi sîmbola aramiyê hatiye naskirin. Ji ber hindê bandoreka mezin li ser zewiq û hestên mirovî diketin. Rengê şîn ji hemî rengan berbelavtir e di cîhanê da, di saykolojiyê da sîmbola tenahî, bawerî, viyan û jiyanê, gelek jaran bi wateya hestên sar dihêtin. Çünke ev renege ji sartirîn rengên keskesorê ne. Herwesa rengê xweşî û parastinê ye lewra bandoreka mezin li ser dil û demarên xwîne heye, ji bo nexweşên dilî bihêr kurtiyê bi kar tê (El-Burînî, 2019).

Dema em baş li reng û bandora rengan dikeyin helbet ev çende girêdayî tarî û vebûna hêza van rengan e. Rengê şînê tarî saluxetên wî cuda ne ji rengê şînê vebûyî ku rengê şînê tarî wateyên nexuş û xemgîn didet lê rengê şînê vebûyî hestên aram li ba mirovî peyda diketin. Ji ber ku rengê deryayê şînê vebûyî ye dema kesek bêhteng dibêtin seredana deryayê biketin û çavên xwe bi şînê vebûyî ron biketin dê hest bixweşî û aramiya derûnî ketin.

Hejêkerên rengê şîn zêde hestiyar in ta dûmahîk pile, sereray hindê ku kesayetiya wan ya vekirî ye lê baweriya wan bi kesên derûdûra wan nahêr. Eve wê çendê digehînit ku gelek bi sanahî baweriyê nadene kesên beramber. Şerm ji derbirîna hestên xwe naken dişên bisanehî bikene bigirî bê şerm ji kesekê biken. Beramberî hindê jî dişên derbirîne ji hestên xweş ên xwe biken û wek zarokan ji dilên xwe bikene kenî. Herwesa jîriyeka bihîz ya li dev ku dişên bisanehî hestên kesên derûdora xwe bizanin ku çend ew veşêrin jî. Herwesa dişên digel hundira xwe biguncin û aram bibin (Îsmail, 2019).

1.6.1.5 Rengê Spî

Rengê spî di saykolojiyê da sîmbola viyan, aşitî, silametî û aramiya derûniyê ye. Rengekî paqij e û xwe digoncînê bi têkelkirina we digel her renekê dî. Rengê spî sîmbola aşitî û viyanê ye. Lewra di alayên radestkirina artêşan da bi kar tê bi wateya em xwe radest dikin ku aşitî û silametiye dixwazin û dibêr nameya aşitiyê. Rengê yêk qebûlkirina kesên beramber e. Ji bo aramiyê û hêza endamên leşî bitaybetî amîrê bergiriyê ye (Me'abîre, 2019).

Kesên vî rengî bi kar dînin û hez jê diken xwedan pêzanîn in û hawkêşek di hizira wan da heye ku nîşana zanebûnê ye. Dîsan kêmtir ji nexweşiya dibin û gelek xwe ji arîşeyan diparêzin her dem aram in. Ji ber ku rengê spî sîmbola pakî û vejîn û rengkirinê ye xwedanên vî rengan ji layê hemûyan ve têne hezkirin. Dîsan jî ji ber ku rengê spî derûnê mirovî aram diketin di navendên werzişî da mîna werzişa *Yugayê* bi kar tê (Me'abîre, 2019).

1.6.1.6 Rengê Reş

Ji ber ku rengê reş rengê hêzê û berzebûna ronahiyê ye û ji ber ku hemî ronahiyê dimêjît, lewra gelek digel rengên dî bi kar dînin. Rengê reş sîmbola bextreşiyê û bêzariyê û xemgîniyê ye. Çünke renekî nerênî ye û sîmbola nemanê ye.

Rengê reş gelek girêdayî karên nepenî ye û hizirên hêzê ye û sîmbola derûneke bihêz e, kontrolkirin, rîkxistina derûnê ye. Sîmbola hêz desthelatê ye lewma pitirîya siyasatmedaran rengê reş bi kar tînin di heman demê da ev rege saxletên sadeyî û lêkdana serûberî heldigirîtin. Di sînemayê da sîmbola mirovên xirab e. Herwesa rengê xemgîniyê ye lewma di taziyan da kes li ber xwe diken. Sîmbola dûmahiyê ye û destpêkirina qonaxeka nû ye (Me'abîre, 2019).

Ew kesên hez ji rengê reş diken, ew kes in ku zî bi zî mirov neşêt kesayetiya wan aşkera biketin. Ew kes in yê ku di cîhaneka taybet û tarî û girtî da dijîn û xwedî nepenî ne. Ew kes in yê ku bi karên mezin radibin û hewl diden giyanekî bidene jiyana xwe û hebûna xwe bifafrînin. Ji ber hindê piraniya kesên dîplomasî û mafya û bazirgan û sihirbend vî rengî di cilên xwe da bi kar diyînin. Herwesa ji bo fêlbaziyê jî bikardîn di ciwaniya bejn û balê da, da ku kêşa wan kêmtir û bejna wan ciwan diyar biketin. Rengê reş gelek caran bi paşayê rengan dihête navkirin ji ber taybetmendiya wî ya cuda ji her renekî dî (El-Helayqe, 2019).

1.7 RENG Û EDEB (HELBEST)

Reng yek ji alavên giring yê afirandina têkstan e, bi taybetî jî afirandina helbestê. Çünke behayekê êstetîkî bihayê hunerî yê bilind didete têkstî. Gelek ji wan rengan dibine

sîmbolên xwedan delalet û wateyên hemecur ku dibîte egerê çêjwergirtineka cuda di xwendina ewan têkstan da ku awên rengan tê da bi kar diînin. Çünke reng hebûn û bihayî didete jiyanê, eve jî rastiyeke e çünke em neşên hizir di wê çendê da bikeyin ku di jiyanê da bi tenê yek reng hebît. Eger yek reng bi tenê di jiyanê da heba em da çewa xweşiyê ji dîtina tiştan û xwezayî bînin. Eger reng li ser erdî nemînî û her tişt bêreng bimînî dê jiyan gelek bitirs û nexweş bî û wek biyabaneka xav lêhîtin û dê her tişt bêreng û bêtam bî.

Ji kevin da ta nûke reng xwedan giringiyeka mezin bûye. Di dirêjahiya mêjûyê da mirovan giringî bi rengan daye, lê ji çerxekî bo çerxekê ew giringiye hatiye guhartin. Bo nimûne bikarînan rengan li ba helbestvanên klasîk wek wateya wan ya resen ji bo saluxdan, pesin, pêgûtin û hwd. ye lê di serdemên nû û hevçerx da helbestvanan reng bi kar înayine wek xwedan gelek wata û sîmbol ku her sîmboleke xwedan wate û delaletên cuda cuda ye û bo derbirînan xwe yê edebî bi kar diînin.

Her tiştekî derdora me xwedan rengê xwe yê taybet e. Gelek bi zehmet e van tiştan nas bikin bê ku rengê wan bizanin, reng diyardeyeka çavî û bi rêka evê çendê em tiştan dinasin, dema reng bi şêweyekî dirust dikevîte nava têkstên edebî, xwendevan dê xwe beramber estatîkayekê bînin ku di nava xwe da pirî çêj û tam bî, çünke xebatên kevin û nû û hevçerx giringiyeka mezin bi rengî daye ji ber ku diyardeyeka estatîk e. Wek me pêştir gotî em neşên hizir nebûna rengan di xwezayî da yan nebûna rengan di tabloyeka hunerî da bikin bêreng. Têkstên edebî jî wekî vê çendê ye ku bê behrînin ji rengan çünke reng xwedan regezên êstetîkî û derbirînan edebî ye ku derbirîna ji dîratiyên hunerî diketin di nava karên edebî da (El-Zewahîre, 2008: 77).

Reng û edebî peywendeyka mokm û bihêz bi hevra heye. Çünke edeb li ser binyatê ziman û wêneyî dihele afirandin li wê demê di nava ziman û wêneyî da reng hene. Evê çendê jî peywendî ya bi şewazê nivîsîn û bagirewendê rewşnebîrî û edebiyê nvêserî ve heye ku çawa serederyê di gel rengan diket, li gorî cur û tîkîstî edebî. Reng rolekê mezin dibînt di rîtmî muzîk û şewazê hunerî û zanîstê delalî da, ewjî ji ber sîmbol, wata û felsefe ya li pşit her renekî heyin. evejî li gorî curê dahênana afrênerî di mînî. (Xanikî, 2011: 19)

Lewra hindek rengan taybetmendiyeke amajeyî ya pê ve hendekên dîtir jî ya sîmbolîkî, anku bikarîna rengan di helbestê da ne karekî tera û bera ye û ya bêhuşiyê ye, belê kiryareka huşdare wê bikarînanê berev siruştêkî rîtmî û harmonî ve dibet, dibête egerê guncandinekê di helbestê da.

Eger behsa rîtma rengî di têkstekê weke helbestê da bikeyin "Rengî şîyan hene bizaveka rîtmî ya karîger li dûr xwe kumv e biketin û milmilanê di gel wê karîgerya wê ji ya kêşî pitir û bihêztir e. Çünke ew kriyare vekirî û pir samane û bi renegekî êkser di gel bizava xweyatî û ezimûna huşî ve bende herwesa wek mîkanîzimeka aloz di hête hijmartin" (Nihêlî, 2005: 160-161).

Helbestvan reftarê digel rengan diket, "diyardek ji diyardeyên zimanê hozanê giringiya vê diyarde di wê çendê daye ku reng parçeyek ji ferhenga helbestvanî dihête dîtîn, ew ferhenga hozanvan ji bo avakirina hewanên xwe û ji bo berhemîna delaletên taybet di hozanê da bikartînin" (Nihêlî, 2005: 160).

Ke wate edeb bi hemî curên xwe ve ji wate û felsefe û rîtm êstetîka rengan bê bar nîne û disiyaqê têkstekê edebî da rengan rolekê giring di bînin, bi du şeweyan rasterast yan nerasterast. Yek rasterast renegekî bi kar tînin mîna rengê reş. Du nerasterast ku afirîner peyvekê bi kar tînin li pişt wê peyvê renek heye mîna esman ku rengê şîn e û li pişt çend sîmbol û watayên taybet hene.

Ji ber hindê reng bûye zimanê hunermendê nîgarkêş û zimanê edîban, her yekî ji wan rêka xwe ya taybet heye di bikarîna rengan di dahênanên xwe da. Çünke edîbê dahêner û xwedan begrewendeke rewşenbîrî, reng di helbestên xwe da bi şeweyekî wako muzîk û rîtm bi kar dînin, ji ber hindê ji bo hunermendan reng ew maddeyê boyaxiyê diyar e (Weysî, 2014: 13). Edîb jî di penayê bete ber bikarîna rengan di têkstekê xwe da ji bo afirandina têksteke xwedan estatîk û pir ji sîmbolan. Têkstekê reng tê da pitir nêzik e xwendevanî dibît çünke derbirîna ji serborên mirovayetiye diket bi rêkekê bandora xwe li ser hestên xwendevanî biketin ji peydakirina hestên xweş yan nexweş çünke dibît êk reng gelek wateya bidetîn li gorî şewazê derbirîna nivîserî û her mirovekî li gor bandora wî rengê destnîşankirî li ser awî kesî. Bo nimûne li dema hebûna rengê sor di nava têkstî da,

dibît ew reng li ba xwendevanekî sîmbola xweşî û watayeka evîniyê bidetin û hestên wî yên romanisî biazirînî û bandoreka baş bikete ser. Belê dibît li ba êkê dî wateyeka nexweş û xwîn û qurbanîdanê bîtin û derûnê wî têk bidetin. Ku wate her kesek li gor sebr û têgehiştina xwe wateya û delaleta ewî rengî digehîtin.

Xweya ye reng ew kanîk e ya ku nivîser hêza xwe ya erênî jê werdigirîtin. Çünke evro reng di helbestê da ji bilî wêneyê helbestê ku li ser meydana nivîsînê xwe sepanî ye. Çi di helbestan yan karên romanî jî da. Li nav xwe û derveyî xwe helgira gelek tabloyên wêneyî rengên e çi bi rengên dîtî yan peyv bin.

1.8 TAYBETMENDIYÊN RENGAN

Bi rêya taybemendiyên rengan dikarin bizanin ka reng çi ye. Giring e me pêzanîn û agehî li ser rengan hebin û cihê pîtedan û giringiyê bin li ba me çünke di pitirîya biwar û karên rojaneyên jiyanê em pêdivî bi rengan dibin. Lewra diêtin agehiya me baş li ser kar û bandora rengan hebît. Bo nimûne li dem bikarînan rengên goncayî di karekî edebî yan hunerî da yan karekî endazyarî û zexerefeyî da divêt bikarînaneka dirust û lihevhatî bîtin. Çünke eger bikarînan me bo rengan ya ciwan lihevhatî bît dê bîte cihê xweşiyê ye bo hestê dîtî, dîsan jî dê çav xweşiyê bînî. Belê li dema şaş bikarînan van rengan dê bandorên nebaş li ser hestên kesên bîner hebît dê bîte cihê nerehetiyê bo derûn û çavên wî.

1.8.1 Nejadê Rengî (Hue)

Navkirina rengî ye bi alîkariya vê yekê em dişên cudahiyê bêxîne di navbera rengan da û renekî ji renekî dîtîr cuda bikin. Ji ber ku ew ronahiya ji jêderê rengî derdikevîtin bo me aşkera dibîtin ka eve kîjan reng e ka sor e yan kesk e. Ji ber hindê jî wateya rengê "boyaxa rengî" xwedan watayeka rastî ye ku hemî kes li ser rêkeftine û razî bûne (El-Ebadî, 2019).

Her renek xwedan saxlet û navê xwe yê taybet e ku bi rêya wê dişên van saxlet û taybetmendiyên rengan ji hev cuda bikin. Bi rêka navkirina rengan mîna rengê sor, zer,

kesk û gelekên dî ku amajê bi wî rengî bidin ka çi reng e. Em dişên vê sîfetê bi guhêrîn bi tîkelkirina rengan mîna rengê sor digel rengê zerî dê bo me rengê pirteqal dirust bîtin bi vê çendê dê sîfet û nîşana wî rengî hête guhartin.

1.8.2 Bihayê Rengî (Value)

Pileya rengî, ew saxlete ye ya ku pileya rengî diyar diketin ka kîj reng zelal e û aşkera ye û kîjan tarî ye û nediyar e yan bêhêz û tîkel in. Ji egerê bandora ronahiyê li ser rengî bi xwe pilaya wî derdikevêtin dizanîn ka ev renga vebûyî ye yan girtî ye û em bixwe peyva rengên vebûyî û girtî bi kar tînin bo nimûne dibêjin sorê vebûyî û sorê girtî. Her yek ji van raman û wateyan bandora xwe li ser saykolojî û derûnê mirovî heye. Li gor qebara tîşka ronahiyê dimînin. Bi watayeka dîtir qebara rengî ji spî bo reşî herwesa bihayê rengî têrbûna rengî ye ji ronahiyê. Bi wê ronahiya geş yan ya tarî, yan jî bihayê renekî zelal ji renekî dî yê zelal ku li tenişt renekî dî yê zelal di bazneya rengan da (El-Ebadî, 2019).

1.8.3 Hêza Rengî (Saturation)

Bi ramana hindê dihêt qebara zelalî ya rengî û tariyatiya rengî, çunke reng dê zelaltir bît dema ew renga yê zelal bît û vala bît ji tîkelkirina renekî dî digel wî rengî diyarkirî. Em dişên bibêjin ka ev renga vebûye yan tarî ye nîşana pileya rengî didetin yan nêzîkbûna wî ji rengê spî yan rengê reşî (John, 1997: 33). Bo nimûne eger reng ji çavî nêzîk bît dê zelal û aşkera bîtin belê eger ji çavî dûr bît zelal û aşkera nabîtin çunke dê renekî dî kevîte di navbera wan da dê bîte egerê nezaniya hêza wî rengî û dê bi zehmet bît nejadê wî rengî bi dirustî bizanîn. Reng di hemî hêza xwe ya siruştî da, dê hermînin renekî siruştî çunke peyva reng bigiştî rengên zelal dete berçavên me. Di rengan da gelek guhartin dikevine ber çavên me (El-Se'dî, 2019).

Sê rêk hene ji bo bihêzkin û bêhêzkinina rengî

1- Kêmkirina hêza rengî, ku ew jî bi rêka nejadê rengiyê dirust e digel rengê spî, bi vê yekê dê reng vebûyîtir yan zelaltir lêhîtin.

2- Kêmkirina hêza rengî, nejadê regekî diyarkirî digel rengê reş ku dê ew reng tarî bît yan dê hêza wî kêmtir lêhêtin. Yan pileya rengê wî dê bîte regekî tarî û girtî.

3- Kêmkirina hêza rengî, nejadê regekî diyarkirî digel rengê xwelîkî risasî ku dê ew reng tarî bît. Yan dê hêza wî kêmtir lêhêtin yan dibît bêjin ev rege yê dirust e yan tarîtir e yan vebûyîtir e (El-Se'dî, 2019).

1.9 PIŞKÊN RENGAN

1.9.1 Rengên Serekî û Neserekî

Mebest pê ew rengên êkemîn di nav rengên keskesorî da ku ji çî rengên dî pêk nahên. Ji rengên "sor, zer, şîn" em dikarin hindêk rengên dî jê peyda bikin. Ku wate bi têkelkirina du rengên serekî dikarin regekî dî jê dirust bikin. Bo nimûne bi têkelkirina rengê sor û zer rengê pirteqal dirust dibîtin yan ji rengî şîn û zer rengê kesk dirust dibîtin û rengê sor û şîn rengê binefşî jê dirust dibîtin (Balayî, 2008: 24).

1.9.2 Rengên Sar û Germ

1- Rengên germ pêk dihêt ji rengê sor, pirteqalî û zer, rengê sor berinyas e ku rengê xwînê û agirî ye û agir jî jêderê germê ye ku jiyanê germ diket (Al-Herstanî, 1998: 68-69).

2- Rengên sar: Kesk, şîn, binefşî, rengên nêzîkî wan jî sar in. Bo nimûne li dema dîtina rengên sar mirov hest bi teziyatiyê diketin mîna rengê esmanê şîn û ava deryayî ya şîn (El-Herstanî, 1998: 69).

1.9.3 Rengên Bêlayan

Ji rengên spî û reş û xwelîkî "risasî" pêk dihên: Bi têkelkirina rengê spî û reş rengê xwelîkî dirust dibîtin. Dîsan jî rengê spî û reş du rengên hevdiş in, spî rengê ronahiyê ye û reş rengê tariyê ye, çunke rengê reş hemî ronahiyê dimêjît û rengan dikujît (Muhemed, 20019).

2 PIŞKA DUYEM

SÎMBOLÎZMA RENGAN DI HELBESTÊN EMÎN BOTANÎ DA

Em dê di vê beşê de ji du riwangehan sîmbolîzma rengan li ser helbestên Emîn Botanî praktîze bikin : 1. Riwangeha helbestan 2. Riwangeha mijaran.

Di praktîzekirina yekem de em dê ji dîwana helbestvanî çend helbestên nimûneyî bineqînin û mijarên teorîk ên rengan di wan helbestan de analîz bikin. Di vê beşê de me ji dîwana Botanî deh helbest hilbijartin ku ev di nav hemû helbestên wî de herî zêde bi temaya rengan derdikevin pêş. Navên van helbestan li jêrê hatine destnîşankirin:

1. Helbesta "Xemsarî"
2. Helbesta "Kesk û Sor"
3. Helbesta "Dê Gehîn"
4. Helbesta "Roja Kurdan"
5. Helbesta "Man"
6. Helbesta "Veresiyana Brahî ya"
7. Helbesta "Rêkeftiname"
8. Helbesta "Helebçe"
9. Helbesta "Pirsiyar"
10. Helbesta "Merg le Tabloyêkî Awî da"

Di praktîzekirina duyem de em dê li gor mijarên teorîk dabeşkirinekê bikin û daneyan ji helbestên Botanî di wan de bi cih bikin. Bi vê şêwazê armanca tezê bi taybetî di vê beşê de dê bê bidestxistin.

2.1. JI RIWANGEHA HELBESTAN VE

2.1.1. Helbesta "Xemsarî"

Di evê helbestê de helbestvan bi dilekî melîl û peyvên xemgîn şiyaye derbirînê ji hestên xwe yên şaîrane biketin. Ku ew hestê heyî ji bo mirovayetiye taybet ew takên ku ji bê desthelatiya xwe bê behir dibin û ji mafên jiyanê.

Peyvên vê helbestê hatîne xemilandin bi rengê reş wate helbestvan şiyaye ew wêneyên di nava evê helbestê da heyî bi reşatî derbibirîtin. Dîsan helbestvan bas li cegerê diket ku bi rengê reş wêne kiriye û têkeliyek di nava rengê reş û rengê şefê da kiriye û bi rengê şevê salox daye.

Lewra bikarînana rengê reş ji bo derbirînê biketin ji ewan nexweşî û wê derdeseriya Kurdan dîtîn bi destê rijêma kevtî ya zordar ya Be'sa Îraqê dîtîn, ku hemî rêk digirtine ber ji bo nehêlana milletê kurd. Lewra jî helbesta xwe bi rengê reş xemilandiye ku kiriye sîmbola mirin û nexweşiyê.

Bûyer trajedî ye, lewma helbestvanî pena biriye ber rengê reşî. Eve jî girêdayî rûdanê ye û rengvedana civakî û kevneşopiya helbestvan tê da dijît lê diyar e. Reşbînî di helbestên Botanî da gelek zal e, lewma ciwaniya reşî kiriye sîmbol ji bo kabus û ehrîmen û dîmenên trajediya kirîn e cergreş û rengê şevê reşe. Di navbera riyalîteyê û derbirîniyê de pena biriye ber sîmbolîzmê di rengan da.

Heçiyê di bînim

Dibînim yê

Kovan û cergreşiya xo

Bi rengê şefê reş diket û

Bo xo dînvît.

Heçiyê dibînim

Dibînim yê

Canê xo bigirinişînekê

Êwil diket û

Bo xo dimirît (Botanî, 2017: 346).

2.1.2. Helbesta "Kesk û Sor"

Her dem me Kurdan gileyî ji xwe kiriye, ku em giringiyê bi xwendinê nadeyin û me xwendevanê xwe nebûye. Ji ber hindî jî Botanî ev helbeste li ser evî wêneyî dariştiye.

Di evê helbestê da Botanî gelek sîmbol bi kar înayine. Ji wan jî dema bas li pirtûkê diketin ku pirtûk bi rengê sor û qelew salox daye. Di riyalîti da çi pirtûk nînin bi evan saloxeta lewra dişên bibêjîn pirtûk mîna gayekî sor û qelew salox daye.

Mebest bi gayekî qelew jî ji kevin da di kulturê gelan da ga sîmbola karkirin û xebatê ye. Di jiyana destpêkî da alavekî karkinê bû li nava zeviyan û kar û barên çandinê dihate bikarînan. Her dîsan çi dema ew ga pîr di bo dihate serjêkirin û dihate xwarin. Ku wate mebest ji kitêbeka sor û qelew ew pirtûk e di jiyanê da li nûke û di paşerojê jî da dê mifay gehînte xwendevanê xwe. Dîsan jî pirtûk jî alavek e ji bo lêk têgehiştinê di navbera gelan da. Ku mirov bi rêya xwendinê dê bîte xwedan jiyaneka xweş lewra rengê kesk bi kar înaye wek sîmbol ji bo jiyanê.

Sîmbolîzma rengan ber bi siruştî û derbirînê biriye. Rengê sor di evê helbestê da kiriye sîmbola başiyê, xêr û bereketê. Rengê zer jî mebest pê ew e dema dibêjît xwendevanê zer û lawaz ku sîmbol e ji bo lawaziya Kurdan di biwarê xwendinê da ku heza xwendinê nîne. Ku wate di evê helbestê da Botanî giliyê ji milletê xwe diketin ku giringiyê bi xwendê naden. Rengî kiriye sîmbol ji bo jiyanê.

Dîsan ji layê lihevhatina rengan di estatîka wêneyê evê helbestê. Yekem car rengên sereke amade kirîne û kirîne hêvîyê helbestê wekî şewekarekî berî dest bi rengkirina tabloyekê biket. Ew jî kesk û sor û zer in, herweha ji bo serkeftina aliyê ronahiyê rengê şîn ku peyva asman bi kar aniye ji bo hevrikiya li hemberî tariyê ku rengê reş e. Ku bi evê çendê bişêtin jiyana mirovî ji nexweşî û tariyê berev xweşî û ronahiyê bibetin.

Ev yeke jî şarezaiya helbestvanî di şêwekarî da nîşanî me didet. Wekî berî nûke me daye xweyakirin di qonaxên jiyana hunerî û nivîskariya rojava da ev peywendiyê berdewam bû. Ronahî û tîrojên rojê ji bo rengan bi kar înayine. Weku helbestvanî dizanî bê ronahî reng xweya nabin lewma hêvênê rengan ji tîrêjan digirî û dixwazî rengê tarî wenda biket.

Kitêbeka sor û qelew

Xwandevanek zer û lawaz,

Evrê rêzkên kitîba bi xen,

Ta spêdî birwîsiya bêjn.

Ta êvarî rondika birrêjin,

Ma tu nabêjî

Ew kesk û sora me divêtin

Konê xoyê koçer û reş

Li kîj asman û enî veden (Botanî, 2017: 450).

2.1.3. Helbesta "Dê Gehîn"

Her dem helbestvan kesên hestnazik û zû bi zû hest bi xem, jan û derdeseriyên milletê xwe diken. Lewra jî ew wek rênîşanderan e rêke çareyan bo arîşe û nexweşiyên me dibînin. Lewra jî Botanî xwe dikete rênîşander.

Di vehandina evê helbestê da Botanî viya ye bi şêweyekî ciwan û xemleka rengên derbirînê ji xeyala xwe biketin. Lewra ji hindek parçeyên wînan wêneyekî helbestê yê giştî dirust diketin. Ku ew hêviya helbestvanî heyî viyaye bi afirandina hindek hestên nazik peyvên balkêş mebesta xwe bigehînte wergirî, ew peyama heyî bo xwendevanî ron û aşkera bîtin.

Hind caran dîmenên xwezayê di hebûna hestên helbestvanî da dibine dîmenekî ciwan û di çarçoveya armanca ew li hêviya wê, di hestên xwe yên veşartî da dibînit. Lewma di ferhenga peyvan da wêneyên rengên jî têne dîtin. Ew wêneyên mîna tabloyekî hunerî pêşkêşî xwendevanî diket.

Xweya ye sîmbol di helbesta "Dê Gehîn" rûyekî geş e û kiriye binaytê helbesta xwe li ser bivehînît. Weke çawan xwastiye jiyaneka nû yan jî rewşeka nû dirust biket li gor ew xeyala di serê wî da heyî rengê ji xirab bo êka baştir. Botanî rengê şîn bi kar îname xweya ye ku rengê şîn sîmbola xêr û bereketiyê ye çunke di evê helbestê da helbestvan bas li rengê şînê vebûyî diketin dema dibêjît "deryayek şîn" ji ber ku rengê deryayê hemî gava bi rengê şînê vebûyî ve dihête girêdan. Rengê şîn sîmbola hindek ramanan e weku zelalî, safiya û roniyê ye. Rengek e me dibete cîhana paqijî û zelaliyê. Dîsan helbestvanî wek sîmbol ji bo hêviyan bi kar îname bi saloxdana xemên hejaran ku hêviya rewşeka baştir.

Helbestvan Botanî stranên vegera xweşiyê bo deryayên dîn dibêjîtin. Ew dizanît ji helma bêdengiya deryayên xemgîn ewr çêdibin û dizanît ji ewran baran dibarît û jiyan bi keskatiyê dixemilît. Lewma wê hêviyên xemgîn ji jêderê sereke ku xeyal û hest û hizirên xwendevanî dûr birîne, wî neviyaye her tiştî wek xwe nîşa me bidet em ber bi hizirkirinê birîne da bigehîne rastiya wê, ew jî gehandina jiyanê diket. Reng di wêneyê helbesta Botanî da derbirîne ji derûnê wî wek pirekê ye bo derbirîna wî ya hundirîn. Helbestvan şarezayê derbirîna rengan e, lewma bi hesteka hunerî û helbestî reng bi kar îname.

Dîsan dubarebûna peyvan di evê helbestê da kê ji ber ku bi şarezayî û di xizmeta ciwaniya helbestê da bi kar îname. Mirov hest bi nexweşî yan kêmasiya vê dubarebûnê naket. Ji egerê evî dubarebûnê rîtim û ciwanî di cihê xwe da bi kar hatiye, lewma di navbera dubarebûn û wêneyan da reng xwe dibînin.

Dê zîmanek nûiy vehînm

Ji kenî û mîzgînî û stirana

Asmanekê dî nijînm

Ji bilbil û stêr û barana

Dê derya yek dî vejînm

Bo gemiyê van dost û yara

Dê rêkeka dî vebînim

Bo wexerê min hejara

Zimanek vîn

Asmanek şîn

Deryayek dîn

Rêkek berîn

Em dê gehîn.. (Botanî, 2017: 190).

Dîsan di dirêjîya vê helbestê da demê helbestvan bas li govenda sor diketin. Helbet rengê sor sîmbolên baş û xirab di hundirê xwe da dihelgirîtin. Sor yek ji wan rengan e ku germê, livîn, tamê didete jiyanê. Dihête hejmartin rengê gencan lewra dema helbestvan dibêjîtin "Newroz li hîviya buharê ye, govendeka sor bo bi ketin" mebest pê newroz li hîviya buharê ye da ku berev rewşeka nû ve bibetin weku qortalkirinekê ye ji rewşekê bo êka dî. Xweya ye ku bikarîna peyva buhar ku werzê buharê ye yek ji wan werzan e, dihête naskirin bi ciwaniya xwe û werzê vejînê ye çunke her tişt tê da xemla xwe diketin. Xweza bi rengê keskekê vebûyî balkêş dihête xemilandin gul giya di evî werzî da şîn dibin heta ku demên şev û rojê tê da wekhev dibin. Lewra bikarîna helbestvanî ji peyva biharê qortalbûna rewşekê ye, ji dil tengiyê bû êka bêhnfireh. Helbet mîna li piştî werzê zivistan yekser werzê biharê dihêtin ku zivistan bi dijiwariya serma û baran û berfê navbang e yekser piştî wê werzê biharê dihêt, ku jiyan ji rewşeka saxit diçîte rewşeka baştir.

Di evê helbestê da helbestvanî rengê sor du caran bi kar îneye carekê wek sîmbol ji bo xweşî û hêviyeka nû. Carekê jî sîmbol ji bo hêz desthelatîbûnê bi kar îneye. Dîsan li dema dibêjîtin "Agir ekê sor tir hlînm" wek sîmbol ji bo hêz û ektêfbûnê ye. Çunke rengê sor rengê agir û hêzê ye. Hindek caran bandorên nebaş dikete ser derûnê mirovan. Dîsan jî rengê sor sîmbola agir û xwînê û qurbanîdanê ye çunke li dema şeran, meydanên şeran pir dibin ji agir û xwînê.

Çiya li hîviya pesarê ye

Maçêt nêgîza bo bi bet

Newroz li hîviya buharê ye

Govendeka sor bo bi ket

Dê nêgîzeka dî çînm

Bo biskên zerî û esmera
Agirekê sor tir hilînm
Bo hinavên dagîrkera
Zimanek vên
Asmanek şîn
Deryayek dîn
Rêkek berîn
Em dê gehîn (Botanî, 2017: 191).

2.1.4. Helbesta "Rojê Kurdan"

Helbestvanî peyva (rengîn bûye) di evê helbestê da bi kar aniye, eve zanabûn û şarezaya helbestvanî di ezmûnên hunera helbestê da. Mîna tabloyekê şêwekarê cîhanî *Pablo Picasso* nîşanî me didet. Helbet nimûneyên di xeyala helbestê da bi kar hatîn ew bi xwe dîmenên wêneyan e, lê xistina berêk ya van wêneyan tabloyê helbestê bin didet xweyakirin û bala me dikêşît. Ji elinda spêdan, ji tîrojên rojê, ji nexşê perên belatînîka û çavên reş û kutirên spî rastewxwe yan nerastewxwe tabloyeke yekgirtî ji peyv û wêneyan di hestên me da xwe dibînin. Huner hestkirin e bi ciwaniyê û xweşiya hundirîn, peywendiyeka rastewxwe bi jiyana mirovî ve heye li ser vê jî *Kant* dibêjît: "jiyan ji afirandinên mirovî ye".

Ciwaniya karekî hunerî afirandinên hunermendî pêk hatibît, cuda ye ji wê ciwaniya xwezayî ya em rojane dibînin. Eve ciwaniyeke di navbera hestên hunermendî û siruştî da. Di berdewamiya karê hunerî da ciwaniyek bi peyvan yan bi rengan tê afirandin. Ev ciwaniya wijdan û hestên hunermendiyê. Taybetmendiyên wêneyî di helbestê da hind cara peyv li destpêkê yan li dawiyê dubare dibît û wêne bi vî madidê taybet tê xemilandin. Sîmbolîzma helbesteka berxwedanê bi siruştî û welatî ve girê didet.

Hertşit, her der, rengîn bû ye
Tu bixêr hatî bo warê serfrazî
Dilê me hevaltî û dostî
Avedanî û bihevreyan çî bixwazî (Botanî, 2017: 197).

Hindek caran jî wek ciwaniya formekê bi şeweyê rengên zexirefeka lêkdayî bi kar îname û keske sor bi heft rengên xweve kiriye kirasê ciwanê evîna welatê xwe. Weke deyndarê evîna welatê xwe dibînît û pena dibete ber hêvî û xeyalên rengîn.

2.1.5. Helbesta "Man"

Her dem mirovan hez heye bo estêran û heza sehkirina estiryan heye. Yek ji sîmayê estêran spî û geşdar in. Lê Botanî rengê şîn bi kar îname û stêr bi rengê şîn xemilandî ne, ku şîn kiriye sîmbol ji bo hêvî û armancên xwe. Reng li ba helbestvanî wek xwe nehêlayine û sîmbolîzma rengan ber bi siruştî û derbirînî bîriye. Reng ne xweche dihête guhartin li gorî têksitê. Lewra hindek caran reng û dîmenên xwezayî di hebûna hestên helbestvanî da, dibine dîmenekî ciwan û di çarçoveya ew hêviyên ew li bendê û di hestên xwe yên veşartî da dibînît. Lewra di ferhenga peyvan da wêneyên rengîn dihêne dîtin. Ew wêne weku tabloyekî hunerî yê rengîn pêşkêşî xwendevanî diket.

Di sîmbolîzma rengan da, rengê şîn gelek raman û sîmbolan bi xwe ve digirîtin. Ev çende jî li gor pilaya tariyatî û vebûna evî rengî ye. Ji ber ku şîne tarî nêzîkî rengê reş e, ku bandora xwe heye rengê neviyan, êk û du qebûlnekirinê û diltariyê ye digel yekrengê şîne vebûyî taybetmendî û giringiya xwe hebûye di kevneşopan da û ta serdema nû jî giringiya wê maye, ji ber ku rengê deriya û esmanî ye ku bandoreka rasterast li derûnê mirovî diketin taybet li dema rengê asmaniyê zelal bîtin. Lewra Botanî ji bo derbirîn ji hizirûbîrên xwe. Rengê şîn bi kar îname û kiriye sîmbola armanceka diyarkî û hêvî û umêdên xwe.

Eve asman

Ka çavên kê berî yê dî

Tijî stêrên şîn dibin ?

Eve zevî

Ka destên kê berî yê dî

Sewk û nêrgiz lê şîn dibin ?

Kadê were

Da bifrîn,

Hinde asman li cihê xoye û

Estêr helin (Botanî, 2017: 142).

2.1.6. Helbesta "Veresiyana Brahî ya"

Di evê helbestê da Botanî hîç renek bi kar neînaye bi tenê peyva renek bi kar îna ye. Ev jî dewlemendiya ezmûna helbestvanî di biyavî vehandina helbestê da taybetî di biyavî bikarîna rengan ew boye ku peyva "Reng" bi kar îna ye bê diyarkirina kîj rengî. Lewra jî dibît di ewan cihan da armanc pê aşkerakirina xewn û xeyalên helbestvanî bi xwe ye. Yan jî Botanî xwestiyê asoyeke vekirî li hemberî xwendevanî hêliye. Ku xwendevan li gor hez û armanca xwe renekî li gor aydolojî û têgehiştina xwe bihelbijêrît ke wek helbijardina qedera xwe.

Bo nimûne di renga di helbijardina rengê şîn da bibîte xwedan paşeroj û jiyaneke pirî hêvî û omêd yan helbijardina rengê spî ku sîmbola aşitiyê ye bibîte xwedan qederk run paqij. renga Botanî di evê helbestê da mebesta wî ew bît ku heryek li gor hizr û buçûna xwe qedera xwe di helbijêrît. Raste kes neşet qedera xwe bi guherît. Belê ptirya caran paşeroj û qedera mirovî di destê mrovî daye. Lewma demê mirov karên baş di helbijêrît di biwarekî da başyê diket, başî di hîte rêya mirovî û paşeroj û dahatyê mirovî baş dibît. Belê beruvajî vê yekî demê mirov xelet helbjartinê diket evca di her karek û biwarekî dabît, jîyan û paşeroja mirovî nexweş dibît û ji hemû layekî vî têk diçîtin.

Hê ê yi zebunoooo..

Pirsiyarên xo

Negehîne dinya û axiretê,

Tu li berizexa gumanê dûr nekeve,

Badeya kevinar belav bike û

Xo dahêle binê

Kanîka herî kûr

Xo berde diqonaxa

Herî çetin

Herî dûr,

Çavên xo bigire û

Bîbîkên xo dane ser renekê,

Guhên xo bigire û

Ezimanê xo dane ser herfekê (Botanî, 2017: 23).

2.1.7. Helbesta "Rêkeftiname"

Di evê helbestê da helbestvanî viyaye huşdariyekê bidete desthlatdarên xwe bi rêya bikarîna peyva "înzara sor". Her cengekê rû bidetin derencamên wê dibine wîrankirin, kuştin, derbederî htd.. lewra di rûdana cengen da baca giran dikevîte li ser milên takê welatê, ku zeremendên êkê ji her şereke gel û hawlatiye.

Lewra Botanî bas li hindek tiştên sade û giring yê jiyanê diket ku şer dibine egerê têkdana wan hemî xweşiyên mîna dîtina evîndaran bo êk û du. Yan jî renga mebesta helbestvanî li dema dibêjî "wê rojê ne teyîrek firî" mebest pê azadiya her kesekî jê dihête standin. Lewra şer di berjewendiya çi layekî da nîne bi tenê rêka yekane ji bo xweşî û berdewamiya jiyana asayî, aştî ye, qebûlkirina hev e.

Lewra bi rêka bikarîna rengê sor huşdariyê didete her layekî, ku li vîrê helbestvanî rengê sor wek sîmbola huşdariyê û bi kar îname û taybet ku ew huşdariyê dawî huşdarî ye. Wak di yariyên tepa pêyan da karta sor bi kar di înin bo yarîkarên xeletiyên diken ku ji ewê yariyê dihêne dûrê kirin.

Sor sîmbola huşdariyê û metirsiyê ye, bo nimûne golopa sor ya trafîkê dema sor dibît nabît mirov derbazî aliyê dî bîtin ji ber ku metirsî li ser mirovî heye. Lewra ew sor e huşdariye ku divê mirov rawestî û derbaz nebîtin.

Herwekî me gotî rengê sor di evê helbestî da sîmbola huşdarê û rawestanê ye li ser encamdana ewan karan. Ku amajê dikete li ser qedexekirina û encamdana ewan karan. Ku ew kar ajaw e û ceng e, ku evê yekê bandora xwe kiriye li ser jiyana normal û sade ya kesên civakî. Ku ew cenge dibine rêgir li ser jiyana wan ya siruştî ku amaje kiriye evîndara ku hatîne qedexekirin û bê barkirin ji dîtin êk û du.

Sor renekî bihêz e her dema me guh lê dibît yekser bandora xwe ya bihêz dikete ser derûnê mirovî. Sîmbol û ramana evî rengî ji kesekî bo kesî cuda ye. Lewra dibîtin bikarînana rengê sor di avê helbestê da kirbîte sîmbol ji bo du ramanên cuda. Êk wek rawestan û ne berdewamî li ser vî karî. Du dibît kirbîte ramana xwînê û qurbanîdanê. Çünke derencama her şerekî helbet kuştin û qurbanîdan e. Di pitirîya civak û ayinan da rengê sor peywendiyeka mukim bi xwînê ve heye. Lewra Botanî peyva înzara sor bi kar înaye li şûna înzara zer.

*Şerrker di înzara sordabûn
Seyrangehên bajêrî jî kirbûn çeper,
Wê rojê ne teyrek firî
Ne aşqek çu jivanê,
Ez û hevalêt xo rijd bûyn
Me xo karkirin çuyin seyrane.
Heyamek çû
Peymana aşitiyê înzakirin
Ez ji mala xo derinekeftim,
Aqîbet teqêt xoşiyê
Peyasek bi min danekirin
Heta nexoşxana gişitî.. (Botanî, 2017: 459).*

2.1.8. Helbesta "Helebçe"

*Helebiçeyî kurd
Erşî nehametî kewne,
Helebiçeyî kurd
Brînî em topele zewye keskeye ,
Helebiçeyî kurd
Ferşî qiyametî xewne (Botanî, 2017: 427).*

Di sedsala bîstan da gelek welatên gelek neteweyan hatine topbaran weku bajarê Hîruşîma û Nakazakî û Helebçeya şehîd. Bextreşîya kurdan e ku şarekî wan ketiye ber

lihimişita dirindan bêguman ew dirinde jî rijêma Be'sa Saddam Hussein. Li 16-3-1988 bajêrê *Helebçe* bi çekê kîmyayî yê qedexekirî bi destê rijêma Seddamî ya gor be gor hate topbarankirin.

Evê rûdanê jî naxê her kurdekî şewitand. Bi taybetî helbestvanên kurd ji her kesekî pitir dilê wana hatine şewitandin çunke helbestvan pitirî her kesekî hestnazik û mirovdurist in. Her helbestvanekî bi rengêkî derbirîn ji evî karesatê kir.

Botanî jî ew êş û azara di naxê wî da bi rêka vehandina evê helbestê şiyaye çendekê ji mergesata bajêrê *Helebçe* pîşanî me û hemî dinyayê bidetin.

Herwesa helbestvanî evê guya zemîna mirov tê da dijîn salox daye bi rengê kesk. Ku sîmbol di evê helbestê da rûyekî geş e û sîmbola her rengêkî li cihê wî danaye. Rengê kesk jî di sîmbolîzma rengan da, di mijarên saykolojî da rengeke ku yê peywendîdar e bi jiyanê ve herwesan sîmbol e ji bo despêkên nû dîsan jî sîmbola "tendrustiyê, xweza, hêz, ektîvbûn, başî û aşitîyê" ye. Dîsan jî ji bo hejêkirinê, çunke her tiştekî kesk bîtin zîka diçîte di dilê mirovî da mîna dar û bar û xwezayê.

Dîsan kiriye sîmbola mane veya nîşê mirovan, çunke di koka xwe da rengê kesk sîmbola jiyanê ye. Belê hinde huv û dirindan naxwazin ji bilî wan kesek mifayê ji vê jiyana serguya zemîn werbigirin, mebest pê rijêma Be'sa faşîst e.

Lewra jî helbestvan bi rengê reş derbirînê ji evê mergesata nax hejîn diketin û dîmenan bi reşî reng diketin. Bikarînana rengê reş di derbirîna hestê xwe yê pirî azar, çunke di saykolojiyê da bandorên nerênî hene li ser derûnê mirovan.

Helebiçeyî kurd

Siyekanî

Em ba û esmane teskeye,

Pênc hezar gol

Lem azare reng çîmene,

Heşit hizar dil

*Le reşitaleiy em dîmene,
Sed û heşita û dû hezar ser
Rohî nemanî beheşitman
Desûtên be payzî merg
Le xltanî em şiywene (Botanî, 2017: 428).*

2.1.9. Helbesta "Pirsiyar"

Di evê helbestê da helbestvanî balinde kiriye kerestê helbesta xwe. Balinde jî bi xwe yek ji wan bûneweran e ku heza firînê li asmanan heye. Di evê helbestê da ev balindeyê firok ku heza firînê li asmanê goya zemîn heye da bişêtin li bilindtirîn xal bi azadane temaşeyî siruştî biketin. Di binyat da balinde her dem sîmbola azadiyê û hêzê ye. Lewra Botanî balinde bi kar îname wek sîmbola azadiyê.

Dîsan jî cudahiyeke di navbera mirov û balindeyan da kiriye xweya ye ku balindeyî eql nîne lewra helbestvan dibêjît "ku wan asman wî kirî ye" lewra helbestvanî wesa daye diyarkirin ku ew nizanin rêka xweya rast helbijêrin. Belê mirov cuda ne ji wana mirov xwedî eql e, lewra divît mirov rêkên baş û dirust bo xwe hilbijêrin.

Di sîmbolîzma rengan da rengê şîn sîmbola hêvî û paşeroja geş û piştbestinê li ser şiyarên xwe. Botanî sîmbola her rengê li cihê wî danaye ku asman bi kar îname beguman pitirîya caran asman dema yê zelal bîtin rengê wî şîn e. Lewra mebest wî pê ku balinde nîşana hêz û azadiyê ye, ku her tiştek azad û bihêz bîtin dişêtin bo xwe jiyaneke pirî hêvî û xweşî peyda biketin. Belê amaje kiriye hindê ku emsan miriye merem pê eger xu ew jîngeh û barûdaxên mirov tê da dijîtin çend xirab û ne harîkar bin divêt mirov destan nedahêlît û xwe radestî barûdaxan neket. Rêka xwe jî wenda neketin bi tenê divêt mirov yê bihêz bîtin û ji rewşên xirab berev rewş û armancên baş ve bibetin.

*Ez nizanm
Ger balinde bi şeplîve
Li asmanê şîn bîfrin
Ku wan asman wî kirî ye*

An jî asman yê mirî ye! (Botanî, 2017: 347).

2.1.10. Helbesta "Merg le Tabloyêkî Awî da"

Di hundirê xwe da rengê şîn hilgira sîmbolên erênî û nerênîyê ye li gorî pila rengê xwe. Herwesa sîmbol di evê helbestê da rûyekî geş e û helbest pê ava kiriye. Sererayî wateya erênîya rengê şîn lê wateyên hevdiş jî hene ku delaletê ji tirs û dudilê dîken. Di evê helbestê jî da helbestvanî rengê şîn kiriye sîmbola tirs û nerehetiyê. Ku xem bi kûratiya deryayê û bi rengê şîn salox daye. Ku ew laşê wî yê di nav xem û kovanan da hatiye xeniqandin.

Dişên bibêjîn jî kiriye sîmbola tirsê ji bê çareserî û nezanîna dahatiya rojên jiyana xwe. Helbestvanî rengê şîn kiriye alavek da ku bişêtin bi rêya evî rengî derbirînê ji hestên xwe yên nexweş biketin. Di binyat da rengê şîn sîmbola hêviyan e, dişên bibêjîn jî kiriye sîmbola tirsê ji bê çareserî û nezanîna dahatiya rojên jiyana xwe.

Raste derya ciwan e belê eger berê xwe bideyine rûyê deryayê, çend aram û li ser xwe û nerm diyar diketin wekî parçeyê qumaşekî armîşî ku derbirînê ji aşitiyê û tenahiye diketin. Belê ev ruxsarê aram û tena çendîn nihênî û hevrikiyên man û nemanê di hundirê xwe da veşartîne. Di kûratiya deryayê da giyanewerên bihêz giyanewerên bêhêz dixwin ku hevrikiyên man û nemanê dîken. Jiyan jî weku deryayê ciwan û xweş e belê gelek caran mirov tê da wenda û bê hêvî dibît. Lewra serkeftin û xweşî û mana di jiyane da pêdivî gelek pêkol hewldanê ye ji bo hevrikiyên man û nemanê, da ku mirov berdewam bîtin li ser jiyana û rêya dirust, divît mirov gelek nexweşî û zehmetan bibet, mirov nagehîte çî armancan bê zehmet û qurbanîdan.

Lewra divît hemî gavan mirov yê bihêz bît çunke eger mirov bêhêz bû û keft dê bîte xwarin bo kesên bihêztir ji mirovî. Mîna ew masiyên di deryayê da dibîne xwarin ji bo masiyên bihêztir û dîsan weku Botanî diyar kirî bu balindeyên Newres.

Leweteyî min û neweris û

Lim û şîniy deryakan heyin

*Bediway şepolê radekem,
Ta weku bîkeme tabût
Bo ew laşeyi xinikaweyem.
De were masiye sirkeke
Heta weku carêkî tir
Le gerayîta nemrim û
Le wişkayîma nexnikênê,
Qamîşelanêkî çirî ew tenkawem.. (Botanî, 2017: 140).*

2.2. JI RIWANGEHA MIJARAN VE

Di vê beşê de em dê hewl deyin hindek ji helbestên Botanî praktîze keyin ji layê mijarên "Bandora rengan li ser saykolojiya mirovan, sîmbolîzma rengan di çanda gelan da, sîmbolîzma rengan di baweriya ayinan da ku tîyoriya van mijaran di beşa yekem a tezê de hatibû pêşkêşkirin.

2.2.1 Bandora Rengan li ser Saykolojiya Mirovan

Reng dişêtin bandorê li derûnê mirovan biketin û dişêtin kesayetiya wî diyar biketin, ku her rengekî di saykolojiyê da têgeh, sîmbol, ramana xwe ya cuda û taybet heye. Diyarkirina hindek rengan wek sîmbol ji bo hindek tiştên diyarkirî. Bandora her rengekî ji ya dî cuda ye, bo nimûne rengê şîn û kesk rengê bêhnfirehî û aramiyê ye. Rengê zer rengê balkêşî û keyfxweşiyê ye. Rengê sor yê azirandina hestan e. Rengê mur rengî xemgîniyê ye û rengê pirteqalî yê germ û balkêşe. Reng di şêtin bandora xwe li mirovan biketin û siruştê wana aşkera biketin ku ew bixwazin yan nexwazin reng dişêtin siruştê wan zelal û aşkera biketin. Bo nimûne rengê sor girêdayî dilsoziyê ye û sîmbola evîniyê ye.

Hindek nimûneyên helbestên Emîn Botanî li dor vê mijarê û rengvedana sîmbolên rengan di nava helbestên li gor evê mijarê da:

Di helbesta "Veresiyana Berahî" ya bercestebûna rengê reş di nava helbestên Botanî da cihekî berfireh girtiye. Ev çende jî di pêvajoya serbûra xwe ya edebî da, helbestvanek reşbîn e beramber diyarde û bûyerên di nava jiyana wî da rû dayin.

Evca neçar bûye penayê bibete ber rengê reş çunke rengê reş di saykolojiya mirovan da raman û sîmbolên nerênî bi xwe ve girtîne. Ev renga sîmbola mirinê ye, xemgînî û nexweşiyê ye. Dîsan jî girêdayî paşeroja berz e û tarî ye, rengê nebawerîbûnê ye bi kesên derdora xwe. Lewra jî kesên xwedî nihênî rengê reş bi kar dînin da ku xwe cîhana derve biparêzin.

Evca bikaînana rengê reş ji layê Botanî dibît ji egerê parastina nepenî û nihêniyên derûnê xwe. Yan jî da ku bi rêka evî rengî hestên xwe yên xemukî bi rêya helbestê derbibirît û çendekê ji azarên derûnê xwe tena biketin.

Brawo

Çi digel koçerekî bihête gotin

Bi danana kincrkên banehiyê

Hizaran çîrok

Êxistibine dizakîra zomê da.

Dibêjin wî demî

Tinê rîhan

Dişerma reş bibûn û

Masiya jî

Behî danabûn

Bo rêvîngên têhnî kuşitî (Botanî, Veresiyana Berahî ya, 2017: 21).

Di evê helbesta *Sê pêngav... Beref Sotineka Şirîn* helbestvanî helbesta xwe bi sê şeweyan derbirîn ji hestên xwe kiriye renga her sê şeweyên wî li dûr êk bazine bzyrin. Helbesta xwe li ser sê pêngavan dabeş kiriye. Lê xala serekî ku helbestvan li ser rawestayê hez û viyana wî ye ku rizgarbûn ji nexweşiyên û revîn berev geşbîniyê. Ku di hersê pêngavên evê helbestê da rengê reş zal e û li dûmahiya her pêngavekê cure çareyek dîtiye lewra bo vê çendê rengê reş kiriye sîmbol di helbesta xwe da.

Lewra jî di pêngava êkê da dibêjîtin:

Ew rêka

Jigundî derkevît,

Ew rêka

Tête gundî ve,

Bi aşkrayî

Bi dizîve,

Kulanikên me diramûsît,

Xu dikete xîz

Xu dikete herî

Li derav û zumên gundî

Piyên xatuîna di alîsît (Botanî, Sê pêngav... Beref Sotineka Şîrîn, 2017: 350).

Dîsan dirêjîyê bi helbesta xwe didet û dibêjîtin:

Çunîkî her şev

asmanê gundî tarî di bît

Ta spêdî bi ezmanê xo.

Reşatiya ser dilê me û

Asmanê me dialîsît,

Û li demê elind datêt

Bi leşê xoyê sotî û reş

Dikevîte kolanên gundî

Ya nîv sax ya nîv jî mirî

Lêvek kenî û yadî grî, (Botanî, Sê pêngav... Beref Sotineka Şîrîn, 2017: 351-352).

Li vê derê helbestvanî pesna evîndara xwe di derbirîneka dî da kiriye û şîna reşatiya çavên wê giringî daye leşê sutî û reş û bi şêweyê elindeka spî dikevîte nava kulanên gundî. Îşaretê dikete germa rojê ku hemî madên heyî ji egera mjîna tîrojên rojê renga peyda diken, hindek kêr û hindek zêde ji mjîna hemî tîrojan reş peyda dibît û ji

newergirtina tîrojan spî peyda dibît. Di navbera germ û sermaye laşî wî dapuşî ye bi laşekî nîv sax nîv mirî dihêt ber çavên me û dikete dêwekî reş.

Xweya ye ji evî kupla helbestê ku helbestvan di barûdoxeke derûnî yê nexweş da derbaz bûye ku xemgînî zal bûye li ser hestên wî lewra rengê reş bikarîna ye wek sîmbol ji bo xemgîniya, ku geşîtiye wî radeyî ji ber wê xema wî ew cudahiya spêdehiyan û şevan neketin ji egerê şev nenivîstin û mandîbûna hizr û hestên wî yên helbestê û nexweşî ne aramê lê diyar dibîtin. Helbestvanî di sîmbola rengan da rengê reş kiriye alîgirê xem û bê hêviyan. Dîsan ew kesên hez rengê reş diken, ew kes in ku zî bi zî mirov neşet kesayetiya wan aşkera biketin.

Di kupla duwê da yan di pêngava duwê ya helbesta Botanî da diyar diketin gelek caran rengê reş ne tenê dibête sîmbolên negatîf li ba xwe heldigirît hendek caran jî dibête helgira ramanên pozîtîf wek sîmbola ciwaniyê û salixdana tiştêkî bi ciwaniyê. Lewra hendek caran rê li ber huzanvanî nehatiye girtin ku rengê reş wek sîmbola ciwaniyê yan başiyê bi kar bînît, weku diyar di evê kupleyê da Botanî bas li reşatiya ciwaniyê diketin ku jê hatiye wergirtin. Ku di piraniya karên edebî da ji bo ciwaniya porê yan çavan bi rengê reş hatîne saloxdan. Şiyaye bi renekî û derbîneka pirî şarezayî pêkve girêdanekê çêketin di navbera bikarînan ramanên rengên reş di evê helbestê da wek raman û sîmbolên pozîtîf û negatîf.

Estêrên dwîr

Estêrên sar û mejî hişk

Evîna wan

Direşatiyada diteysît,

Ewan çend şeva xo divêt!

Li demê dizanin

Reşatiya ciwanî ya wê

Hatiye dizîn, (Botanî, Sê pêngav... Beref Sotineka Şîrîn, 2017: 353).

Dîsan jî herwekî me diyar kirî helbestvanî rengê reş ji bo ciwaniya çavên yarê bi kar îname wek sîmbol ji bo ciwaniyê. Ku rege merem pê ew bît ku her kesekî evîndar amade ye giyanê xwe bikete gûrî ciwaniya yara xwe, xwe gûrî evîna xwe biketin.

Gerdena wê

Hatiye gezîn,

Hêriş tînin

Ku reşatî ya çavên wê

Ji sotina me bistînin.

Lewra herşev em dibînin

Ester dirrjn.

Lew heyiv ji têhna evîne

Jisexmeratî girinijîn û

Maçeka tarîgewrkê,

Her êvarî

Dadidete ser çiyakên me (Botanî, Sê pêngav... Beref Sotinka Şîrîn, 2017: 354).

Di van malikan da jî dîsan reş bo xirabiyê bi kar îname. Armanca helbestvanî ji reşatiya çavan weku jehrê ya kujek e çunke ji sutina giyanê wî standiye. Herwesa behsê hatina şev reşê diket û berdidete ser hestên xwe. Ew şevên biwîne hêvîne xeyalên helbestên gelek helbestan û bêdengiya jiyanê efsaneyî û romansî, di ge bûyerê tirs û tariyeka kujek nîşa me daye. Ji derbirîniyeka riyalîti reng wergirtiye.

Da her termê

Estêrên sotî bijmêrin,

Da ew soraxa pir şewat

Bi kolanikê gundî da bigêrrin. (Botanî, Sê Pêngav... Beref Sotinka Şîrîn, 2017: 356).

Dîsan di pêngava siyê ya evê helbestê da Botanî viyaye bas li evîniya serdemên kevin di wêneyekî helbestê da biketin. Renge wesa xweya bît ku Botanî li dûmahiya her

pêngaveka evê helbestê viyaye xwe qortal biketin ji nexweşîyan yan jî dibît ewê nexweşîye qortalkirineka rasteqîneyî nebît rege çêj ji evan nexweşîyan dîtiye.

Çunke li ba gelek kesan nexweşîyên evînê çêj û tama xwe heye. Lewra dibît gelek caran lezeta negihîştin bo tiştek e xweştir bît ji gehîştina wî tiştî. Ku dibît li demê kesek evîndar bît û li çûna jivanê evînê ji bo dîtina evîndara xwe û berev rîka dîtina evîndara xwe diçîtin, dibît ew rêke zora dwîr bîtin lê li şûna bikarîna tirombêlê ew bi piyên xwe berev ewê rêkê ve biçîtin. Rast e dê gelek mandîbûn û azaran bînît lê, rege da pitir bişêt bi dirêjiya demê wê rêkê hizir di wê dîtinê da biketin, ku ew dîtin rege bi çî şeweyî bîtin, ke wate hzirkirî di evan tiştan da jî tam û çêjeka xweş heye.

Emêt mirov

Mirovêt çerxê evînê

Helgirên navê birînê,

Hozanên me

Stiranên me

Direwên me

Kêl û nivşit û berên me. (Botanî, 2017: 357).

Botanî di her sê kupleyên evê helbestê da viyaye wêrekiyekê bidete xwe û xwe qortalkirinekê û rêke çareyekê bo hemî arîşan bibînît û bişêt bi rêya bikarîna hindek rengan di vehandina evê helbestê da derûnê xwe pê aram biketin. Dîsan ewan rengan bikete çend sîmbolek ji bo avakirina evê helbesta xwe. Lê digel hindê jî hindek eger û behana bo evan qortalkirina dibînît ku ev egere dibine rêgir di rêya evî qortalkirin û rizgarbûnan da.

Dîsan di helbesta "Têkhelebun" em dibînîn mewdayê paşeroja helbestvanî berev aqarekê nediya ve diçîtin. Ji nalebeyariya derûnê xwe pena biriye ber lêkçiwandinekê ku di binyat da ew tişt wesa nabît lê huzanvan neçar bûye evî lêkçwandê bi kar bînît.

Reng wek xwe nehêlay ne û sîmbolîzma renga ber û derbirînî biriye. Reng ne xwe cihe dihête guhartin li gor têkstî. Ku kulîlk reş kirîne ku di resenetaya xwe da demê kulîlk

dibişkivîn rengên ciwan û buharê û dilfirehbûnê bi mirovî dibexşin ku mirov ji dîtina wan têt nabît. Lê helbestvanî rengê reş daye kulîlkan ku bo nalebariya derûnê helbestvanî vedigerîtin çûnke rengê reş di saykolojiya mirovan da sîmbola ji bo bextreşiyê, bêzariyê û xemgîniyê ye û rengê nerênî ye, sîmbola nemanê ye

Kesê ez ne niyasîme

Bi evî regeiy

Lê têkeftim û

Bi sanahî bimin danekirin,

Dê şehdê dem

Ev na maqwîliye minê krî û

Kesê dî ne,

Ez bi tinê li wêrê krî û

Kesê dî ne,

Ez bitinê li wêrê bûm

Wextê min

Hemî bilind şorrkrîn û

Kulîlk dişerada reşvebûyîn (Botanî, 2017: Têkhelebûn, 48).

Dîsan di helbesta "Mirarbuna bilûra" helbestvan bi awayekî xemgîn pirî kuan derbirînê ji bextreşiya xwe diketin. Ku çarenivîsê xwe daye destê qederka şîm çûnke ew bi xwe salixdana derûnê xwe diketin, xwe li hemberî qederê bê çare dibînîtin. Ev rengê reşbîniyê jî li ba helbestvanî bûye binaxe ji bo sibeyeka nediyar. Evca dibînîtin helbestvan di destpêka helbestê da ewê mergesata qederê dergêhen xwe bo vekirîn ew jî bihêwaşî berev wî wargehî ve diçîtin.

Herwesa sîmbolîzm di helbestê da rûyekî geş e û Botanî helbesta xwe pê ava kiriye. Ku ji bextreşiya xwe helbestvanî rengê reş bi kar îneye çûnke di saykolojiyê da rengê reş sîmbola reşbîniyê ye hewl daye bi vê yekê xwe qortal biketin ji wê nalebariya derûnê wî têt da derbaz dibîtin çûnke reş bi hemî ramanên xwe û di koka xwe da rengê bê hêvîbûn û xemgînî reşbîniyê ye. Eve jî girêdayî rûdanê ye û rengvedana civakî û

kevneşopiya helbestvanî, bandor kirîne li ser derûnê wî ku diyar e reşbînî di helbestên Botanî da gelek zal e. Botanî sîmbola rengê reş li cihê wî danaye.

Hê î îxbala reş

Stiran didevê meda

Wekî pencarên xurrstî şîn dibûn

Leyztina me bê şîrîk bû..

Kardoxî bera gurrêl diken

Kardoxî stirana diberra dibêjn

Kardoxî çi ji semayê çê naken.!

Behî berdewame û

Zarojî li ser

Momiyakirina pelatînika diberdewamin,

Ewjî nizanin

Rengê çenda ji wan hatiye xwastin. (Botanî, Mirarbuna Bilûra, 2017: 118).

Dîsan di helbesta "Jana Azadiyê" li demê hemî dergeh li mirovî dihêne girtin hindek caran mirov neçar dibîtin gileyên bextreşiya xwe bigehîne xwedêyê xwe. Ev cure gileye jî pileya ne aramiya derûnê helbestvanî pîşanî me didetin. Bi peyv wêneyên xwe helbestvanî dîtiye hemî dergeh li ber wî daxistî ne, hîç mirovek nîne bişêtin dergehê omêd û hêviyan bo buhareka kulîlk kesk û sor jî sil nebûn veketin.

Çunke helbestvanî peyva "payz" kiriye keresteyek ji bo dorpêçkirina buhareka axlêvebûy. Li dûmahiya vî helbestê helbestvan neçar dibîtin peyivîn "weylûûûû" bi kar bînît da ku hindek ji êş û azarên derûnê xwe yê birîndar tîmar biketin.

Ev dubarekirina dûmahiyê helbestvanî di helbestê da derbirîn ewê çendê diselmînit ku yê di rewşeka aloz û dijwar da, bi riya peyvan şiyaye hindek ji nexweşiyên xubê derman biketin.

Dîsan jî sîmbol di evê helbestê da rûyekî geş e. Ku rengê sor bixwe ji rengên serekî û rengên germ e, yekem reng bo mirovan di jiyanê da naskirî û ji xwîna giyandaran

dirustkirî, ji ber hindê jî yek ji saloxetên evî rengî peywendîdar e bi xwînê ve. Rengê sor bandoreka bi tirs dikete ser derûnê mirovan, yê pêroz e di baweriyên û ayinan da jî.

Ho xodêoo ew ava sor

Xûna kurdaye derbûye

Xudê çima buhara wan

Biser payzê da werbûye?!.

Weylo weylo weylo weylo

Weylo weylal weylo weylal

Weylo weylo kurdo megrî

Weylo megrî kurdo menal. (Botanî, Jana Azadiyê, 2017:203).

Dîsan sîmbolîzma rengan di mijarên derûnî da di helbesta "Eşkî Sûr". Rêka gehîştina aşiqan pirî nexweşî û asteng in. Lewra evê dozê qorbanîdan pêdivêtin, evca ew qorbanîdan bexşîna giyanê mirovî bîtin yan jî ji destan da hindêk armancên mirovî bîtin.

Evca helbestvan wesa hzirdketin ku gehîştina dildaran bi herweyî bidest ve nahêt, belku çêja evê dozê da gurîkirin pêdivêtin .

Renge ev derbrînên helbestvanî bikarînayin di evê helbestê da ji ewê guşenîgayê bin ku ew serbura eşqa xwedan ku gehîştîye yara xwe. Lewra hewil da ye rêke çarek ji bo gehîştina dildara bibînît.

Rengê sor jî di sîmbolîzma rengan da di mijarên derûnî de gelek sîmbolên ciyawaz ji bi xwe ve digirîtin, ev sîmbol û wataye ji kesekî bo kesekê dîtir cuda û rêjeyî ye dibî bandorên baş û xirab hebin li ser kesan. Rengê sor sîmbola hestên bihêz e ew hestên girîdayî eşqê û aramiya derûnî. Rengeke hestên germ li ba mirovî peyda diket, çunke rengê sor bandoreka bihêz dikete li ser amûrê hestiyarê mirovî. Dîsan rengê sor bandoreka bihêz heye li ser kesan bi taybet zelaman bo nimûne li dema ku jina rengê sor di cilên xwe da bi kar tînît pitir bala zelaman bo xwe dikêştin. Hestên wî yên seksî diazîrînît.

Hindek caran jî di pitiriya mijaran weku mijarên çanda gelan da rengê sor sîmbolên erênî û nerênî wergirtîne weku li ba misiryên kevin sîmbola şansê baş û bexteweriyê ye. Dîsan jî li ba hindek milletan bûye sîmbola taziyan mîna gelên başûrê *Efrîqiya*. Herwesa rengê reş di mijarên olî da sîmbola qurbanîdanê ye di duzên rewa da.

Bo şewe zengî rohekan

Le agir deçinm çepkî nûr

Dîde pir bê le feiyî geş

Min çîm dawê be eşkî sûr (Botanî, Eşkî Sûr, 2017: 272).

Li dûmahiyê em dişên bêjîn helbestvan kesên hestnazik in û derûnê wan ji her kesekî zûtir bandor lê tê kirin. Lewra jî ji egerê wan bandorên li ser derûnê Botanî hatîne kirin helbestên wî encam dane. Egerên derûnî ji egerên serekî yên vehandina helbestan e, çünke hest û derûn girêdayî yek in. Lewra Botanî ji bo tenakirina derûnê xwe pena biriye ber vehandina helbestê, bi rêya hindek rengan ku wek sîmbol bi kar înayîne. Da ku derbirîne ji hest û derûnê wî biken. Diyar e helbestvan şarezayê derbirîna renga ye, lewma bi hesteka hunerî û edebî reng bi kar înaneye. Bo nimûne rengê reş di mijara rengan di saykolojiya mirovan da raman û sîmbolên nerênî bi xwe ve girtîne. Ev renga sîmbola mirinê, xemgînî û nexweşiyê ye. Dîsan jî girêdayî paşeroja berz e û tarî û ne arambûna derûnîye ye. Lewra jî gelek caran Botanî ev renga kiriye sîmbola xemgînî û nexweşiyê. Eve jî ewê çendê diyar diketin ku derûna helbestvanî xembar e, xwestiye bi rêya rengan pîçek derbirîne ji hestên xwe yên xemkî biketin.

2.2.2 Sîmbolîzma Rengan di Çanda Gelan da

Di navbera mirovî û rengan da peywendiyeka hemecur heye. Her mirovek li dûv ewê jîngeha tê da dijîtin. Çi qenc yan xirab bo her yek ji wan navên rengî sîmbol û wate û ramanên cuda danayine. Bo her renekî, navek danaye ku derbirîne ji wateya wan diketin ku bi hindê her yek ji yadî bihête cudakirin. Li dûv borîna demê di ferhenga rengan da ji encam û borîn û guherîna demê û nasîna wî jîngeh û civak tê da dijîtin ciyawaz digel civakên dî ji layenên dî ve.

Bi borîna demê û pêşkeftina rewşenbîrî û jiyanê rengan gelek bêje, wata û sîmbolên cuda wergirtine. Di biwarê civakî da yên girêdanên dirêj û girêdayî guherînên gerdûnî û yên derveyî kontrola mirovan. Dîsan jî rûdanên madî yan jî encamên şîyanên bandora hundirîn ya rengan, ku dişên bandora xwe li ser karvedan û hestên mirovan biken.

Hindek nimûneyên helbestên Emîn Botanî li dor vê mijarê û rengvedana sîmbolên rengan di nava helbestên li gor evê mijarê da:

Bûyerên trajediyê yên berdewam li ser gelê kurd bandora xwe li ser berhemên afirandina helbestvanî kiriye, her wekî li ser gişt civakê kirî. Botanî helbesta "Gula Curê" pêşkêşî wan şehîdan diketin, ewên bindestê rejîma Îraqê ya Saddam Hussein hatîne şehîdkirin. Lewra hindek hêvî û sozan didete ewan, lewra li zivîna xeyala xwe helbestvan Botanî dixwazît hemû hêviyan digel xwe bînît û nexweşiya bi tolstandinê keyfxweş biket. Xemgîniyê bi xemla rengên dilveker bikete xemla berbiska evîndara xwe li hemû cîhanê bigêrînît.

Demê em guh li navî Mem yan Zîn dibît yekser bîra me li Dastana *Mem û Zîn* dihêt ku dastaneka herî bi nav û deng e li ba Kurdan. Ku ji layê helbestvan û bîrmendê mezin ê Kurdan *Ehmedê Xanî* di sedsala hevdan da hatiye nivîsandin. Ev dastane bi şêweyekî edebî yê payebilind hatiye vehendin. Ku dibîte êk ji şakarên mezin ên edebê klasîkî yê Kurdan. Li ser binyatê sê hiziran hatiye nivîsandin "tesewf, felsefe, neteweyî". Di evê dîwanê da *Xanî* şiyaye Zînê bikete bihane bo darêjitina hizirên xwe yên neteweyî, dema *Xanî* dibêjît

Şerha xem dil bikim fesane

Zînê û memî bikim behane (Cîhanî, 2007: 18).

Mebesta *Xanî* ew e ku dibêjît: Heta min xema dilê xwe şirove kirî min Mem û Zîn kirin behane (hêcet).

Dibît Botanî li ser evê rêbaza *Xanî* ku navê "Zînê" bi kar bînît wek behane da ku bişêtin hizir û bîrên xwe yên ramyarê û gelek mabestên dî bigehînit vê helbestê. Botanî

rengê reş di vê helbestê da kiriye sîmbola ciwaniyê ku ji bo rengê pirça "Zînê" bi kar îname. "Zîn" sîmbola evîndaran e ewên bi evîna xwe ya paqij û dirust negihîştin. Ku li ba Kurdan Mem û Zîn sîmbola evîniya paqij û bêgerd e. Rengê reş ê keziyên wê wek sîmbol ji bo xemgînî û nexweşîyan bi kar îname. Helbet di sîmbola rengan da wekî kevneşopiyeka rojhelatî bi giştî û di civaka Kurdî da bitaybetî, rengê reş kiriye alîgirê xem û bêhêviyan. Sîmbolîzma rengan di evê helbestê da li gorî dem û bûyer û têkst bi kar îname.

Dîsan jî gelek caran rengê reş di civaka Kurdî da ji bo saloxdana ciwaniyê bi kar îname. Ku rengê reş ê pora afretê êk ji sîfetên herî ciwan e. Lewra helbestvanî reş kiriye sîmbola ciwanî û xweragiriyê, kiriye harmoniya tabloyekî rengîn û ber bi cîhaneka xemilî û hêviyan diçît.

Bikarînana rengê reş ji bo kezîyan bi kar îname li cihê her renekî dî mîna zer yan sor ku Botanî xwestiye bi rêya rengê reş ji bo sîmbol û resenatiya reşî bi kar binît û raman û sîmbolên wê rastewxwe bigehînte me. Helbestvanî guhartin di rengan da nekiriye gelek ji kevneşopiyên civaka tê da dijît dûr neketiye.

Rast e di gelek civakan da rengê reş sîmbola xem û bêhêviyan e belê rengê reş li dûv dem û cihan wataya wê hindek caran hatiye guherîn. Lewma Botanî hewil daye evê çendê bi ciwanî û hêviyan biguherîtin.

Di vê helbestê da sozê didetin ewan xemgîniyan biguherîtin bo xweşîyan ku zarok sîmbola paşerojê ye. Bi rêya bikarînana peyva *destdirêjî* ji layê Botanî ve bi ramana berxwedanê hemberî dujminan lê berovajî li ba dujminên Kurdan ev çende ramanê *destdirêjiyê* ye. Dema dibêjît:

Dê tola zarokan vekeyin

Dê reşkeziyên zînê şekeyin

Dê her dest dirêjiya xwe keyin

Gerçî jimêje veman e Kurd (Botanî, Gula Curê, 2017: 466).

Dîsan Botanî di helbesta "Sersalên bê Heliz" viyana xwe ji berfê diket û sir û serma wê bi cilkên spî dixwazît. Hind viyana xwe diyar diket heta ku çî reşatiya nehêlîtin ku rengê spî li dijî rengê reş bi kar îname. Rengê reş hemî tîrojên rojê û ronahiyê dimêjît belê rengê spî hemî rengan komve diketin, spî ji rengên sar e lewra hestê aramiyê li ba mirovî peyda diketin. Mirov dikarît vê rastiye di bazineya rengan da bibînît ku bi lez hêza ronahiyê zêde dibît, em bazineya rengên di rûpeleke rengan da dibînîn.

Helbestvan berf û zozan bi rengê spî divên ku sîmbola paqijiyê û zelaliyê ye rengê spî, ji ber ku ew hest bêhtengiyê. Lewma pena dibete ber rengê spî û divêt rengên biket bi taybetî her carekê rengê diketin ber ji rengên germ û sar û bê layen.

Ku rengê spî di civaka Kurdan de sîmbola paqijiyê û zelaliyê ye. Lewra helbestvanî nexwestiye ji civaka xwe dûr bikevît û sîmbola rengê reş û spî li cihê wan bi kar îname.

Rengê spî li ba helbestvanî sîmbola nûyatî û zelaliyê ye, bi saloxdana keviyên spî ku mîna dema nameyekê dinivîsî li ser rûpeleka spî dihête nivîsîn ku sîmbole ji bo nûyatî, paqijiyê û destpêka qonaxeka nû. Rengê reş jî wek sîmbola bûyerên trajedî, xem û nexweş bi kar îname.

Gelu îro me sersale û

Li zozana welatê min

Keviyên spî di barin,

Kevî ya spî bibare

Çi reşatî ya ne hêle

Sîngê vê qadê bi kêle

Ev gerdûne bi gemare (Botanî, Sersalên bê Heliz, 2017: 293)

Dîsan berdewamiyê didete helbesta xwe ku helbestvanê me, di avakirina helbestê da hest bi kêmasiyekê diket. Ji ber wê jî pena dibet ber renga û dixwazît hind dîmenên rengên bi peyvên helbestê binexşînin, lewma bi xeyal û hestan û dixwazît kirasê bûkaniyê ji xwezaya Kurdistanê bigirît û biket xêliya bûkê. Helbestvanî sîmbolîzma rengan ber bi siruştî û derbirîne bîriye.

Dîsan diyarkirina rengê spî ku ev renege piraniya caran dibête sîmbol ji bo serkeftin, bextekî baş, paqijî û aşitîyê. Ji ber hindê helbestvanî wesfa rewşa nû bi saloxdana berfa spî kiriye û bermala spî sîmbola paqijî û bêgunehiyê ye. Dîsan jî rengê spî ji renekî xweşitviye li ber dilê her kesekî piraniya civakan lewra helbestvanî rengê spî bi kar îname û ji rengên sar e ku aramiyê û dilfirehiyê li ba her kesî peyda diketin, dîsan jî spî wek sîmbola ciwaniyê bi kar îname ku renekî zelal û ron e.

Dîsan rengê spî di hundirê xwe da sîmbolên erênî û nerênî hildigire lê li vir helbestvanî jî wek sîmbola erênî bi kar îname dema dibêjt "kevîyê spî bibare ruyê warê me spî bike".

Li ser vê bermala spî

Ta ku sirr dibît dest û pê.

Da pêçek bihna xo vedeyin

Kuvanên çend sala vedeyin,

Kevîyê spî bibare

Ruyê warê me spî bike

Nuy zavayê dîlanê huy ke.

Rengê hîzarek befrînî

Bide sazbandan mizgînî

Ku warê me îro buiyk e (Botanî, Sersalên bê Heliz, 2017: 296).

Dîsan di helbesta "Gundê Min" helbestvanî helbesta xwe bi bûyereka tirajîdî vehandiye. Bûyertrajîdîye lewma helbestvanî pena birye ber rengê " reşî" evejî grêday ruydanê ye û rengvedana civaka helbestvan tê da dijît lê diyare. Helbestvanî viya ye ew nexweşî û derdeserya bi serê milletê wî hatî bi rengê reş, wê ne aramiya xwe bi vehînît. Reş kiriye sîmbola nemanî reşbîniyê daku bi evî rengî derbirînê ji ewê karesata bi ser milletê kurd hatî li ser destê rijêma faşîsa Saddam Husseiniy biket. Weku dihête zanîn bi hemû awayekê huvane hemû rêk girtine ber ji bo ji navbrina milletê Kurd bigire ji "enfal, kuşitin, zîndanikirin, eşkencedan, bê ser û şîn kirin, veguhastina wan bû deverên biyabanan, bikarînana çekê qedexekirî, wîranikirin û talanikirina gund û malên wan..htd"

. Ku heta gehîşitiye ewê radeyi çekê kîmiyawî li hemberî wan bikaribînin. Lewra Botanî ev helbeste li ser vê bûyerê vehandiye ku rjêma *Saddam Husseiniy* çekê kîmiyawî li dijî ewan bi kar îname li gundê *Şêx wesanan* û gundên *Dolî balîsan*.

Anku ev helbeste bi şêweyê pê gûtin vehandiye. Helbesta pêgûtin di nava Kurdan da berbelav e, çunke netewê Kurd ji ewan neteweyan e ku gelek nexweşî dîtiye. Dîsan jî bi hemî alav û rêkên cuda rjêma *Saddam Husseiniy* hewla qirkirina netewê Kurdan kiriye. Lewra helbesta pêgûtin bi nexweşîyan e, helbestvanî bivê yan nevê dê peyvên xemokî bi kar îname.

Lewra Botanî di evê helbestê da rengê reş bi kar îname dîsan peyva *Şeva tarî kiriye* sîmbol û alav ji bo derbirîna xemên xwe, lewra jî her dema me guh li navê rengê reş dibîtin yekser xem û nexweşî dihêne bîra me. Ji ber hindê jî pitirîya carên bikarînana rengê reş di helbestên Botanî da sîmbol in ji bo nexweşî û karesatan û derbirîn ji hestên xemokiyên helbestvanî bixwe. Di piraniya kevneşopên civak çanda gelan da reş regekî rengê û dijî ciwaniyê bûye.

Ji îro pêve

Xewkutik bihête rojê

Şeva tarî

Ev kurkê reş ratêxî

Bo pepûk û ji me çêtiran,

Li gorstana gundê me

Miriyê me

Dikene govend û dîlan,

Her dibêjin yê sax ji ber miriya revîn.

Ta elindê

Li wî gundî

Şeveroke û

Mirî dişarînin şevîn (Botanî, Gundê Min, 2017:483).

Dîsan di helbesta "Wekhevî" evê helbestê da helbestvanî du rengên hevdiş bi kar înayine. Ku her yek ji wana xwedî sîmbolên cuda ye û di nava xwe da ramanên cuda heldigirîtin. Şêweyê bikarîna rengê reş û spî ji layê helbestvanî ve ku viyaye ev reng e her du peyambarin bo wergirî. Bikarîna rengê reş ji layê helbestvanî ve hindek egerên xwe hene, ji wan ku rengê reş yek ji giringtirîn û serekîtirîn reng e di jiyane de. Ku xwedî gelek raman û sîmbolên baş û xirab e. Di dirêjahiya dîroka gel û milletan da giringî pê hatiye dan dîsan ji layê saykolojî û ayînî jî ve ji wê giringiyê bê behr nebûye. Xweya ye ku rengê reş xwedî gelek raman û sîmbolan e ji wan "sîmbola tirsê li ser derûnê mirovan, nexuşî, xemgînî, reşbîniyê ye".

Helbestvan gelek ji kevneşopiyên civaka tê da dijît dûr neketiye û guhartin di rengan da nekiriye. Lewra helbestvanî rengê reş bi kar îna ye wek sîmbol ji bo pêşçavkirina wêneyekî ku derbirîne ji jiyana nexweşî pirî derdeserî û hejarî ya kesan pê biketin. Ji ber ku pitirîya caran renekî negatîf e, ramanê mirin û nexweşiyê bi xwe ve digirîtin.

Dîsan helbestvan bas li rengê spî diketin dema dibêjîtin "Ji rengê befrê" ku merema helbestvanî rengê spî ye. Rengê spî kiriye sîmbola paşerojeka baş ji bo jiyane baştir û hîvîyek bo bexteweryeka çaverê kirî. Jiyanek pirî aramî dîr ji hejarî û nexweşîyan. Çûnke rengê spî di resenatiya raman û felsefa xwe da sîmbole ji bo başî, aşitî, ronahî, hezêkirina başiyê. Ku her kes baş dizane pşitî her nexweşiyekê xweşiyek heye û pşitî her tariyekê ronahiyek heye.

Di kevneşopan da renekî nebaş bûye ji ber ku rengê *Benda* yan rengê reş bûye. Lewra helbestvan di evê helbestê da amaje dikete pîstperêsan û tuxme perêsa ku tê zanîn di kevneşopan da dû berekiyek hebû li ser cudahiya rengan. Her neteweyekê li gor hizira xwe giringî daye rengê pîstê mirovan ku mirovîn pîstê ewan reş kirîne bende û kesên spî pîst biwîne xudanên desthelatê, li gureyî rengê pîstê wan beha dayê û parve kirîne ser texên civakî.

Piraniya kesên mirovdost xebat kiriye ji bo nehêlana evan cudahiyan di nava texên civakî da. Daxwaza yeksaniyê di navbera mafên mirovan da kiriye bê cudahiya reng û ayîn neteweyê wan mîna "Martin Luther" (1929-1968) êk ji zela mên ayînî yên mesîh e û

yek ji çalakvanekî herî mezin ê mafên mirovî bû. Herwesa êk ji karîgertirîn kesên Emirîkî bû di jî pîstperêsa, di sala 1964an de bû helgirê xelatê *Nobel* yê aşitiyê ji ber ku xebata wî hemû di jî "ne bo tondûtîjî yê "bû. Ku ew bi xwe jî kesekî reş pîst bû hemî xewn xebatên wî ji bo nehêlana cudahiya di navbera texên civakî da bi taybet cudahiya kesên li gor rengên wan.

Lewra jî piraniya helbestvanan jî mirovdost in û her dem daxwaza yeksaniyê ji bo her tiştî diken. Her wek Botanî di vê helbestê da husa bas diketin û di vê parçeyê da rengê reş kirîne sîmbol:

*Li demê zîncî
Sexmerat tî wekheviyê
Bo xarina vê paruyê
Jiyana tuxme perêsa
Di reşatiya xo werdidetin,
Bo roja dî
Dûgez ceng ji reng befirê,
Bi destên xo
Bo xo didurît.
Belê zîncî
Ker û golikên rengperêsa
Dikujîtin,
Hngê radibît*

Rezê jiyana xo berdidetin. (Botanî, Wekhevî, 2017: 338).

Dîsan Emîn Botanî di helbesta "Aşitiya Sor" de bûyer bi rengan nîşa me daye. Da bizanîn ka wî ev rengên wek tabloyeka xemgîn û nîşa me daye û derbirîn jê kiriye û peyamek daye me. Yan jî bi reng di derbirîneka trajediya xemgîn û bêhêvî da bi kar înayine. Di evê helbestê da reng li ba helbestvanî derbirîneka sîmbolî veşartîye ne ku rastewxwe ye.

Helbestvan gelek ji kevneşopiyên civaka tê da dijît dûr neketiye û guhartin di rengan da nekiriye. Lewra sor û zer kiriye alavê bûyerên trajedîk û xem nîşa me didet. Rengê sor gelek sîmbolan bi xwe ve digirît li gor civak û kesan. Lê bi giştî dema peyva xwîn bi kar dihêt êkser rengê sor dîte bîra me. Yan dema zer nexweşî û êş dihête bîra me. Ev du renga bi wîne kabus û xem hêviyên wî ji nav birîne.

Helbestvan di navbera sar û germê da pena biriye ber giroya rengên germ ku sor û zer e ku her du renga jêderê germê ne. Dîsan Botanî sîmbola her renga li cihê wî danaye û şeweyê hunerî yê helbestê vehandiye. Rengê sor berinyase ku rengê xwînê, dîsan rengê zer di sîmbola rengan da li ba gelek civak û gelên sîmbola nexweşî û mirinê û nêzîkbûn ji ecelê danaye, ji ber hindê jî gelek caran ev renga bûye cihê dilgiraniyê ji layê derûnî jî ve.

Hê ê ê ..

Ev hemî sor û zerên min

Hewar hewar û ya star

Brîndar û bê war mane.

Av û danê van çûçikan

Li ser xezîna rehmane (Botanî, Aştiya Sor, 2017: 257).

Di helbesta "Rûyê Dî yê Mêraniyê" da helbestvanî di her du kopleyên helbesta xwe da peyva şev bi kar îname. Her dema em peyva şev dibihîzîn yekser rengê reş di mêşkê kirovî peyda dibîtin. Her wek diyar şevê bandora xwe li helbestvanî kiriye. Di evê helbestê da Botanî şeveka pirî evîn û şeveka metirsîdar bi êk ve girê daye. Şeva tarî peywendiyeka mukim digel hest, azmûna helbestvanî ya derûnî ve heye.

Helbestvan di evê helbestê da herdû peivên hevdiyên xweşî û tirsê bi hev ve girê didetin. Çünke li demê jivan û dîtina dû evîndaran sereray hestên xoş ên evîniyê û xerîbiya wan, temet wê çendê jî hestîn tirsê jî li ba wan dyar in. Di evî koplê da behsê şev reşê diket. Ew şevên buyine hêvênê xeyalên helbestên gelek helbestvanan û bédengya jiyaneka efsaney û romansî, di gel bûyerê tris û taryeka kujek nîşa medaye. Ji derbirînyeka rastyane renga wergirtîne. Lewra hindê hestên tirsê dem z û derbaz dibêt, di bine eger ku ew hest bi ewê xweşî yê neken.

Di civakên rojhilatî da bi giştî û civaka kurdî, dîtina evîndaran û şadbûna wan bi dîtina hev, tişteki bi sanehî nîne. Çünke evîndar hemî hewl diken dût ji çavên civak û xelkî yek bibîn. Çünke heta nuke li civaka me ev çende tişteki bi sanehî û normal nebûye. Lewra helbestvanî rengê reş bi kar îname, raste rengê reş di hundirê xwe da sîmbola xemukiyê ye. Belê ji bo evîndaran sîmbola dilînê, hêvî û parastina wan e. Lewra evîndar şevên tarî dikene rkehê jivan û dîtina hevdu. Çünke di şevê da her tişt tarî ye. Rengê reş jî sîmbola parastina nehêniyan e. Şevên reş û tarî hestên arambûna derûnî li ba mirovî peyda diken ji ber hindê jî, helbestvan dixwazît wêneyekî helbestê yê rengîn ji peyvan pêk bîn.

Reş di sîmbola rengan da gelek wata bi xwe ve digirîtin lê reşatiya şevê kiriye sîmbola nihênî û parastina nepeniyan. Lewra Botanî di evê kupla helbesta xwe da reş kiriye sîmbola hêviyan. Sîmbola reşî li cihê wî bi kar neîname. Çünke reş kiriye sîmbol ji bo hindê hêvî û umêdan. Di evê helbestê da helbest behsa evîndariyê diket. Lewra ta nuke jî di civakên rojhilatî da evîndarî û jivanên dîtina evîndaran bi şêweyekî nihênî ne.

Li şevêkê dû evîndar

Li jivanî gehîştin êk

Temet tirsê wê jivanê

Wan xewn û xozîk jimartin,

Li hembêza ewê şevê

Da temet evîna dilê xo

Têr têr girîn.

Di axînkanda bihujîn,

Pêjnên kuyr rahêlan û

Rondik srîn.

Li ser heyvê û

Hemî estêra hêwrîn (Botanî, Ruyê Dîyê Mêraniyê, 2017: 386).

Di evê kopla helbestî da helbestvan bi rengan bûyerê berçav diket. Rengê sor dikete sîmbola du tiştan, çünke rengê sor sîmbolên cuda cuda hene. Rengê sor li gor civak û baweriyên çend sîmbolan di nava xwe da heldigirîtin. Helbestvan gelek ji kevneşopên

civaka xwe dûr neketiye û guherîn di rengan da nekiriye. Lewra helbestvan viyaye bi rêya evî rengî amajê bidete du tiştan. Ew jî bikete sîmbol ji bo evîniyê û qurbanîdanê.

Helbestvanî rengê sor kiriye sîmbola ciwanî, evînî, romansiyetê û seksê. Li gor cihî û naveroka evê helbestê. Belê ji bo evîneka paqij û pirî hest bi kar îname. Çünke li gor civakê helbestevan tê da dijîtin ev çende qedexe û şehimzarî ye. Lewra sorî dikete sîmbola xwînê û xwegorîkirinê, dema dibêjîtin:

Beref zuzanên hîvî ya

Ji dil frîn,

Heta westyan û di xewraçûn.

Sipêdê jî

Bi rex gundî vî

Bibune dû nêrgizên şeng!

Dinav latên çîmena sor!!.

Vîna wan jî

Bi eniya wê mêranyê ve

Heta evrokî bûye mor (Botanî, Ruyê Dîyê Mêranyê, 2017: 387).

Heta nûke di nava kultur û civaka Kurdan hejêkirina rasteqîne nebûye nerîtek. Lewra Botanî berev rengên xemgîn diçît û evê helbestê bi rengê reş û şîn divehînît wek nexweşî kiriye sîmbol. Çünke di kevneşopên rojhelatî bi giştî û di civaka kurdî da bi taybetî, rengê reş û şîn kiriye alîgirê xem û bêhêviyan. Dişên bibêjî Botanî di evê helbestê da ber bi xeyalê ve diçîtin da ku bişêt peyama xwe bigehînit. Lewra helbestvan bi xem bi dawî diînît û dibêjîtin:

Li şeva didwîvra

Evîndarê dinê sil bîn,

Viyan dastanê evînê

Di mejiyê dilada bi drrînin

Viyan jî nebîte dastan.

Ser vê çendê

Biriyardan ku
Warê evêna bi dizîkî
Warê dastana bi hêlin.
Îna rabûn
Frrîn ji kewa qer kirin û
Beref zuzanên asmana
Bilind frrîn.
Ta ku asmanê reş û şîn
Bûye mexela estêra,
Li wêrê dîtîn
Ev dêrana sirr û berîn
Ne welat lêye û ne evîn (Botanî, Ruyê Dîyê Mêranyê, 2017: 387- 338).

Di efsaneyên kurdî da gelek caran bas li evîna Leyl û Mecnûn heye ku dû estêr in, belê hîç carekê nagehin yek, lê gelek caran li asmanî di ber yek ra diçin.

Li dûmahiyê em dişên bêjîn bûyerên trajîdî yên berdewam bi serê gelê kurd hatîne bandora xwe li ser berhem û afrandinên helbestvanî kirine, herwekî li ser gişt civakê kirî. Di babeta "reng di çanda gelan da" helbestvan gelek ji kevneşûpiyên civaka tê da dijîtin dût neketîye û gelek guhartin di sîmbolîzma rengan da nekiriye. Çünke piraniya sîmbol û ramanên rengan bi xwe di cêgîr in û rasterast ji civakê dihêne wergirtin. Bo nimûne rengê spî di civaka kurdan de sîmbola bêgunehî, aşitî û paqijiyê ye. Lewra jî gelek caran Botanî jî rengê spî di vê mijarê da kiriye sîmbola bêgunehî, aşitî û paqijiyê. Lewra helbestvanî nexwestiye ji civaka xwe gelek dût bikevît. Rengvedana civakî û kevneşûpiya helbestvan têda dijî di helbestan da diyar in.

2.2.3 Sîmbolîzma Rengan di Baweriya Ayinan da

Ayinan peywendiyeka cuda û taybet bi rengan ve heye. Di nav têkst û rê û resmên wana rengveda ye, her ayinekî bi rengekî yan çend rengekan taybetmendî ji xwe ra çêkiriye. Bêguman hindêk ayinan li gor atmosfera û serbora xwe taybetmendiyeka ruhanî standiye, li cem bûye sîmbolên pîroziyan, başî û xirabiyê, xweşî û nexweşiyê, gunehê yan

bêgunehiyê. Dîsan rengan di nav pirtûk û têkstên pîroz û dab û nerîtên tev ayinan da cihê xwe girtiye û her êk jî bi hindek sîmbol û felsefeyan berê xwe didene her rengêkî.

Ayinan bihayeke baş daye rengan û her rengêk helgira watayek û sîmbola destnîşan kiriye. Reng jî li gor her ayinekî bi hemî şeweyan bûne sembolên başî û xirabiyê. Her rengêk li gor bîr û bawerî û taybetmendiya xwe her rengêk kiriye sîmbol ji bo hindek tişt û pîroziyan. Dibît gelek ji wan raman û sîmbolan jî girêdayî xweza û atmosfera ewî ayînî bin. Li gor dem û cihan bi nerînên rêjeyî ev raman û sîmbole dihêne guherîn li ba her ayinekî û civakekê, ku pitirîya wan sîmbolan ji çavkaniyên ayînî û saykolojî û civakî wergirtine.

Hindek nimûneyên helbestê Emîn Botanî li dor evê mijarê û rengvedana sîmbolên rengan di nava helbestên li gor evê mijarê da :

Di helbesta "Jana Azadiyê" da Botanî dixwazît bi dîmenên bûyereka trajedîk nîşa me bidetin. Wêneyekî xemgîn ji peyvan ava biket. Sîmbolîzma helbesteka xemgîn bi xwezayê welatî ve girê didet. Ku hewar û gaziya xwe digehînît xwedêyê xwe, melîlî û bêdesthelatiya xwe nîşan didet ji ber ku her tiştekî rengê xwe û siyamayê xwe ji dest daye her tiştek hatiye guhartin. Ji egerê wan rûdanên bi serê gelê wî da hatîn.

Ku ne rengê esmanî wek xwe maye û ne jî gul li ser rengê xwe maye. Esmanê şîn û gulên rengên wem sîmbol e ji bo dirêjepêdana jiyaneka aram û li ser xweşiyê berdewam e. Lewra di wêneyekî xemgîn ê helbestê da Botanî ji bo me xweya diketin ku her tişt wekî xwe nemaye her tişt guherîn bi ser da hatîne. Rengên xwezayê digel esmanî şîn rengê xwe guhartiye. Helbet rengê şîn ê esmaniyê zêlê ku ev dîmene dibête egerê arambûna derûnî û barûdoxê her tiştî ye, lê piştî rengê asmanî wek xwe nemaye ev aramiye jî di gel xwe winda kiriye.

Lewra di rengvedana hizirî û hestan ber bi eqil û derbirînê diçît, weke *Gotê û Malarmê û Bodlêr* û *Gotê* ber bi sîmbolîzmê diçît. Bi dengê stran û awazan dixwazît xemên welatî verevînît.

Dîsan di evê helbestê da reng li ba Botanî regezê ciwaniyê ye û zimanê sîmbolîk ber bi hêmayên veşartî ve diçît û ji sînorê xwe derbaz dibît, dibîte regezekî hevpişk ji bo şirovekirina wê cîhana di hundirê helbestvanî da.

Ger em hûr li van dîmenan binêrîn, dê ji bo me gelek wêneyên helbestê di reng û dangan da diyar bin. Lêkdana peyvan, kêşeya muzîkê û dubarebûna peyvan weke rîtmeka lêkdayî digehîte guhên me. Bi giştî tabloyekî rengîn ji peyvan e.

Botanî di evê parçeya helbestê da peyva "Reng" bi kar înyê bê diyarkirina kîj rengî. Lewra jî dibît di vir da armanc pê aşkerakirina xewn û xeyalên wî bi xwe ye.

*Ez çi bikem bo esmana
Ser şînikatiya xwe nemayî,
Ez çi bêjm bo wê gula
Ji-rengê xwe ve qetiyayî,
Weylo ez çi bêjm
Bo şerfedîn û şingala,
Weylo weylo ez çibikim
Bo rûmeta ûl û ala.
Weylo çi nahête gotin
Bo kul û janêt welatî,
Çi xemeka dilşewate
Vê şîniyê livê xopanê
Xudêuo kurd heta kengî
Rênciberên azadiyêne,
ma qey ewjî ne mirovin?!
Ma ew afirandiyên kêne? (Botanî, Jana Azadiyê, 2017: 202).*

Dîsan dirêjepêdana evê helbestê da gazî û hewara xwe digehînite xwedêyê xwe ku xwedê milletê wî ji nexweşîyan biparêzîtî ku av sor bûye ji xwêna Kurdan. Xwîn bi xwe sîmbola şer û kuştin û qurbaniyê ye lewra bikarînana van peyvan û peyvan ji layê Botanî

ve da bişêtin peyamek û gaziye bigehînite her kesekî ku bizanin jiyana gelê wî bi çi awayî derbaz dibîtin.

Rengê sor gelek sîmbolan bi xwe ve digirî li gorî baweriyên, lê bi giştî dema peyva "xwîn" bi kar dihê eksen rengê sor dîte bîra me. Lewra her dema rengê sor dibînin yekser bîra mirovî li xwînê dihêtin. Rengê sor bixwe ji rengên serekî û rengên germ e, yekem reng bo mirovan di jiyana da naskirî û ji xwîna giyandaran dirustkirî, ji ber hindê jî yek ji saluxetên evî rengê peywendîdar e bi bi xwînê ve. Rengê sor bandoreka bi tirs dikete ser derûnê mirovan, di pranya baweriyên ayinan da sîmbola tund û tîjiyê ye .

Botanî ji bo vegêrana vê bûyera trajediya bi serê kurdên êzidî hatî, ku rengê sor bi kar îneye û careke dî ber bi trajediyeka xemgîn diçît û avê bi xwînê sor diket. Lewra li destpêkê esmanî tawanbar diketin ku rengê xwe guhartiye û paşî avê bi xwînê sor diketin.

Di evê helbestê da Botanî rengê sor bi kar îneye wek sîmbol ji bo qurbanîdan û mirinê û tundûtîjê û ew zulma beramber gelê wî hatiye encamdan dema dibêjîtin:

Ho xudêoo ew ava sor

Xûna Kurdaye derbûye,

Xudê çima buhara wan

Bi ser payzêde werbûye? (Botanî, Jana Azadiyê, 2017: 203).

Dîsan Botanî helbesta "zendîqê bivr didestî da" dikete diyarî bo êş û janên *Şengalê*. Bûyerên trajediyên berdewam li ser gelê Kurd bandora xwe li ser berhemên afirandina helbestvanî kiriye.

Naveroka li ser bûyerên trajediyên *Şengalê* ye. Lewra di vehandina evê helbestê da Botanî rengê spî kiriye sîmbola ciwanî, kerametê û aşitiyê. Helbestvanî guherîna rengê sor bi rengê spî kiriye. Botanî sîmbola rengê spî kiriye nûyatî û destpêka her tiştê borî. Ku bûyer û rûdan çend nexweş bin spî kiriye sîmbola berperekî nû û şuştina hemî guneh û xirabiyên.

Di hundirê xwe da rengê spî helgira wateyên baş û xêr û bereketiyê ye. Rengekî xweş û qebîlkirî ye ji layê hemû kes û bawerî û ayinan. Ku ev rengê di piraniya bawerî û ayinan da sîmbola paqijî, bêgunehiyê ye. Dîsan jî di kulturê gelan da sîmbola şerev û kerametê ye.

Botanî bi rêya evê vehandine avê helbestê hewara xwe digehînite *Şerefdînî*. Da ku hindêk ji wan xem û janên di dilê xwe da sarêj biket. Çünke ev helbeste li ser wan ferman û bûyerên di sala 2014an de bi destî *ISIS* hatîne encamdan dijî xelkê *Şengalê* bi taybet ê gelê me yê êzidî. Ku her karekî hovane heye li beramberî wan encam da ji ferman, qirkirin, kuştin, kuştina bi kum, bê ser û şuyinkirin û revandin. Evê çendê jî bandoreka mezin kiriye li ser hemû cîhanê yê ne bi tenê gelê kurd.

Ev çende jî bîra me dînite karvedanên şerê cîhanê yê êkê û şerê navxweyî yê Îspanya çawa bandora xwe li ser Lorca û Picasso û piraniya helbestvan û hunermendan kiriye. Lewra Botanî di evê helbestê de giringiyeka mezin bi sîmbolîzma rengan daye. Sîmbola her rengêkî li cihê wî danaye û şeweyekî hunerî yê helbestê vehandiye. Ku rengê sor û spî di helbesta xwe da kirine sîmbol ku ji riwangê sîmbolîzma rengan di ayinan da rengê sor û spî sîmbolên hemecur bi xwe ve digirin herweku me li pêşê bas kirî. Li gor kes û baweriyên her dema rengê sor bi kar dihêt yekser "Xwîn" li bîra me dihêtin. Dîsan rengê spî sîmbola bêgunehî û pîroziyê ye.

Her ayinekî sîmbol û felsefeyên xwe yê taybet derheqê her rengêkî da hene, ji ber hindê jî rengan di ayinê êzidiyan û civaka çendîn biwarên dî de cihê xwe girtiye. Di baweriyên ayinê êzidiyan da rengê spî ji ewan rengan e ku cihekî taybet û giring girtiye. Ku êzidî rêzeka mezin didene evî rengî, welê hatiye ku êzidî bi rengê xwe bizanin. Di zorbeya têkst û sebeqeyên qewlên xwe da rengê spî bi kar îname. Bikarîna peyva spî di evê helbestê da yekser rengê spî bîra me li ava pîroz a zelal a Laleşê dînin. Ku kaniyeka paqij e û jîderê morkirin û helalkirina kesê êzidî ye. Ku ji ava tûfanê paqij maye. Dîsan jî ew kesên karê rêvebirina rê û resmên pîroz ên ayinê êzidiyan radibin rengê cilên wan spî ye. Herwesa xweya dibît ku sîmbola îmanê û paqijî û bêgunehiyê ye di ayinê êzidiyan da.

Dema bikarînana her du rengên sor û spî helbestvanî bi awayekî aşkera û rastexwe amaje bi raman sîmbola her du rengan kiriye ku spî kiriye sîmbola rûmet û kerametê û sor jî kiriye sîmbola xwînê û qurbanîdanê dema dibêjît:

Şêx mendooooooooooooo

Pîr reşoooooooooooooooo

Mala me'rîfetê xera bûu!,

"şerfedîne şerfedîne

Avanya hemûan îmane

Avaniya me yek evîne

'eynî hewar û brîne.

Şerfedînooooooooooooo

Ev hemî nihomate birex teve derbazbûn

Qey avaniya hemûan yek bu!,

Mirna sist li jêr û

Îmana qayîm li jor,

Rûmeta hemûka spî û

Xûna hemûka sor!" (Botanî, Zendîqê bivîr didestî da, 2017: 62).

Helbesta "Girîvana Sor" dema karesata xwişk û birayên êzidî ji layê helbestvanî ve hatiye nivîsan. Botanî viyaye bi rêya evê helbestê derbirîne ji vê karesata cerg hejîn biket. Bi dilekî melîl evê çendê vedigêrît. Ev helbeste bi regekî kûr û cuda hatiye nivîsandin. Da ku bişêtin wêneyekî rûn û aşkera berçav biketin. Hewareka mezin bêxête ber guhê hemî dunyayê, da bizanin ku çi tawan û zoriyek ji vê mezintir heye ku li ser mirovan hatiye encamdan.

Zorbeya helbestvanan mirov dustin çi digel gelê xwe yan digel hemî gelên cîhanê. Bûyer û rûdan bandorên mezin dikin li ser derûnê wan, çunke hestnazik in. Botanî hewil daye bi rêya evê helbestê derbirîne ji hestên xwe yên nexweş biketin û xemên xwe pê tena biketin ji layekî ve. Ji layekî dîtir ve pîçek ji birînen xwişk û birayên me yên êzidî pê derman biketin.

Ev helbesta Botanî bi navê "Girîvana sor" e. Ku girîvan cilên pîroz ên Êzidiyan e û rengê wana spî ye. Botanî bi xwînê sor kiriye. Di evê helbestê da rengê ne xwe cih e û li gor bûyer û têkstî guhartiye. Ji bo derbirînê ji hestên xwe yên helbestî ev renga bi kar îname da ku bişêr piçekî derbirînê ji wê nexweşiya di derûnê xwe da biketin.

Her weku me diyar kirî bûyerên helbest li ser hatiye nivîsîn bûyerên trajediyê ne li ser karesata Şingalê ya sala 2014an. Lewra helbestvanî rengê sor bi kar îname ku di civak û bawerên ayînî yên Êzidiyan de rengê sor bi şeweyekî rasterast yan ne rasterast ramana xwîna sor û qurbanîdanê didet. Rengê sor di evê helbestê da wî hestî li ba xwendevanî peyda diket yekser bîr li xwîn, şer û kuştin, qurbanîdanê biketin. Çünke rengê sor renekî bihêz e di karînanên xwe da. Li vir Botanî bi awayekî rasterast amaje bi evî rengî daye ku kiriye sîmbola xwînê. Lewra her dema ee peyva xwînê dibihêzîn yekser rengê sor di mêşkî me da peyda dibîtin.

Herwesa ji ber girêdana rengê sor bi xwînê ve peywendî bi du tiştên dijber ve heye ew jî jiyan û mirin e. Ji ber ku ji nemana xwînê di laşê mirovî da dibîte egerê mirinê, herwesa jî hebûna xwînê di laşê mirovî de û hatin û çûna wê di demarên laşî da dibîte egerê parastina jiyanê mirovî. Ji ber hindê jî di kevneşopî da li ba hindek miletan dema zarok ji dayik dibûn ser û çavên wan bi xwînê sor dikirin, da ku jiyê wana dirêj bîtin.

Sîmbol rûyekî geş e di evê helbestê da. Helbestvanî gul bêreng kirîne. Di resenatiya xwe da hemî gul xwedî rengên taybet ên xwe ne, belê nemana rengan di jiyanê da kiriye sîmbola nemanê. Çünke tişteki zor û bi zehmet e ku mirov bîr li cîhaneka bêreng biketin. Çünke eger di jiyanê da reng nema di wê demê de hebûna mirovî jî namînit. Lewra reng sîmbola berdewamiya jiyanê ye bi hemî şeweyên xwe ve. Lewra Botanî evan bûyeran bi evî wêneyê tirs û xemgîn nîşane me didetin. Ku li wêrê jiyan bi dawî hatiye û her tişt miriye. Dîsan sîmbola rengê reş li cihê wî danaye. Reş kiriye sîmbola tirs û nemanê çünke di pitirîya ayîn û civakan da renekî nerênî ye. Botanî reş kiriye sîmbola şerm û xiyaretê dema dibêjîtin "Tariya mirovan reştir e". Taybet di bawerên ayinan da rengê şevan tarî ye û her tişteki xirab tê da rû didetin. Rengê reş hemî ronahiyê dimêjît lewra rengê hêzê û

berzebûna ronahiyê ye. Rengê reş dijî rengê spî ye. Di piraniya baweriyên da rengê spî ronahî ye ku ronahî sîmbola nûra Yezdanî ye û rengê reş tarî ye û sîmbola Ehrîmenî ye.

Mirinê destê jînê girtbû

Di hatim di hatim şevtarî bû

Tariya mirovan reşitir û

Mirin di hat jîn nekarî bû,

Derav teng û

Gul bê reng e

Ewa di qewmî li ber çavê min

Nerastî bû ne yarî bû (Botanî, Grîvana sor, 2017: 226).

Li dûmahiyê em dişên bêjîn reng li gor baweriyên her ayînekî bi hemî şêweyan bûne sîmbolên başî û xirabiyê. Her renek li gor bîr û bawerî û taybetmendiya xwe bûne sîmbol ji bo hindek tişt û pîroziyan. Lewra jî her ayînekî boçûneke cuda heye di raman û sîmbolîzma rengan da û her yek li gor bawerî û kevneşupên dîrokî rengan şirove diket. Bo nimûne rengê sor di babeta "reng di baweriya ayînan da " sîmbola qurbanîdan û xwînê ye. Gelek caran jî sîmbola hêzê ye ji ber peywendiya sorî bi rengê rojê ve. Lewra jî gelek caran Botanî rengê sor di vê mijarê da kiriye sîmbola xwegorîkrin û şehîdbûnê. Lewra her dema em rengê sor dibînin yekser bîra mirovî li xwînê dihêtin.

ENCAM

Peywendiyeka bihêz di navbera reng û helbestê da heye. Helbestvan Emîn Botanî jî yek ji wan helbestvanên kurd ê xwedî dîwan e ku di vehandina helbesta xwe da gelek caran serî li rengan daye û hêza xwe ya erênî ji rengan wergirtiye. Me di vê vekolînê de (Sîmbolîzma Rengan di Helbestên Emîn Botanî da) di biwara reng di helbestên Emîn Botanî de çendîn encam bi dest êxistine. Ev encam li jêrê bi rêzê û bi şêwazeke kurt hatine destnîşankirin.

1. Ji demên berê da ta nûke reng xwedan giringiyeka mezin bûne. Bi dirêjahiya mêjûyê da mirovan giringî pê daye. Ji ber hindê jî raman û sîmbol ji layê kes, bawerî, ayîn û çandên gelan ve ji bo her renekî destnîşankirî ne; weku sîmbolên ji bo xweşî û nexweşîyan, jîyan û mirinê û gelek tiştên dî.

2. Rengvedana kevneşopiyên civakî, ayînî, ramyarî, aydiyolojî, derûnî, bîrhatin û xewnan di helbestên Botanî da zal bûye.

3. Helbestvan kesên hestnazik in û derûnê wan ji her kesekî zûtir bandor lê tê kirin. Lewra jî ji egerê wan bandorên li ser derûnê Botanî hatîne kirin helbestên wî encam dane. Egerên derûnî ji egerên serekî yê vehandina helbestan e çünke hest û derûn girêdayî yek in. Lewra Botanî ji bo tenakirina derûnê xwe pena biriye ber vehandina helbestê, bi rêya hindek rengan û wek sîmbol bi kar înayîne. Da ku derbirînê ji hest û derûnê wî biken. Diyar e helbestvan şarezayê derbirîna renga ye, lewma bi hesteka hunerî û edebî reng bi kar înaneye. Bo nimûne rengê reş di mijara rengan di saykolojiya mirovan da raman û sîmbolên nerênî bi xwe ve girtîne. Ev renga sîmbola mirinê ye, xemgînî û nexweşiyê ye. Dîsan jî girêdayî paşeroja berz e û tarî û ne arambûna derûnî ye ye. Lewra jî gelek caran Botanî ev renga kiriye sîmbola xemgînî û nexweşiyê. Eve jî ewê çendê diyar diketin ku derûna helbestvanî xembar e, xwestiye bi rêya rengan pîçek derbirînê ji hestên xwe yê xemkî biketin.

4. Bûyerên trajîdî yê berdewam bi serê gelê kurd hatîne bandora xwe li ser berhem û afrandinên helbestvanî kirine, herwekî li ser gişt civakê kirî. Di babeta "reng di çanda gelan da" helbestvan gelek ji kevneşûpiyên civaka tê da dijîtin dûr neketîye û gelek guhartin di sîmbolîzma rengan da nekiriye. Çünke piraniya sîmbol û ramanên rengan bi xwe di cêgîr in û rasterast ji civakê dihêne wergirtin. Bo nimûne rengê spî di civaka Kurdan de sîmbola bêgunehî, aşitî û paqijiyê ye. Lewra jî gelek caran Botanî jî rengê spî di vê mijarê da kiriye sîmbola bêgunehî, aşitî û paqijiyê. Lewra helbestvanî nexwestiye ji civaka xwe gelek dûr bikevît. Rengvedana civakî û kevneşûpiya helbestvan têda dijît di helbestan da diyar in.

5. Li gor baweriyên her ayînekî bi hemî şeweyan reng bûne sîmbolên başî û xirabiyê. Her renek li gor bîr û bawerî û taybetmendiya xwe bûne sîmbol ji bo hindek tişt û pîroziyan. Lewra jî her ayînekî boçûneke cuda heye di raman û sîmbolîzma rengan da û her yek li gor bawerî û kevneşûpên dirokî rengan şirove diket. Bo nimûne rengê sor di babeta "reng di baweriya ayinan da " sîmbola qurbanîdan û xwînê ye. Gelek caran jî sîmbola hêzê ye ji ber peywendiya sorî bi rengê rojê ve. Lewra jî gelek caran Botanî rengê sor di vê mijarê da kiriye sîmbola xwe gorîkrin û şehîdbûnê. Lewra her dema em rengê sor dibînin yekser bîra mirovî li xwînê dihêtin.

6. Hindek caran bê kontrola wî û bê diyarkirina mebesteke sîmbolîk rengan ji nîşkekê ve di nava helbestên wî da reng vedaye. Ev çend jî tiştêkî normal e. Çünke ne merc e her carekê helbestvanî reng bi kar înbât mebesta wî pê diyarkirina sîmbolîzma rengan bît. Dîwana Botanî ya ku ji 515 rûpelan pêk hatiye, reng bi şeweyekî berfireh tê da hatine berçavkirin.

7. Bikarînana rengên serekî di nava helbestên wî da ewê çendê dupat diketin ku helbestvan xwedî aydolojiyeka taybet e. Xwestiye bi rêka bercestebûna evan rengan ewê aydolojiya xwe ya ku cihekî taybet li ba wî heye pêşanî xwendevanî bidetin. Lewra jî helbestvan Botanî rengê xwelîkî (risasî) di vehandina helbestên xwe da bi kar neînaye. Ev çende jî nê bîlayeniya layengiriya aydolojiya helbestvanî diyar diket. Çünke rengê xwelîkî yek ji rengên bê layene di bazineya rengandan. Ji têkelkirina rengê reş û spî

Derdikevîtin. Ev renga bi praniya demî bûye sîmbola bê layenî û bê hestiyê, bédengî û ne xwediyar kirnê. Lewra jî ew kesên gelek rengê xwelîkî bi kardînin, ku hez diken d ûyîrî her tiştî bin û bêlayanbin û layengirên çî aydolojiyên taybet nebin.

8. Yek ji dewlemendiya azmûna helbestvanî di biyavê vehandina helbestê da, bi taybetî di biyavê bikarînana rengan da ew e ku hindek caran peyva *reng* bi kar îname bê diyarkirina rengêkî diyarkirî. Lewra jî dibît di ewan cihan da armanc pê aşkerakirina xewn û xeyalên helbestvanî bi xwe bît. Dîsan jî hindek caran hindek peyv û nav ji bilî sîmbolîzmê jî xweşiyê û bêhnciwaniya wêneyê helbestê didene me weku derya, asman, nêgiz, zêr û hwd.

9. Peyv li ba Botanî alavê vehandina helbestê ye. Lewra helbestvanî pena biriye ber rengan. Çûnke reng behayekê êstetîkî bihayê hunerî yê bilind didete têkstî. Lewra reng yek ji alavên giring yê afirandina têkstan e, bi taybetî jî afirandina helbestê.

10. Yek ji dewlemendiyên ferhenga helbestvanî, bikarînana reng û peyvên hevdiş e; weku şev û roj, reş û spî, sor û zer, yan jî şer û aşitî. Yan jî reng bo layenê ciwanî û ne ciwaniyê û başî û xirabiyê bi kar îname. Bo nimûne rengê spî paqijiyê û mirinê, herwesa bo spiyatiya dêmê keçê bi kar îname. Sor bo xwînê, tirsê, şeran bi kar îname, yan kiriye sîmbola ciwaniyê û pesna lêvên evîndara xwe bi rengê sor kiriye. Ev çende jî bo nalebariya derûnê helbestvanî vedigerît.

11. Rêjeya bikarînana rengan di helbestên dîwana Botanî da li gor amara hatiye encamdan bi vî şêweyê rêjeya sedî derketiye:

Reş	: 29.37%	Spî	: 11.87%
Sor	: 25.62%	Zer	: 5%
Şîn	: 17.5%	Kesk	: 4.37%
Peyva “reng”	: 28.75%		

Wate di nava hestbûna hozaniya helbestvanî da rengê reş yê zal e û zêdetir ji hemî rengên dîtir hatye bikarînan di helbestên wî da. Helbestvanî di zorbeya helbestên xwe da

rengê reş kiriye sîmbol ji bo derbirîna hestên xwe yên xemkî. Eve jî ewê diyar diketin ku xembarî di derûna helbestvanî de di asteka ne ya kêr da ye. Dîsan jî rêjeya rengê sor di helbestên botanî da zor e, rengî sor bandorên erênî û nerênî her dû hene. Lewra Botanî pitirya caran xwestiye rengê sor bikete simbola hêzê, hestê û evînê. Dîsan di pitirya helbestên xwe da Botanî sor kiriye sîmbola qurbanîdanê, xwînê, şer û xwînêrêtinê. Dîsan rengê kesk ji hemû rengên dîtir kêmtir bi kar îname. Dibît ji sedema ewan kawdanên nexweş û rûydanên trajîdî yên helbestvan û gelê wî têda derbaz bûyin, bi taybetî nearambûna derûnê helbestvanî bûyine egerê hindê ku rengê kesk kêr bi kar bînît. Çûnke ev rege sîmbol e ji bo xweşiya jîyanê, geşbîniyê, tenahiyê, pêşdaçûnê, aşî û aramiya derûnî.

12. Her regek xwedî raman, felsefe, sîmbolêt xweyên cur bi cur e. Karekê asan nîne ku mirov bişêtin ji bo her regekî raman yan sîmboleka drust û taybet destnîşan biketin. Çûnke ev raman û sîmbole cêgîr nînin ku li gor kes, çand, ayîn û.. hwd. Ev sîmbol û ramane dêne guherandin. Bi şewekê giştî sîmbolîzma rengan li ba helbestvan Botanî bi evî şeweyî ye : Rengê sor sîmbola hest û qorbanîdanê ye. Rengê şîn sîmbola hîvî û umêdan e. Rengê reş sîmbola nexweşî û xemgîniyê ye. Rengê spî sîmbola paqî û aşiyê ye. Rengê zer sîmbola lawaziyê ye. Rengê kesk sîmbola jîyanê û geşbûnê ye.

13. Pitirya helbestvanan kesên mirovdost in. Yek ji wan jî helbestvan Emîn Botanî ye. Lewra em dibînin ku piraniya peyamên helbestên wî peyamên aşitîxwazane ne bo hemî gelan. Ev çende jî bi rêka sîmbolîzma rengan hatiye derbirîn bi rêka rengên "reş, sor, şîn, spî, zer, kesk". Ev rege di helbestên xwe da bi kar îname ku derbirîna ji hestê humanîzmê dîke.

14. Di paşeroja ekadîmîya Kurdî de pêwist e gelek vekolîn û xebatên dîtir yên zanistî û ekadîmî li ser helbestên Botanî bîn encamdan. Dîsa pêwist e diyardeya reng bibîte mijareke sereke ya vekolînê li ser helbesta Kurdî bi giştî.

ÇAVKANÎ

Bi Zimanê Kurdî

Balayî, Fehmî. (2008). *Cîhana rengan*. Dihok: Çapxana Xanî.

Berwarî, Hîvî. (2010). *Rêbazên edebî*. Dihok: Çapxana Hawar.

Botanî, Emîn. (2017). *Emîn Botanî Helbest*. Çapa yekem. Hewlêr: Weşanxana Hacî Haşim.

Cîhanî, Perwîz. (2007). *Mem û Zîn*. Pişka êkê. Çapa êkê. Hewlêr: Çapxana Hecî Haşim.

Doskî, Tehsîn, Îbrahîm. (2004). *Tefsîra Qurana Pîroz*. Çapa êkê. Dihok: Çapxana Hewar.

Elî, Umer, Emîn. (2011). *Tefsîrî Diyar*. Bergê dûwem.

Enwer, Keywan. (2004). *Manîzim*. Slêmanî.

Eswed, Newzad, Ehmed. (2015). *Ferhengê Zarawekanî Edeb û Zanîste Mirovayetîyekan*. Çapî yekem. Hewlêr: Çapxaney Aram.

Huseinî, Seyîd. (2006). *Zarawe Edebyekan*. (Heme Kerîm. Wer). Çapxaneyî Wezaretî Perwerdî. Hewlêr.

Husên, Hîmdad. (2009). *Kultur û Ferhengê Kurdî*. Dihok: Çapxaney Xanî.

Nihêlî, Ni'mit, Elî. (2005). *Pêlên Rexneyî*. Dihok: Çapxaney Spîrêz.

Osman, Mohsin. (2010). *Hizirkirin di Pirsên Rexneyî da*. Hewlêr: Çapxaney Rewşinbîrî

Pirîsî, Elî Hacî Ebdulla. (2012). *Tefsîrî Îbin El Kesîr Be Kurdî*. B3. Tehran: Bilok kirdin, Slêmanî.

Qeçax, Qadir. (2016). *Zanyaryên Geş bo Dîruka Reş*. Dihok: Çapxana hewar.

Rondik, Muhsin. (2017). *Delaletên Rengan di Huzanên Nû Nûyxazên Kurdîda, Devera Behdînan*. Nama Masterê. Zankoya Zaxo.

Şerî'etî, Elî. (2010). *Hunre û Ayin*. (Hejar Rehmî .Wer) Dihok: Çapxaney Xanî.

Şêrzad, S. E. (2011). *Wata di navbera Sîmatîk u Piragmaticê da*. Dihok: Çapxaney Xanî.

Xanikî, Kovan. (2011). *Felsefe û Delaletên Rengan û Praktîzekrin li ser Civak û Teksitên Êzdiyan*. Dihok: Çapxana Hewar.

Xuşnaw, Nerîman. (2010) *Remiz û Mexza le Çîrokekanî Ferhad Pîrbal da*. Hewlêr: Çapxaney Çabxane.

Bi Zimanê Erebi

Cibrîl, Tewfîq. (2013). *Eser el-Lewn fî el-Feraxat ed-Daxiliyye 'ela en-Neş'et et-Tesewuqî li 'l-Merakiz et-Rîcariye*. Rîsale Macistir. Felestîn: el-Cami'e el-Îslamiyye.

Ebdilxefûr, 'Efaf. (2008). *Mîn Sîmat Cemal el-Quran el-Kerîm, el-Elwan we Delaletuha Nemuzucen*. el-Micele el-Ordniye fî ed-Dîrasat el-Îslamiye. Meclis el-Xamis. el-'Edede 4.

Ebdulfettah. Riaz. (1983). *et-Tekwîn fî el-Finûn et-Teşkîliyye*. T2. Qahîre. Misir: Dar en-Nehze.

Ebu 'Ewn, Emel. (2003). *el-Lewn we Eb'aduha fî eş-Şî'r el-Cahilî, Şu'era el-Mu'elleqe Nemuzecen*. Rîsale Macistîr. Nablîs. Fileistîn: Cami'ye Necah el- Weteniyê.

Ebu Yehya, Ehmed. (1997). *el-Heiyye fî et-Turas el-Erebî*. Libnan. Bêrût: Mektebe el-'Esriye.

'**Ecîne**, Muhemed. (1984). *Mewsu'e Esatîr el-Ereb*. T1. Libnan Bêrût.

El-Dorî, 'eyaz Ebdurehman. (2002). *Delale el-Lewn fî el-Fen el-Erebî el-Îslamî*. Dar el-Şûn es-Seqafiye. T1. Bexdad.

El-Heristani, Rebîh. (1998). *el-Îzzhar el-Mî'emarî we'l -Lewin*. Libnan: dar Qabis Lil-neşir.

Elî, Îbrahîm Muhemed. (2001). *El- lewn fî Ş'er el-Erebî qebil el-Îslam*. Libnan. Trablûs.

El-Mitîrî, Ebdulezîz. (2014). *el-Delalet en-efsiye fî Şî'ri el-Tebî'e fî 'Esir el-Endelusî*. Rîsale Macisitir. Camiy'e el-Şerq el-Ewset. Kuliye el-Adab wal 'Olum. Qism el-Luxe el-'Erebiye we Adabiha.

El-Qer'an, Faiyz. (1984). *el-Weşim we'l-Weşî fî Ş'er el-Cahilî*. Sûriye: Camiye Yermûk.

El-Sameraî, Elî, Îsmâîl. (2008). *el-Lewn we Delaletuha el-Muzu'eiye we'l-Feniye fî el-Şî'er el-Endelusî*. T1, Ordin: Dar Xeida.

El-Sefar, Îbtîsam. (2010). *Cemaliye et-eşkil el-Lewnî fî el-Quran*. Urdun. Oman: Alem el-Kutb el-Hedîse.

El-Sewah, Fîras. (1993). *Luxiz Eştar. el-Uluhiye el-Muenese we'l-Esil el-Dîn we'l-Îsture. Dîmeşiq*: Dar el-'Ela.

El-Yaqût, Şîxawî. (2018). *Me'anî el-Lewin fî el-Luxe we'l-seqafe we'l- Fen*. Cezayir. Koliye el-Adab. Qism el-Finun.

El-Zewahîre, Zahîr Heza'. (2008). *el-Lewin we Delaletuha fî el-Şe'ir*. T1. Oman: Dar el-Hamid.

'**Esaf**, Sasin. (1982). *el-Sore el-Şe'iriye*. Beiyrot. Libnan: el-Mewsû'e el-Cami'iye li ed-Dîrasat we en-Neşr we et-Tewzî'.

- Hemdan**, Ehmed. (2008). *Delalat el-lewin fî Şî'iyîr Nîzar Qebanî*. Rîsale Macisitir. Nablîs. Felestîn: Camî'iye el-Necah el-Wetenye.
- Îswî**, fayze. (2016). *el-Elwan fî Şe'ir el- Cezayirî el-Mu'asir, Nemazic Mixtare*. Rîsale Macisitir. Cezayir: Camiy'e Muhemed Xeyzer.
- Mirziye**, Abad/ Resul, Bîlawî. (2012). *Delale el-Lewin fî el-Şî'r Yehiya el-Semawî*. Micle el-Îzaye el-Neqdiye. el-Eded 8. Kanun1. Îraq. Bexdad.
- Mitwec**, Semran. (2004). *Delalat el-Lewn fî er-Rimuz fî eş-Şî'r el-Cahlî*. Rîsale Doktora: Camiy'e Tişrîn.
- Muxtar**, Ehmed. (1997). *el-Delalat en-Neşsiyye we'l-Îctîma'iye*. T2. Qahîre: Alem el-Kutib.
- Muxtar**, Umer Ehmed. (1982). *el-Luxe we'l-Lewin*. T1. Qahîre: Alem el-Kutib we'l-Neşir we'l-Tewzî'.
- Narmîn**, Muhib Ebdull Hemîd. (2006). *Tewzîf el-Lewn fî Ş'er Îbin el-Rumî*. Qahîre. Doktora: Camiy'e el-Zeqazîq.
- Şakir**, Ebdull Hemîd. (2010). *el-Finun el-Beseriyye we'l-Ebqeriye el-Îdrak*. T1. Qahîre: Alem el-Kutib
- Şe'ban**, Renîm. (2017). *Delale el-Elwan fî Rîwaye en-Niswe el-Flistîniye*. Rîsale Macisitir. Xeze: Cam'iye el-Ezher.
- Şehade**, Nusret. (2013). *el-Lewin we Delaletuha fî Şî'ri el-Buhturî*. Rîsale Macisitir: Cam'iye el-Xelîl.
- Şûkrî**, Ebdull Wehab. (1985). *el-Îzaye we'l-Mesrehiye*. Qahîre: el-Heiye el-Misriye Lîl kîtab.
- Tîbu**, Rubîr Jak. (2004). *Mewsu'e el-Esatîr we'r-Rimuz el-Faraoniye*. (Fatîme Ebdulla, Tercume). T1. Qahîre.

Ubeiyd, Kilud. (2013). *el-Elwan we Dewruha, Tesnîfuha, Remzîyetuha we Delaletuha*. T1. Bêrût: Muesese el-Cam'iye, Lîl-dîrasat we el-Neşir we'l-Tewzzî'.

Weiyî, Salih. (2004). *es-Sûre el-Lewniye fî Şî'r el-Endelusî*. T1. Oman: Dar Micdlawî.

Xemqanî, Faiyze. (2015). *Delale el-Lewin el-Esfer fî el-Qoran el-Kerîm: Micele el-Esir*. el- 'eded 23.

Bi Zimanê Înglîzî

JOHN F. PILE. (1997). *Color in Interior Design*. United States of America: McGraw-Hill.

Riley, Charles. A. (1995). *Color Codes: Modern Theories of Color in Philosophy, Painting and Architecture, Literature, Music, and Psychology*. Hanover: University Press of New England.

Bi Zimanê Farsî

Beyheqî, Ebu el-Vezil. (1368). *Tarîx Beyheqî*. Be kûşîş Xelîl Xetîb. T1. Tehran.

Bi Zimanê Frensî

M. Derbere. (1954). *La Couler Dans Les Actives Humaines*. Imp Paris Franch.

Ichel. Rondon (1984). *Les Couleurs Visibles Et Et Invisibles* .

Çavpêketin

Botanî, Emîn. (15. 03. 2020). *Çavpêketin*. Qeza Xebat. Hewlêr.

Enternêt

Adam, Alter. (2019. 10. 9). *Can the Color Red Make you Look Sexy*. Bakadesuyo.

<https://www.bakadesuyo.com/2013/05/adam-alter-interview-red-sexy/>

Bedir, Aye. (2020, 06. 04.). *Ma la Te'rfuhu 'En Wele' el- etrak bil Lewn el-Feyruzî "elTirkwaz"!*. mar7aba. <https://mar7aba.com.tr/-ما-لا-تعرفه-عن-ولع-الأتراك-باللون-الفير/>

Ebdull Hemîd, Randa. (2019, 07. 29.). *Î'ref Ş exisyetuke mîn Lewnik el-Mufuzel fî ' Îlim el-Nefî*. Thaqfya. <https://www.thaqfya.com/know-character-favorite-color-psychology/>

Ebu Eyaş, Ebîr. (2019. 0 8. 10). *Tesîr el elwan 'ele el-însan*. Mawdoo3. <https://mawdoo3.com/تأثير الألوان على الإنسان/>

El- Se'u, **Sabrîn** (2019. 09. 11). *Maza ye'nî el-Lewn el-Esfer*. Mawdoo3. <https://mawdoo3.com/إلى ماذا يرمز اللون الأصفر/>

El-Burînî, 'Atîke. (2019. 10. 20). *Delalat el-lewn el-Ezreq*. Mawdoo3. <https://mawdoo3.com/دلالات اللون الأزرق/>

El-Ebadî, Raz. (2019. 07. 9). *Xesaîs el-Lewn*. uobabylon.

<http://www.uobabylon.edu.iq/uobColeges/lecture.aspx?fid=13&depid=2&lcid=39735>

El-Helayqe, Xade (2019. 10. 12) . *Şexêye Muhîbî el-Lewn el-Eswed*. Mawdoo3.

<https://mawdoo3.com/شخصية محبي اللون الأسود/>

El-Sedîq, Qeys. (2019, 07. 22.). *Delalat el-Lewn we remizyetuha fî el-Seqafat el-Alem el- Muxtelîfe*. Ziid. <https://ziid.net/art-intertainment/color-and-symbolization-of-colors-in-different-cultures-of-the-world/>

- Es-Sa'dî**, Adîl. (2019. 07. 09). *el- Lewin we Sîfatuha we Xesaîsuha*. finearts.
<http://finearts.uobabylon.edu.iq/lecture.aspx?fid=13&lcid=45702>
- Fethî**, Îslam. (2019. 07. 03). *Maza Ye'nî el-Lewn el-Ehmer* .Mawdoo3.
https://mawdoo3.com/ماذا_يعني_اللون_الأحمر/
- Hewas**, Zahî. (2019. 11. 10). *el-Elwan 'inde el-Fera'îne*. El-Şerîq el-Ewset.
<https://aawsat.com/home/article/786191/زاهي-حواس/الألوان-عند-الفراعنة/>
- Hisour**. (2019. 09. 9). *el-Lewn el-Ehmer fî el-Seqafat*. Hisour.
<https://www.hisour.com/ar/red-color-in-culture-26654/>
- Îsmâil**, Duha. (2019. 08. 04). *'Ela Ma Za Yedullu el-Lewn el-Ezreq*. Mawdoo3.
https://mawdoo3.com/على_ماذا_يدل_اللون_الأزرق/
- Johin**, M. (2019. 07. 20). *Can Blue-Colored Light Prevent Suicide*.Psychcentral.
<https://psychcentral.com/blog/can-blue-colored-light-prevent-suicide/>
- Kendra**, Cherry. (2019. 06. 29). *Color Psychology of Red*. Very wellmind.
<https://www.verywellmind.com/the-color-psychology-of-red-2795821>
- Meabîre**, Tesnîm. (2019, 07. 01.). *Delalat el-Lewn el-Ebyed*. Mawdoo.
https://mawdoo3.com/دلالات_اللون_الأبيض/
- Muhemed**, menal. (2019, 09. 22.). *el-Elwan el- Muhayede*. Wikiyat.
<https://wikiyat.com/wiki/5712>
- Nîknam**, Kurş. (2020, 04. 05.). *Reng Der Tarîx Îran*. nasleahourai6.
<http://nasleahourai6.blogfa.com/post/8>
- Şebeke es-Sîn**. (2019, 08. 25). *Ebna Qewmiyye Mengoliya Yuqeddîsûne el-Lewn el-Ebyed*. ArabicChina. http://arabic.china.org.cn/culture/txt/2005-12/06/content_2209534.htm

Telal, Wîsam. (2019, 07. 02.). *Maza Ye'nî el-Lewn el-Eswed*. Mawdoo3.

https://mawdoo3.com/ماذا_يعني_اللون_الأسود



PÊVEK

Amara rêja sedê ya bikarînana rengan di nava helbestên dîwana helbestvan Emîn Botanî de

J	Reng	Rêja sedê
1	Reş	29.37%
3	Peyva reng	28.75%
4	Sor	25.62%
5	Şîn	17.5%
6	Spî	11.87%
7	Zer	5%
8	Kesk	4.37%



Helbestvan Emîn Botanî



Bergê Dîwana Emîn Botanî



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

EMÎN BOTANÎ’NİN ŞİİRLERİNDE RENKLERİN SEMBOLİZMİ

BIRYAR KAMAL OMAR

16711036

Danışman

Prof. Dr. ABDURRAHMAN ADAK

Mardin 2020